


# NÛDEM

No 37 2001



Kovara Hunerî, Edebî û Çandî

# JI WEŞANÊN NÛDEMÊ DU KITÊBÊN NÛ!

NÛDEM guh dide zarokên kurdan, hûn jî li xwe û zarokên xwe xwedî derkevin, weşanên NÛDEMê bixwînin!



**Astrid Lindgren**  
**RONYA**  
Ji swêdî: **N. Zaxurani**

**Astrid Lindgren**  
**BIRAYÊN DILŞÊR**  
Ji swêdî: **N. Zaxurani**



# NÜDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî

Xwedî û berpirsiyarê giştî  
Chief Editor

## Firat Cewerî

Hejmar: 37 sal 10  
Bihar: 2001

Şerdên abonetiye (salek)  
Swêd: 240 Sek  
Skandinaviya: 280 Sek  
Ewrûpa: 100 DM  
Amerîka, Australîa,  
Kanada: 50 \$  
Institution: 290 Sek

Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964

Wêneya bergê:  
David Salle, Ruhê demê No 4,  
1982, 396,2 x 297,2 cm., Londra.

Çap:  
Nina Tryckeri

Pergala bergê û rûpelan:  
Nûdem

Adres:  
NÜDEM, Box: 177  
177 23 Järfälla-Sweden

E-mail: nudem@telia.com

Tel û Fax: 8-580 131 62  
8-583 564 68

Malpera Nûdemê:  
www.welcome.to/nudem

# NAVEROK

- 4 Kurdên Swêdê ♦ **FRAT CEWERÎ**
- 6 Mévanên Cafê Nûdemê, li ser kurdên Swêdê ♦  
**UMER ŞEXMÛS, OSMAN AYTAAR, HEYDER DILJEN**
- 24 Tirek buhirî, çû ♦ **ROJEN BARNAS**
- 25 Bavo, ka ji min re bixwîne ♦ **SILÊMAN DEMIR**
- 31 Şîrek ji ♦ **SABAH KARA**
- 33 Pêwistiya ramanên rexnegir ♦ **ŞEREFXAN CIZIRÎ**
- 43 Tu neyê ji ez li wir im ♦ **ÇIYA MAZÎ**
- 45 Berfa hevrişim ♦ **EVDILE KOÇER**
- 51 Mepirse ♦ **ŞAHÎNÊ BEKIRÊ SOREKLÎ**
- 52 Du şîr û pexşanek ji ♦ **ARJEN ARÎ**
- 56 Armand Gatti ♦ **FAWAZ HUSÊN**
- 58 Percin ♦ **ARMAND GATTI**
- 74 Helepçe ♦ **BERKEN BEREH**
- 76 Tûtek ♦ **ROŞAN LEZGÎN**
- 78 Li rojavayê Kurdistanê... ♦ **KEÇA KURD**
- 82 Çend perçe ji romana Wêran ♦ **LALEŞ QASO**
- 91 Weberhênana Kulan ♦ **KAWA NEMIR**
- 92 Mirina di ber nêçra evîna serberdayî de ♦ **SERKAN BIRÛSK**
- 98 Mexdûrên sala par ♦ **FERÎD HAN**
- 100 Qedirşinasî... ♦ **ŞAKIR EPÖZDEMİR**
- 108 Dara di avê de- ♦ **İBRAHÎM SEYDO AYDOGAN**
- 115 Dr. Yusuf Azizoglu ♦ **SALIHÊ KEVIRBIRÎ**
- 118 Ber bi ronahiyê ve ♦ **RONÎ WAR**
- 120 Melayê Cizirî ♦ **M. EHMEDÊ ZIVINGÎ** Wergêr: E. NAROZÎ
- 123 Helbesteke Melayê Cizirî ♦ **ZEYNELABIDÎN ZINAR**
- 127 Hêviyeke ji mirinê vegeryayî ♦ **RUKIYE ÖZMEN**
- 130 Hîwa Qadîr xaça xwe digêrîne ♦ **XELÎL DUMOKÎ**
- 135 Rewşa Hewayê ♦ **SELAHATTÎN BULUT**
- 139 Danasîna kitêban ♦ **NÜDEM**

# KURDÊN SWÊDÊ



**FIRAT CEWERÎ**

Swêd welatê Ewropayê ye herî rehet e, lê welatê herî kêr sebra mirov lê tê Swêdê ye.

*Kathleen Nott*

**L**i gora texmînan hejmara kurdên li Swêdê gihîştiye çil hezarî. Çil hezar dikare hejmareke mezin bixuye, lê gava mirov hejmara kurdên Swêdê dide ber hejmara kurdên Almanya, Fransa an jî hin welatên Ewropa yên din, mirov dibîne ku ev hejmar hejmareke pir biçûk e. Biçûk e lê di warê entelektuelî de roleke mezin lîstîye û di ser û mêjiyê xwe de, ji xwe re Kurdîstaneke xeyalî çêkiriye. Ji bilî hin der

û doran, zimanê vê Kurdîstana xeyalî kurdî ye û hevweletiyên vê Kurdîstanê bi hev re bi kurdî didin û distînin, şîn û şahiyên xwe bi kurdî digerînin, navên kurdî li zarokên xwe dikin û enerjîyeke mezin didin çapemeniya bi zimanê kurdî. Gava ez bi xwe carinan ji vê Kurdîstana xeyalî bi dûr dikevim û riya min bi Kurdîstana eslî dikeve, ez dibînim ku zimanê fermî yê Kurdîstanê tirkî ye, hevweletî bi hev re bi tirkî dipeyivin û ji bilî çend evîndarên ziman û edebiyara kurdî, kes pênc peran di ziman û edebiyata kurdî de nadin. Û bi rastî, ez herim kîjan devera dinyayê jî, gava ez berê xwe bi Swêdê vedikim, bêhna kurdîtiyê û zimanê kurdî tê min û ew bêhn dike ku ez çend kevîrên din jî deynim ser vî asafî.

Gava mirov çavê li dîroka nêzik digerîne, mirov dibîne ku koça kurdan ya ber bi Swêdê ve di sê demên cihê de qewimîye; yek jê kurdên karker in, bi

piranî jî kurdên Konyayê ne ku di salên şêstî de hatine. Kurdên Konyayê ji bo kar hatibûn û armanca wan ew bû ku ew rewşa xwe ya aborî baş bikin û paşê vegerin cih û warên xwe. Lê ew venegeriyan. Dû re di dema cûnta salên heftêyî de kurdên siyasî hatin Swêdê, hejmara wan kurdan hindik bû, mayîna wan ya li Swêdê jî kurt ajot, hin ji wan vegeriyan, hin man. Dewra dawî jî dewra cûnta eskerî ya 12ê îlona 1980 ye. Ji ber ku di navbera salên 1970 û 1980yî de li welêt tevgerêke xortan ya xurt hebû, piştî cuntayê hejmara kurdên ku hatin Swêdê jî hejmareke tov bû. Ew kurd bi niyeta salekê an du salan derketibûn û ew salek û du sal li wan bûn bîst sal. Ew jî venegeriyan, li vir man. Bi tesîra wan kurdên Konyayê jî bi kurdîtiya xwe hesiyan û bi awayekî aktîv beşdarî xebatên kurdîtiyê bûn. Ev pêla xurt, ya ku li Tirkîyê bi armanca lidarxistina şoreşekê derketibûn, piştî ku pengizîn biyanîstanê, vala nesekinîn, gewdê wan li Swêdê, serê wan li welêt bûn. Van mirovan, li her bajarên ku lê bi cih bûn komele ava kirin, ji encama komeleyan federasyon ava kirin, konsey ava kirin, enstîtu ava kirin, komeleyên jin û ciwanan ava kirin, komeleyên nivîskar û hunermendan ava kirin û bi xurrahî beşdarî aktîvîteyên siyasî û entelektuelî bûn. Berhema van çalakiyên entelektuelî jî bû bingehe avakirina weşanxane û derxistina kovar û rojnameyan. Îro, herçiqasî hejmara kovar û rojnameyan û hejmara weşana kitêbên bi kurdî kêm bûbin jî, dîsa ji bilî başûrê Kurdistanê, hejmara weşanên kurdî ku ji aliyê kurdên Swêdê ve derdikevin, ji ya kurdên hersê perçeyan û kurdên seranserê dinyayê bêtir in.

Loma, gava ez ji Swêdê derdikevim û dîsa lê vedigerim, mîna ku ez berê xwe bidim Kurdistanê. Di dilê min de çirûskek kurdîtiyê, di dilê min de hêviyeke çilmisî geş dibe. Lê divê em vê rastiye jî ji bîr nekin, heger jiyana sirgûnê dirêjtir bajo û em encamekê ji welêt bi dest nexin, tîrsa min ew e ku hêviyên me yên çilmisî bêtir biçilmisin û ronahiyên me yek bi yek vemirin.

Her çawa be, ji bo ku em bi kurtî be jî resimekî kurdên Swêdê raxin ber çavan me bang sê mêvanan; Umer Şexmûs, Osman Aytar û Heyder Diljen kir û bi wan re li ser kurdên Sêwêdê kurtesohbetek li dar xist. Di vê derbarê de bi kêmanî sed kurd hene ku dikarin li ser kurdên Swêdê û rol û rewşa kurdên Swêdê nerînên xwe yên hêja bînin zimên. Lê bêguman, ji aliyê teknîkî ve sohbeta bi sed kesî re ne mimkin e û ne pêwîst e jî. Loma, ez hêvîdar im ku hûn ê vê helwestê maqûl bibînin û heger hûn bixwazin vî resimî realistîr bikin, hûn dikarin bi nivîsên xwe beşdarî hejmarên pêş bibin.

Ez bi vê hincetê Newroza we ji dil pîroz dikim... ✍

# CAFÉ NÛDEM

**FIRAT CEWERÎ:** Hûn bi xêr hatine. Mîna hûn dizanin, em di her hejmarê de li Cafê Nûdemê sohberêkê li dar dixin. Sohbetên me li ser mijar û babetên cihê ne. Ji edebiyar û hunerê bigire, heta problemên civakî, siyasî û entelektuelî ne. Mijara me ya îro jî li ser kurdên Swêdê ye. Digel ku hejmara kurdên Swêdê ji ya kurdên welatên Ewrûpa yê din kêmtir e jî, dîsa erênî an jî neyênî li ser kurdên Swêdê tê peyivandin, kurdên Swêdê hertim di rojê kurdan de ne. Bi taybetî jî piştî ku kurd bûne xwediye çapemeniyê, mirov bêtir li vê yekê rast tê. Gelo sebaba ku kurdên Swêdê evqasî di rojê kurdan de ne, çi ye? Ya ku kurdên Swêdê ji kurdên din ve diqetîne çi ye?

**UMER ŞÊXMÛS:** Li gora dîtina min çend faktorên serekî û bingehîn hene ku di vê yekê de rolê dilîzin. Yek jê ji salên sihî û heta niha partiya Sosyaldemokrat li Swêdê hakim bûye. Dudo, di dema ku kurd hatine Swêdê de sosyaldemokratên Swêdê politikayek ji sosyaldemokratên din çepîr dimeşand û di vê politikayê de jî pişgîrî û dostaniya gelên bindest hebû. Hem pozisyona sosyaldemokrasiya Swêdê ji ya partiyên sosyaldemokrat yê Ewrûpa cihê bû, hem jî raya giştî ya Swêdê bêtir humanîter bû. Ji ber vê yekê gelek kurd hatin Swêdê û ev kurdên ku hatin Swêdê jî bi piranî çepên kurd bûn. Loma mobilîzekerina wan hêsantir bû.

Ji bilî kurdên Konyayê ku di salên şêstî de mîna karker hatibûn Swêdê, kurdên ku di salên heftê, heştê û nofê de hatin kurdên xwende bûn, kurdên siyasî û entelektuel bûn.

Piştî sala 1975an, sed kes ji Iraqê wek multecî hatin Swêdê û hemû jî insanên siyasî bûn. Piştî cûnta 72an ya Tirkîyê, hejmarek xwendevanên bakurê Kurdistanê hatin, hemû jî xwende û di nav rêxistinên siyasî de bûn. Ji xwe piştî salên 1980 hejmara kurdan li Swêdê gelekî zêde bû. Ji bilî alîkariya dewletê ya bi van kurdan re,



Heyder Diljen, Umer Şêxmûs, Osman Aytar û Firat Cewerî

lê ew bi xwe jî insanin xwende bûn, siyasî û entelektuel bûn. Loma gava mirov îro kurdên Swêdê dide ber kurdên welatên din mirov dibîne ku hejmara entelektuelan, ya xwende û şair û nivîskaran li Swêdê bêtir in. Yek jê demokrasiya Swêdê, alîkariya dewletê û hebûna ewqas entelektuel û nivîskaran dike ku dengê Swêdê ji dengê kurdên welatên din bêtir derkeve û kurdên Swêdê bêtir di rojêva kurdan de bimîne.

Lê divê mirov bi rastî ked û xebata xelkê wînda neke. Li vir gelek şair, nivîskar û siyasetvanan dev ji mal û zarokên xwe berdane, bi pariyê devê zarokên xwe xebata xwe ya siyasî, edebî û entelektuelî didomînin. Bi nerîna min ev jî yek ji sebeban e ku dengê kurdên Swêdê zêdetir derkeve.

**HEYDER DILJEN:** Tiştê ku kek Umer anîn zimên rast in. Yek jê kurdên ku di salên heftê û heştê de hatin vir, kurdên xwende û siyasî bûn, ya din jî politikaya dewleta Swêdê û raya giştî ya Swêdê li hemberî kurdan dostane bû. Gava ev herdu faktor digihîjin hev, taybetmendiya kurdên Swêdê derdikeve holê. Gelê swêdî bi

xwe di derbarê kurdan de bi gelek tiştan dizane. Swêdî dizanin ku welatê kurdan perçe bûye, kurd bindest in, kurd nikarin bi zimanê xwe bixwînin, zimanê wan li welatê wan qedexe ye, ew ji bo bidestxistina mafê xwe li ber xwe didin û hwd. Ji aliyê din ve kurdên Swêdê jî li Swêdê bêtir bi zimanê xwe ve hatin girêdan, di her warê jiyane de zimanê xwe bi kar anîn û ev ji bo wan bû taybetmendiyek. Gava mirov di vî warî de kurdên Swêdê dide ber kurdên welatên din, mirov ferqeke mezin dibîne. Bi qasî ku kurdên Swêdê zimanê kurdî bi kar tînin, kurdên tu welatên din bi kar naynin.

**OSMAN AY TAR:** Tiştê ku ez bibêjim wê kêm zêde di vê çarçoveyê de be. Divê em vê bibînin, kurdên Swêdê, an jî xebata kurdên Swêdê berdewama xebata welêt e. Berî ku ev kurd werin Swêdê, ew li welatê xwe ji bo demokrasîyê, ji bo wekhevîyê di rêxistin û komeleyan de xebitîne, di nav mamoste û esnafan de kar kirine û gava ku hatine Swêdê jî li ser bingehê xebata li welêt xebata xwe li Swêdê jî dewam kirine. Kurdên ku dû re hatine wan jî wek yê berî xwe xebat domandine. Vê mîrasê dewam kiriye, ji bo kurdên Swêdê bûye mîna tradîsyonekê. We behsa kurdên xwende kir, gelek kurdên xwende çûne welatên din jî, lê dengê wan bi qasî dengê kurdên Swêdê dernakevin, an jî mirov dibîne ku ew ne mîna kurdên Swêdê aktîv in. Kurdên Swêdê hê di salên jêstî de bi swêdiyan re komîteyêke kurd û swêdiyan ava kirine û wê komîteyê ji bo kurdan û danasîna wan xebatên baş kirine. Kurdên ku dû re hatine ew jî vala nesekinîne, wan jî daye ser şopa kurdên berî xwe û xebata xwe ya siyasî û entelektuelî dewam kirine. Loma, gava mirov îro kurdên Swêdê dide ber kurdên welatên din, mirov dibîne ku hejmara entelektuelan zêdetir e, hejmara kovar û rojnameyan zêdetir in, hejmara weşanên ku derdikevin zêdetir in. Bêguman ev jî ferqiyeta kurdên Swêdê nîşan dide.

**FIRAT CEWERÎ:** Herçiqasî îro bi biçûkbûna dinyayê re Swêd ji aliyê piraniya kurdan ve tê naskirin jî, lê berî bi bîst-sih salî kesî ewqasî Swêd nas nedikir, Swêd welatekî sar, dûr û li serê dinyayê yê din bû. Ez bi xwe jî ev bîst sal in ku ez li Swêdê dijîm. Min bi tesadûfî navê Swêdê bihîst û ez hatim Swêdê, lê gelo evqas siyasethêvan, entelektuel û nivîskarên kurd çima neçûn welatên din, çima neçûn Fransayê, çima neçûn Almaniyayê, çima neçûn welatên din? An jî çûn wan welatan lê li wir pasîv man, yê ku hatin Swêdê bêtir aktîv bûn? Sebeb çi ye?

**UMER ŞEXMÛS:** Kurdên xwende, siyasî û entelektuel çûne welatên din jî, ne ku



bi tenê hatine Swêdê. Hejmara wan jî zêde ye. Lê polîtîkaya Swêdê ya li hemberî biyaniyan jî ya welatên din liberaltir bû. Multecî li Swêdê hebekî rehetir bûn. Ya din, wek min berê jî got polîtîkaya sosyaldemokratan ya li hemberî kurdan pozîtîv bû, di dema Palmê de siyasetvanên swêdiyan yê bilind sempatiya xwe nîşanî kurdan dan û piştgiriya têkoşîna wan kirin. Yanî jî salên şestî ve, bi avakirina komîteya kurd û swêdiyan ve li Swêdê bingehêk hatiye avakirin û heta niha jî xebatêk zêde li ser wî bingehê dom dike. Wê demê sempatiya swêdiyan ne bi tenê ji kurdan re hebû, sempatiya wan jî gelên din jî, mîna şiliyî, filîstînî, yunanî, tirk, efrîkî û hwd. re hebû. Kurd jî yek ji van mileran bû, xwe spartibûn Swêdê û bi rastî jî Swêdê hembêza xwe ji kurdan re vekiribû.


Tiştêkî din jî heye ku divê mirov bi bîr bîne, ew jî ew e kurdên ku hatin Swêdê, kurdên siyasî yê ku hatin Swêdê berê wan hertim li welêt bû. Ew jî bo demêke kurt hatibûn vir û loma hemû xebata xwe ya li Swêdê jî bo başkirina rewşa welêt dikirin. Wan kurtedema li Swêdê jî xwe re mîna firsendekê dizanibûn û dixwestin dema xwe pir baş bi kar bînin, vala nasekinin û ku rojekê vegeriyan welêt destvala venegerin.

**OSMAN AY TAR:** Rast e û vê yekê jî bi xwe re dînamîzmek anîye, dînamîzmeke zindî anîye.

**UMER ŞEXMÛS:** Welê ye. Kurdên siyasî yê ku hatin Swêdê hem hişê wan li welêt bû, ji bo gelê xwe, ji bo miletê xwe, ji bo zimanê xwe xebitîn, hem jî xwe mîna berpirsiyarê miletê xwe dîtin, xwestin dengê miletê xwe bilind bikin, xwestin rola konsolosê welatê xwe biltzin.

**FIRAT CEWERÎ:** Gava kurdên siyasî têne Swêdê vala nasekinin, li her bajarê ku lê bi cih dibin komeleyan ava dikin û di wan komeleyan de dest bi xebata demokratîk û kulturî dikin...

**OSMAN AY TAR:** Rast e, li gora ku ew kurd jî kîjan perçeyî hatine Swêdê. Gava mirov bala xwe dide kurdên ku di komeleyan de aktîv kar û xebatê kirine, mirov dibîne ku ew bi piranî ji bakurê Kurdistanê hatine. Ji ber ku ew li wir hînî xebata demokratîk û komeleyetî bûbûn. Ew berê di partiyên siyasî de xebitibûn û xwedî tecrûbe bûn. Lê belê kadroyên kurdên başûr bi piranî berê xwe dane Londonê, ew li wir bi cih bûne. An jî yê Îranê çûne Parîsê.



**FIRAT CEWERÎ:** Lê gava mirov bala xwe dide çapemeniyê, mirov dibîne ku bi taybetî piştî salên heştêyî çapamentî ji aliye kurdên bakurê welêt ve bi pêş dikeve, ew giraniyê didin çapemeniyê û piraniya çapemeniyê jî bi zimanê kurdî dikin. Gelo sebebeke vê ya taybetî heye?

**OSMAN AY TAR:** Li gora nêrîna min ev jî ber bêmkaniya ku li bakurê Kurdistanê hebû. Ji ber ku li wir valahiyekek hebû, kurdan nikaribûne weşanên bi zimanê kurdî li wir derxin. Lê belê astengiyê weha li pêşberî kurdên Iraqê tunebûye. Wan di dema xwe de gelek weşanên bi zimanê kurdî derxistine. Lê ev yeka li ba kurdên bakur tunebû, kurdên bakur birçiyê vê yekê bûn û loma wan li Swêdê giranî dan xebata entelektuelî û çapemeniyê. Ji ber ku ew jî bo demeke kurt hatibûn Swêdê, wan digotin ew ê çend salan bîmînin û vegezin, loma tiştê jî destê wan hatiye wan kirine; di warê zimên de, di warê siyaseta de, di warê çapemeniyê de xwestine berheyan bidin. Ew merhele çiqasî dirêj ajotiye, çiqasî bi ser ketiye, ew meseleyêke din e.

**FIRAT CEWERÎ:** Lê ez bawer dikim di vir de testa kurdên perçeyên din li kurdên bakur bû ku ew li xwe û li zimanê xwe vegezin. Mîna tê zanîn, siyaservanên kurdên bakur çî bigire di her warê jiyana de zimanê tirkî bi kar tanîn, wan zêde guh nedidan zimanê kurdî, zimanê kurdî mîna hewcedariyekê nedidîtin. Lê gava hatin Swêdê, bi kurdên perçeyên din re ketin têkiliyê, bi hev re komele û federasyon ava kirin, hingî dîtin ku heger ew di axaftina tirkî de serhişkiyê bikin, ew û kurdên perçeyên din wê jî hev tenegehîjîn. Loma ew mecbûr man û hêdî hêdî li zimanê kurdî vegeziyan. Gava li zimanê kurdî vegeziyan û zimanê xwe bi dest xistin, êdî şexsiyet û nasnava xwe di zimanê xwe de dîtin. Loma heta jî wan hat xwe li zimên pêçan...

**UMER ŞEXMÔS:** Mesele dualî ye. Kurdên perçeyên din jî dixwestin ku fêhm bikin bê li bakurê Kurdistanê çî dibe, çî diqewime, dixwestin jî hevdu fêhm bikin. Yanî ne xweş bû, ku li Swêdê bi hev re rûniştana, bi swêdî an jî bi zimanekî din bi hev re bipeyiviyana. Hinek komele bi hev re ava kirin, ku wek strukturekî bikaribin hevdu bigirin û bi hev re kar bikin. Lê rast e, wan tesîr li hev kirin ku ew bi hev re bi kurdî bipeyivin. Wek kek Osman behs kir, bi tenê kurdên Iraqê dikaribûn bi kurdî bixwendina û binivîsandina. Ji ber ku wan li welatê xwe jî bi kurdî xwendibûn, zimanê kurdî di dibistanan de hîn bûbûn. Lê li deverên din yê Kurdistanê

perwerdeya bi zimanê kurdî qedexe bû. Çi kurdên Sûriyê, çi yên Îranê û çi jî yên Tirkîyê imkanê xwendina zimanê kurdî li derveyî welêt ji wan re peyda bûye. Loma, di vir de mirov dikare bibêje ku di warê bikaranîna zimanê kurdî de tesîra kurdên başûr li ser kurdên perçeyên din çêbûye.

Ya din, meseleyeke îdeolojîk tê ortê, meseleyek prensîbî tê ortê. Ne mantiqî ye ku mirov ji bo Kurdistanê bixebite, lê di civîn û komeleyên xwe de zimanê tirkî, erebî an jî farisî bi kar bîne. Gava ew bi vê yekê hesiyar, wan dev ji zimanê din berdan û dest bi bikaranîna zimanê kurdî kirin.

**FIRAT CEWERÎ:** Lê di sala jî ev taybetmendiyekê kurdên Swêdê ye. Ji ber ku heta niha jî, hem li Tirkîye hem jî li piraniya welatên Ewropa, Emerîka û Kanadayê jî kurdên bakur di civîn û komeleyên xwe de zimanê tirkî bi kar tînin, hê jî ew bi wê prensîba ku tu behs dikî nehesiyane. Di her warê jiyane de zimanê tirkî serdest e, zimanê tirkî ew bi her awayî rapêçane. Lê herçî li Swêdê ye, kurdan ev mesele kêmkirî zêde çareser kirine û ne bi tenê mirovên siyasî, heta bi sosyeteya kurd jî zimanê kurdî bi kar tînin...

**HEYDER DILJEN:** Li gora bîr û baweriya min ne ku kurdên Swêdê ji kurdên welatên din pir jîrtir bûn, pir çalaktir bûn û loma zimanê kurdî bi kar anîn an jî bi kar tînin. Rast e, mîna ku bîska din jî hat behskirin, kurdên bakur yên ku hatin Swêdê bêtir kurdên ronakbîr û xwende bûn. Û bikaranîna zimanê kurdî jî li bakurê Kurdistanê qedexe bû. Weşana kovar, rojname û pirtûkan qedexe bû. Ev aliyekî meselê ye. Lê aliyê din yê meselê, ew imkanên ku li Swêdê hebûn li welatên din tunebûn. Imkanên aborî ku dewleta Swêdê daye weşanên kurdan li tu welatên din tunebû. Heger te ev ronakbîrên kurdên Swêdê hemû li Almaniyayê bicivandina û imkan nedaya wan, wan ê tu tişt nekirana. Divê mirov binê vê yekê xêz bike, ev girîng e. Di meseleya ziman de jî, hin imkanên ku li Swêdê hene li welatên din tune. Ji sala 1975an vir ve ye ku li Swêdê bi awayekî fermî dersên zimanê zikmakî tê dayîn. Kurd jî van imkanan bi kar tînin, fêdê jê dibînin, lê li welatên din ev imkan tune. Binerin, li Swêdê dersên zimanê zikmakî tên dayîn, pirtûkên dersê hatine çapkirin, heta niha zêdeyî sed pirtûkên zarokan hatine çapkirin. Hê di sala 81ê de kovarên zarokan li Swêdê hatine weşandin. Cara pêşî bi awayekî modern zarokxaneyên kurdî li Swêdê hatiye vekirin û dewleta Tirkîyeyê ev yeka ha bi awayekî fermî protesto kiriye. Gelek tiştên weha hene. Em bêjin filmên zarokan li vir hatine çêkirin, şanoyên zarokan hatine lîstin, programên televizyonê li vir hatine çêkirin; vê



Osman Aytar

dawiyê jî em dibînin ku kurdên Swêdê di warê bikaranîna Înternetê de aktîv in. Ev imkan li welatên din tune. Kurdên Swêdê gelek kursên zimanê kurdî li dar xistine, niha jî berdewam in. Li unîversîteya Stockholmê beşa kurdî hat vekirin, li unîversîteya Uppsalayê beşa kurdî heye. Kurd bi xwe di peywendiyên xwe de kurdî bi kar tînin. Gava di salên heştêyî de Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê hare avakirin, wê jî di warê bikaranîna zimanê kurdî de roleke mezin lîst. Ji ber ku endamên Federasyonê kurdên perçeyên cihê cihê bûn û loma zimanê Federasyonê ne bi awayekî fermî be jî, lê di pratîkê de bû bi kurdî.

**FIRAT CEWERÎ:** Wê çaxê mirov dikare bi kurdî bibêje ku kurdên Swêdê ji xwe re Kurdistanê xeyalî ava kirine lê zimanê wê Kurdistanê yê rastî kurdî ye. Baş e, tesîra kurdên Swêdê, bêtir di aliyê ziman û edebiyatê de li kurdên perçeyên din, an jî li kurdên biyanistanê dibe?

**OSMAN AY TAR:** Belê, tesîra kurdên Swêdê bi awayekî eşkere xuya dibe. Lê divê

mirov vê rastiye jî bibîne, ku kurdên Swêde ne mîna berê ne, ew di warê kulturî, civakî û edebî de ne mîna berê aktîv in. Ji ber ku êdî ew entegreyî civata Swêde dibin û loma problemên wan û yên civata Swêde derdikevin. Îro gelek komeleyên kurdan hatine vê nixteyê, gelo ew ê giraniyê bidin mesela Kurdistanê, an jî giraniyê bidin civata vir, ew ê balanseke çawa çêbibe. Wekî din ew alîkariya dewlet, dezgeh û mueseseyên swêdiyan ku bi biyaniyan re dikirin jî an kêr mîna an jî nemane. Loma divê kurd biryarekê bidin. An divê ew xebata xwe ya kulturî û entelektuelî dewam bikin, an jî divê ew bi problemên xwe yên Swêde ve mijûl bibin. Gava rewş weha be, wê xebata çandî û edebî jî kêr bibe. Ev çend salên dawî mirov vê kêmbûnê his dike. Lê bêguman nayê wê maneyê ku wê xebata kurdên Swêde, kirêb û kovarên ku ji aliyê kurdên Swêde ve hatine derxistin, werin jibîrkirin.

**FIRAT CEWERÎ:** Bi rastî jî mirov di warê siyasî, kulturî û edebî de wê sistiyê dibîne. Dibe ku ev ji ber şerdên zehmet yên jiyana sirgunê be. Ji ber ku gava kurdên xwende û siyasî hatin Swêde, ew bi niyeta salekê û du salan hatibûn, lê ew salek û du sal li wan bûn bîst sal. Bîst sal li wan bû kabûsek. Êdî wan xortanî li dû xwe hiştin û zarokên wan mezin bûn. Wan xwestin vegerin, nikaribûn, adapteyî civata vir jî nebûn. Encama ku li Kurdistanê li bende bû jî nestendin. Problemên gelek bi malbata wan re derketin. Gelek ji wan gêj bûn, bûne mîna çûkên ku hêlin li ber wan herimî be. Tişteki xwe wenda kirine, lê digerin, lê nizanin çi ye. Loma, mirov hem di warê siyasî de hem jî di warê edebî de bêhêviyekê dibîne. Di vir de krîzek xwe nîşan dide...

**HEYDER DILJEN:** Kurdên ku bi plan û program in, yên ku haya wan ji guhertinên dinyayê hene, yên ku bi wan guhertinan re xwe diguherin û hêviya wan ya pêşerojê heye, ez bawer nakim ew kurd bikevin tu krîzan. Ew ê li ser lingan bimînin. Lê yên ku bi krîzan re rû bi rû ne û li ser sînorê têkçûnê ne, ew kurdên ku xwe naguherin, mîna bîst sal berê difikirin, mîna bîst sal berê li xwe dikin, mîna bîst sal berê dimeşin in. Ji bo van kurdan pêşeroj tarî ye. Ew tu hêviyê nabînin. Ew ne dikarin vegerin Kurdistanê, ne jî dikarin li vir baş bi cih bibin. Ji xwe êdî ew vegerin Kurdistanê jî ew ê nikaribin tişteki bikin, êdî Kurdistan jî ne Kurdistana berê ye. Nivîşê nû gihîştîye, kadroyên nû gihîştine.

**FIRAT CEWERÎ:** Rastiye jî heye, Kurdistan ji bo generasyona dudan, an jî nivîşê dudan abstrak e. Gelek ji wan li Swêde hatine dinyayê, an jî di pêçekê de bûn hati-



Umer Şexmûs

ne Swêdê. Wan Kurdistan li Swêdê ji dê û bavê xwe bihîstine, yanî ji bo wan lîngên Kurdistanê ne li erdê ye. Nizanim gelo wê ev nîş çiqasî kurd bimîne?

**UMER ŞEXMÛS:** Ev tişt ne bi tenê ji bo kurdan derbas dibe, ev ji bo hemû grûbên multecî derbas dibe. Gava jiyana sirgûnê dirêj dajo, entresa siyasî jî kêmîr dibe. Mirov bêhêvî dibe, problemên civakî û malbatî derdikevin pêşberî mirov. Ev fenomen ji bo hemû grûbên multecî welê ye. Lê li vir tiştek heye ku di hêla teorî de jê re dibêjin "kohort". Kohort çîlekî emir e. Kurdên ku di salên pêncî, şeştî, heftêyî, heştî an jî di salên nodî de hatine, ji sedî nodê wan kurdên siyasî bûne. Kurdên ku niha tên, ji sedî nodê wan ne siyasî ne. Loma, piştî demekê, ew dikarin ji aliyê rêxistinî de bêhêvî bibin, baweriya wan ya siyasî dikare kêmbibe.

Digel ku ez naxwazim kurdên Swêdê zêde mezin bikim jî, lê di hêla edebî û ronakbîrî de rola kurdên Swêdê pir mezin e. Ez bawer dikim wê di rojên pêş de lêkolîner li ser vê babetê rawestin û mezinahiya kurdên Swêdê binin zimên.

**FIRAT CEWERÎ:** Gelo wê ev rola kurdên Swêdê bi tenê li Swêdê bimîne, an jî wê belav bibe, bigihîje Kurdistanê û li wir jî tesîra xwe nîşan bide?

**UMER ŞEXMÛS:** Bi a min ji niha ve belav bûye û tesîra xwe jî baş nîşan daye.

**FIRAT CEWERÎ:** Mirov dikare hin nimûneyên konkret bide?


**UMER ŞEXMÛS:** Di vir de divê em behsa globalîzmê bikin. Ji ber ku bi globalîzmê re tiştên ku îro li Swêdê dibin, kitêbên ku derdikevin tavilê digihîjin kurdên seranserê dinyayê. Ji aliyê din ve jî, modela xebata kurdên Swêdê ji kurdên din re dibê nimûne û ew li gora wê xebata xwe dimeşînin. Mirov dikare di vir de komele, federasyon û perwerdeya bi zimanê kurdî wek nimûne bide. Xelk jî welatên din tî Swêdê û dixwazin metoda xebatên ku ji aliyê kurdan ve li Swêdê têne kirin di cihê cih de bibînin, ew tî Swêdê û kitêbên kurdî, filmên vîdeo û kitêbên dersê dikirin.

**OSMAN AY TAR:** Bi ya min jî tesîra kurdên Swêdê li ser kurdên din gelek e, lê carinan tesîr xwe bi carekê ve nîşan nade. Tesîr jî prosesek e û ev tesîra kurdên Swêdê, tesîra kitêb û weşanên kurdên Swêdê belkî piştî bîst-sê salên din xwe nîşan bide. Îro xebatên ku ji aliyê kurdên Swêdê ve têne kirin pir kêr digihîjin welêt, sibe du sibe gava rewş baş bibe û ev kitêbên ku li vir derketine bigihîjin welêt, bêguman wê tesîreke mezin bike.

**UMER ŞEXMÛS:** Tiştêkî din jî heye ku divê em bi bîr bînin, ew jî azadiya bîr û baweriyê ye. Li cihê ku azadiya bîr baweriyê tunebe, pêşketin jî çênabe. Ji ber ku kurdan li Swêdê azadiya bîr û baweriyê bi dest xistine, wan di warê ronakbîrî û nivîskariyê de jî xebatên hêja kirine.

**FIRAT CEWERÎ:** Bi rastî jî mîna ku me kurdên Swêdê ji xwe re li Swêdê Kurdistanê xeyalî çêkiribe. Lê zimanê rastî yê vê Kurdistanê xeyalî bi kurdî ye. Kurdên derveyî Swêdê jî bi vî çavî li kurdên Swêdê dinerin. Heta ji devereke dinyayê, an jî ji Tirkîyê û bakurê Kurdistanê yê ku bixwazin kitêbekê bi kurdî biweşînin, ew berê xwe didin Swêdê, ew li kes û weşanxaneyên li Swêdê digerin û dixwazin kitêba xwe ya bi kurdî li Swêdê biweşînin. Ew welê bawer dikin ku Swêdê cihê kurdî ye û kurdên Swêdê bi kurdî dipeyivin. Bêguman li ser bikaranîna kurdî ya kurdên Swêdê jî





Heyder Diljen

aliyê hin kesan rexne jî li kurdên Swêdê hatine girtin. Lê her çawa be, piraniya kurdan jî, qet nebe, di warê kurdî û weşangeriya kurdî de hêviyeke mezin bi kurdên Swêdê an jî bi Kurdistanê xeyalî ya li Swêdê ve girê dane. Gelo, ev ne talûkeyek e. Heger siberoj ev Kurdistanê xeyalî hilweşe, nemîne, wê valahiyekê bi xwe re neyne? Wê kurdan hêvîsikestî neke?...

**UMER ŞEXMOS:** Ji ber ku millet gelekî zindî ne, zû bi zû têk naçin. Heger li Kurdistanê azadî peyda bibe, Kurdistanê vir têk here jî, wê berhemên wê bigihîjin Kurdistanê.

**FIRAT CEWERÎ:** Baş e, heger li bakurê Kurdistanê azadî peyda nebe û Kurdistanê vir jî têk here, wê hingê çawa bibe?

**UMER ŞEXMOS:** Ma maqûl e ku heta heta azadî peyda nebe, ma tişteki mantiqî ye ku Tirkiye heta heta welê bimîne û xwe neguhere...

**FIRAT CEWERÎ:** Belê, mantiqî ye... Heger xweneguhertina Tirkiye ya heftê-heys-tê salan mantiqî be, wê ya panzdeh-bîst salên bê jî mantiqî be. Û heger bi rastî jî di van panzdeh bîst salên pêşiya me de guhertinin bingehîn li Tirkiyê çênebin, ziman û nasnava kurdî dikare têkeve talûkeye mezin.

**HEYDER DILJEN:** Tiştên ku berê li Swêdê bûne, ji xwe bûne. Lê niha li welêt an jî li Stembolê, ji Swêdê bi deh qatî zêdetir tişt dibin. Gava mirov li van pênc salên dawî dinere, mirov li hejmara kitêbên ku derdikevin, li hejmara kovar û rojnameyên ku derdikevin dinere, mirov dibîne ku bi rastî îro li Tirkiyeyê gelek tişt dibin. Li Stembolê bi kurdî rojnameya hefteyê derdikeve. Li gelek bajaran radyoyên mehelî vebûne. Gotina min ew e ku li wir jî gelek tişt dibin. Lê li Swêd çi heye? Li Swêd tiştek heye ku li wir tune, di meseleya perwerdeyê de, mamoste ne, kitêbên dersê ne, kitêbên zarokan in, kovarên zarokan in. Kurdên li derveyî Swêdê dikarin vê ji xwe re bingeh bigirin û jê fêdeyê mezin wergirin.

Mesela rola kurdên Swêdê jî rast e. Gava mirov ji Swêdê diçe welatekî din, ew bi mirov re bi kurdî dipeyivin. Lê heger tu ji Danîmarkayê, ji Fransayê an jî ji devereke din herî, ew hingî bi tirkî dipeyivin. Yanî ew dizanin yên ku kurdên Swêdê ne bi kurdî dipeyivin. Ji aliyê din jî bi alîkariya kurdên Swêdê îro di warê zimên de jî yekîtiyek çêdibe. Gava mirov bala xwe dide kurdiya ku îro tê bikaranîn çi bigire mîna hev e. Li Nûdemê binere, li Avaşîn binere, li Çirayê binere, li Nûbiharê binere, li Berbangê binere, li Azadiya Welat û Jiyana Rewşen binere, zimanê hemûyan nêzikî hev in. Rast e, vê yekê li Swêdê dest pê kir û rola kurdên Swêdê di vî warî de mezin e, lê ji aliyê din ve, gava mirov îro bala xwe dide Swêdê, mirov wê hêviya destpêka salên heştêyî zêde li Swêdê nabîne. Lê dîsa jî, gava azadiyek were welêt, hema ev kitêbên ku Nûdemê çap kirine, wê gelek ji wan wek kitêbên dersê werin xwendin, wê Hawar wek kitêbeke dersê were xwendin.

**UMER ŞEXMÔS:** Dikare welê jî were fêhmkirin ku kurdên Swêdê ji xwe re cîhanek biçûk ava kirine, zanebûna xwe û zimanê kurdî ji bo xwe û zarokên xwe bi kar tînin û piştî demekê wê hêdî hêdî dejenere bibin, îzole bibin û nemînin. Nêrîneke weha hin tarîqatên ku di dema xwe de çûne Emerîkayê û li wir jiyaneke îzole jiyane û dû re jî hêdî hêdî heliyane, tîne bîra min. Lê ez ne di wê bawriyê de me ku wê tiştekî weha bi serê kurdên Swêdê de were. Ji ber ku ne kurdên hatine vir tu tarîqat in, ne jî cîhan cîhana berê ye. Globalîzmê ev pirsgirêk çareser kiriye. Ji ber ku êdî ne welat ewqasî ji me dûr e, ne jî em ewqasî dûrî welêt in. Înternet e, televizyon in,

weşan in, telefonên destan in, van cîhan ewqasî biçûk kiriye ku, kurd ji îzelobûnê rizgar kirine.

**HEYDER DILJEN:** Ez îro bi xwe ne di wê qeneetê de me ku ji niha û şûn de wê kurdên Swêdê bikaribin di warê siyasî de tiştekî bikin. Mexseda min ji kurdên bakur e...

**OSMAN AYTAZ:** Ez dixwazim werim ser wê Kurdistanê biçûk ku we behs kir. Ez bi xwe ne di wê baweriyê de me ku wê ev Kurdistanê biçûk hilweşe, lê wê şikil biguhere. Karaktera kurdên Swêdê berê ew bû ku ew bi axaftina xwe ya bi kurdî, bi kirêb û weşanên xwe dihatin naskirin. Lê ev berî çar-pênc salan sist bû, kêm bû, gelek weşan rawestiyên. Lê weşanên ku derketine mîrasek e, nayên jibîrkirin. Heger kurdên Swêdê bikaribin xwe li gora dema nû biguherin û bi cîhana teknolojîyê re gavan biavêjin wê dîsa xwe di rojevê de bihêlin û li ser lingan jî bimînin.

**FIRAT CEWERÎ:** Divê em vê jî bi bîr bin ku Swêdê jî gelek milletên din re jî mazûbantî kiriye. Siyasiyên gelek welatan xwe spartine Swêdê û piştî ku rewş li welatê wan hatiye guhertin ew vegeeriyane welatê xwe û li welatê xwe bûne serokwezîr, bûne wezîr û bûne birêvebîrên dewletan. Em dizanin ku kes jî Swêdê vegeeriyane û li bakurê welatê nebûne wezîr û serokwezîr, lê ji kurdên başûr gelek kes vegeeriyane û li welatê bûne xwediyên berpirsiyariyên bilind. Ne welê kek Umer?

**UMER ŞEXMÛS:** Rast e, serokê parlemanto, çend wezîr ji herdu aliyên, midûrê emniyeta giştî, gelek parlementerên başûr jî Swêdê vegeeriyane. Heger li bakurê Kurdistanê jî guhertinek welê bingehîn çêbibe, wê gelek ji kurdên vir vegeeriyane welatê xwe û bibin siyasetmedar.

Lê heger hê fikra pêşengiyê di serê kurdên Swêdê de hebe, ew şaş e. Mirov di vê demê de nikare ji derve pêşengiyê bike. Di dema Lenîn de dibû, lê îro nabe. Lê kurdên Swêdê dikarin tesîr li ser naveroka siyaseta kurdî bikin û bi raya min kiriyê jî; Kurdên swêdê bi fikir û ramanên xwe siyaseta welatê nerm dike, demokratîktir dike, rengêkî îdeolojî î nuh didiyê, danûstandinê wê baştir bi dinyê ve girêdide. Yana jî ber têgihîştin û ronakbîriya kurdên Swêdê, giraniyeke wan jî heye. Ev giranî jî weke hêzeke piştgir, wek hêzeke ronakbîr û wek hêzeke rêzdar heye, lê ne wek hêzeke ku ji vir serkêşiya tevgera siyasî ya Kurdistanê bike.

**OSMAN AY TAR:** Dîsa jî gava em bala xwe didin kurdên ku ji Swêdê vegeyane welêt, em dibînin ku kê m zêde wan di rêza pêşî de cih girtine. Hege kurdên Swêdê serkêşiya tevgeran nekin jî, wê di birêvebirina wan de roleke mezin bilîzin.

**FIRAT CEWERÎ:** Lê divê em vê rastiye jî ji bir nekin, ku kurdên Swêdê li ser sermaye xwe ya berê dijîn. Wan xwe li welêt gihandibûn, wan li welêt zanebûn û rêgihîştina xwe bi dest xistibûn. Ew li welêt xwediyê giraniyekê bûn an jî motora lokomatîva tevgera welêt bûn. Piraniya van insanên me, ne ku xwe li Swêdê gihandine, ne ku li Swêdê bûne xwediyê kapasîteyê entelektuelî. Rast e, gelek ji wan asoya xwe ya fikrî û entelektuelî li Swêdê firehtir kirine, lê gelek jî konservatîv mane, xwe bi tu awayî neguhertine, tenê bi hîsên nostalgî dijîn. Her çawa be, ez bawer dikim ku wê rojekê ji rojan tecrube û rêgihîştina van kurdên Swêdê bi kêrî welêt were û dibe ku cih bi cih serkêşiya tevgera welêt jî bike.

**OSMAN AY TAR:** Niha rastiye heye, kurdên ku em li vir herî kê m dicibînin, mexteda min kurdên siyasî ne, gava ew vegeyane welêt ew dikarin di partiyên kurdan yê n legal de hilkişe cihê herî bilind.

**HEYDER DILJEN:** Bi ya min kurdên Swêdê bi qasî ku pêwîst bû nekirine, xwe zêde bi pêş nexistin. Hege wan li gora kapasîteya xwe bikirana, dikaribûn gelek tişt bikirana.

**FIRAT CEWERÎ:** Gava ez li kurdên Swêdê difikirim bi min wilo tê ku wan xwe di kolonîya xwe de îzole kirine. Nizanim gelo, li gora ku pêwîst bû wan lobiyên xwe ava kirine?

**UMER ŞEXMÛS:** Erê, bi ya min wan lobî ava kirine. Hem jî li Swêdê lobiyên mezin hatine avakirin. Bi xêra van lobiyên bû ku sêmpatiya raya giştî ya Swêdê li hemberî kurdan çêbûbû. Bi xêra van lobiyên bû ku giregire n siyasî zilma li ser kurdan bi awayekî fermî protesto kirine, piştgiriya xwe vekirî ji bo kurdan nîşan dane. Lê mirov dikare bipirse, çima kurdan tiştên mezin bi dest nexistin. Bi dîtina min kêmasî ya tevgerên kurdan bû. Tevgerên ku li welêt dihatin meşandin, gelekî prîmîtîv bûn, gelekî teng bûn, ne di mustewa siyaseta dinyayê de bûn. Loma kurdan serketinên mezin bi dest nexistine.

**FIRAT CEWERÎ:** Bi rastî mirov dikare bi rojan li ser vê mijarê bipeyive, lê mixabin rûpelên me bi sînor in, loma, bi destûra we be em ê hêdî hêdî dawiyê li sohbeta xwe bînin, lê berî wê ez dixwazim ji her yekî ji we li gora mijara we pirsêke konkret bipirsim. Osman Aytar, tu dikarî ji kerema xwe re bi kurtî ji me re behsa karê kurdên Swêdê yê komleyetiyê bikî?

**OSMAN AY TAR:** Swêd bi xwe welatekî bi organîze, welatekî ku di her warî de xwedî komele ye. Bêguman kurdên li Swêdê jî xwe di vî warî de organîze kirine û çî bigire di her şaxî de komleyên xwe ava kirine. Komleyên kulturî, komeleyên ciwanan, komeleyên jinan, komeleyên nivîskar û hunermendan, federasyon û komeleyên gelek babetên din ava kirine û kar û barê xwe di wan komeleyan de dimeşînin. Lê ev kar û bar sist dimeşin, bi qasî ku tê xwestin berhem nade. Ev jî dîsa ji kêmasiya kurdan tê. Ji ber ku kurd qîmet nadin yê xwe, heger, bo nimûne em bêjin ku komeleyek li ser zimên semînerêkê bide û wek semînerdar kurdekî biezimîne, dibe ku kes neçin lê guhdarî nekin. Lê gava yekî biyanî ji Emerîka an jî ji welatekî din were, wê kurd têkevin dorê. Ev komplekseke kurdan e, hertim xwe û yê xwe biçûk dibînin. Lê gava ku ji nav kurdan jî yek di danûstandinên xwe de bi pêş dikeve, vê carê ew jî ji kurdan bi dûr dikevin û di saziyên xelkê dixebitin. Gava rewş ev be, komeleyên kurdan jî di listina rolên xwe de pasîv dimînin.

**FIRAT CEWERÎ:** Heyder Diljen, tu bi xwe mamostetîya zimanê kurdî dikî an jî tu mamosteyê zarokên kurdan î. Gelo xwendina bi zimanê kurdî li Swêdê di kîjan salê de dest pê kir û îro berfirehiya vê xwendinê di çî rewşê de ye? An jî gelo di derbarê şagirtên kurdan de tu statîstîk hene.

**HEYDER DILJEN:** Bi awayekî giştî perwerdeya bi zimanên biyanî di sala 1975an de dest pê kir û ji wê demê de ev qanûn ji bo kurdan jî derbas dibe.

Belê, statîstîk hene, li gora statîstîkên fermî yê 1999an 5752 zarok bi kurdî dixwînin. Ev zarokên hemû perçeyên welêt in.

**FIRAT CEWERÎ:** Kerem bike kek Umer, gotina te ya dawî ya di derbarê kurdên Swêdê de çî ye?

**UMER ŞEXMÛS:** Ez dixwazim vê bibêjim ku ji bilî yê orjînal, kurdên Swêdê di xebata xwe ya siyasî û entelektuelî de roj bi roj demokratîr dibin. Ev celebê xebata

---

demokratik resîrê li tevgera welêt jî dike û toleransê li ba wê jî zêdetir dike.

**FIRAT CEWERÎ:** Baş e, gelo wê pêşeroja kurdên Swêdê çawa be? Wê kurdên Swêdê rojekê ji rojan vegerin welêt? Ez bi xwe bi niyera salekê an du salan hatim Swêdê lê va ye bîst salên min qediyên û ez hê jî venegeeriyame.

**OSMAN AYTAR:** Ez bawer nakim ku wê kurd bi giştî vegerin. Ji ber ku ew demeke dirêj in li Swêdê dijîn, adapteyî vê civatê bûne, li vir bûne xwedî kar, zarokên wan li vir diçin dibistanan û ya din jî rewşa welêt ne stabîl e. Lê digel vê jî yên ku vedigerin hene, wê di pêş de jî heger zarok li vir bimînin jî, gelek dê û bav vegerin, lê wê bi carekê ve têkiliyên xwe ji Swêdê qut nekin.

**FIRAT CEWERÎ:** An jî dibe ku zarokên wan vegerin lê ew li vir bimînin...

**OSMAN AYTAR:** Rast e, dikare weha jî bibe. Lê divê kurd planên xwe li gora vir jî çêbikin.

**HEYDER DILJEN:** Li gora bîr û baweriya min divê vegera kurdan jî vegereke bi mane be. Kurdên ku ev panzdeh bîst sal in li vir in, xwe di hin waran de gihandine, bûne xwediyê kapasîteyêke entelektuelî, gava ev kurd vegerin welêt, divê wê zanebûna xwe bi hevwehatiyên xwe re par ve bikin, têkevin nav wan, bi wan re bixebitin. Loma, vegera kurdên xwedî kompetens bi mane ye. Lê heger kurdên siyasî vegeeriyane û ji xwe re ji bo debara xwe li Diyarbekirê dikanek veke, ew zêde maneyekê nade. Ha dikan li Stockholmê veke, ha jî li Diyarbekirê veke, zêde tiştêkî naguhere.

**UMER ŞEXMÛS:** Di lêkolîna zanistî ya koçê de du qanûnên esasî hene. Yek jê mesela vegeerê ye. Ya din jî qanûneke giştî heye ku mirov dikare li ser hemû miletên dinyayê tebîq bike ew jî ew e ku ji salên 1600î û heta niha, yanî sebebên koça grûbên cihê te divê siyasî an jî aborî be, ferq nake, xwestina wan ya man û nemanê çiqasî bi qewer be, bi statistîkî yên ku vegeeriyane welatên xwe hejmaran wan ji sedî pêncî ye, ji sedî pêncî jî li welatê mêvan mane. Ev yeka ha bûye wek qanûneke giştî. Lê ne şerd e ku hemû wextî welê be. Gava mirov lêkolînen ku heta niha hatine kirin bicivîne ser hev, ev encam jê derdikeve. Li gora statistîkên zanistî, daxwaza parastina kultur û nasnavê li ba cîlê yekê û dudan xurt e, lê cîlê sisiyan êdî

dikeve nav çerxa asîmîlasyonê.

**FIRAT CEWERÎ:** Bi hêviya ku wê vegera kurdan bi cilê yekê dest pê bike, ez ji bo vê sohbetê spas dikim...

**Umar Şûmûs** di sala 1942an de li binxetê, li bajarê Amûdê hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya destpêkê, navîn û lîse li Sûriyê temam kiriye. Xwendina xwe ya bilind, politîkî û dan û standînan navnetewî li universîteyên London û Stockholmê qedandiye. Ji xortaniya xwe de di nav tevgera siyasî û ronakbîrî ya gelê kurd de ye û li piraniya perçên Kurdistanê û li derveyî welêt kar kiriye. Ji sala 1973an û di demên cihê de mamostetiya politîkî û lêkolînvanîya zanistî li universîta Stockholmê kiriye.

**Heyder Diljen** di 1951ê de li Sêwregê hat dinyayê. Dibistana mamostetiye li Erxeniyê û Enstîtuya Perwerdeyê li Diyarbekirê temam kiriye. Di navbera salên 1970 û 1981ê de mamostetî kir. Di van salan de hem di nav tevgera xwendekaran de hem jî di ya mamosteyan de aktîf cih girt. Serokatiya Komela Mamosteyan (TOB-DER) şaxa Sêwregê û sekreterîya şaxa Diyarbekirê kir.

Di sala 1980ê de ji aliyê cûntaya Kenan Evren ve ji kar hat avêtin.

Di 1983an de li Swêdê bi cih bû. Ji sala 1984an û bi vir de ye ku mamostetiya kurdî dike.

Heyder Diljen nivîskarê kitêbên densê ye jî. Heta niha çar kitêbên wî çap bûne.

Ew niha li Swêdê, li Beledîya Vesterosê mamostetiya zimanê kurdî dike.

**Osman Aytar** di sala 1960î de li Kurdistanê Bakur li bajarê Sêwregê (Sêrek) hatiye dinyayê. Di 1982yan de ji ber sebebên siyasî Fakulteya Tîbê ya Diyarbekirê terk kiriye û hatiye Swêdê. Di periyoda 1992-1993yan de berpînsiyariya giştî ya rojnameya Medya Guneşiyê kiriye. Heta niha çar kitêbên Aytarî hatine weşandin û di weşanên kurdan de gelek makalên wî yên bi kurdî û tirkî derketine. Aytar di Unîversîteya Stockholmê de sosyolojî, îstatîstîk, kompûter û sistêmanî xwendîye. Ew niha jî di Institutiyona Sosyolojî ya Unîversîteya Stockholmê de li ser organîzasyonên biyanîyan û hin dezgehên dewleta Swêdê ku bi karûbarên biyanîyan elaqeder dibin doktora dike.

## Tîrek buhirî, çû

ROJEN BARNAS

Nişkekê va li ber dîna min  
Tîrek buhirî, çû  
birûskbeza  
Ber bi valahiya nepeniyê.

Kê ew ji kevanê nenasiyê berda?

Hay lê nebû kes  
Hay jê nebû kes  
Tenê min dî  
Ji ber  
Ku ew  
Jiyê min bû  
bi xwe

Tîrek buhirî, çû  
Bê çiv.  
Tîrek buhirî  
Sererast.

Jî: emir, temen



# “Bavo, ka ji min re bixwîne!”



SILÊMAN DEMIR

“Bavo, ka ji min re bixwîne!”, navê bangeke çend sendîka, çend rêxistinên din ên civatî û çandî yên Swêdê ye. Bi bulteneke ji çar rûpelên biçûk pêkhatî, bangî endamên xwe dikin da ku ji zarokên xwe re bixwînin. Ji ber ku di encama lêkolîn û pîvanan de derdikeve ku doşa-seviya karkirên nû-ciwan a kulturî, entresa wan a di derheqa kar û barên sendîkayî û siyasî de dikeve. Tê digihîjin ku ev yek ji ber ku di zaroktiya xwe de kêr û tiştên şaş dixwînin. Ev yek xetereke mezin e. Him nexwendin û him jî bipêşdeketinên nû ên ku di warê teknîka kominîkasyonê de bûne, dikarin bikin ku ew bixapin û bi carekê re dev ji xwendina pirtûkan berdin. Gava wilo be, pêşeroja sendîkan, a mafê karkiran, a swêdê û demokrasiya swêdê dikeve xeterê. Ji ber wilo jî bi bingeheîn bang dikin bavan da zarokên xwe wek mirovên kamil û bi rûmet mezin bikin. Bang dikin da ku dê û bav watiniyên xwe yên li hemberî zarokên xwe bînin cîh. Da gava ku mezin bibin, bi ilim, çand û zanîyariyê rapêçayî bin, ne destvala bin û di jiyane de têk neçin.

Bang, çend rêz in; payîza 2000 li cîhên karan li endamên sendîkan hat belakirin. Ez ê wergerînim û rave bikim. Ez bawer im ku divê dengê wê bangê bê me kurdan jî.

Di rûpelê pêşî de, sûretê bavêkî simbelmezin ê di dîwanekê de rûniştî ye heye. Nîgên xwe avêtine ser balgehê û rojnama xwe dixwîne. Lawikekî biçûk, pirtûkek di nav destên wî de ye, tê ba bavê xwe û jê re dibêje "Bavo, ka ji min re bixwîne!"

Di rûpelê duyem de tê gotin bê mane û buhayê xwendinê çî ye. Ez ê tevî wergerînim:

"Gelo tu dizanî...

-ku zaroka te zimanê xwe hîna di dema çêbûnê de ava dike, bi pêş de dixê

-ku ne karmendên mala zarokan, ne mamoste û ne jî tu kesên dîn karin bi qasî ku tu dikarî wek bav ji bo xurtbûna zimanê zaroka xwe bikî, bikin

-ku xwestina xwendinê, gelekî berî gava ku zaroka te digihije temenê ku bikaribe xwe fêrî xwendinê bike û bixwîne, pê re çêdibe

-ku gava tu hezkirina pirtûkan û xwendinê dixî dilê zaroka xwe, fêrbûna xwendinê jê re hêsantir dibe

-ku gava pirtûk li malê hebin, xwestina xwendinê bi zaroka te re çêdibe

-ku gava tu bi xwe dixwînî, xwestina xwendinê bi zaroka te re jî çêdibe

-ku bi lihevduyanî û gotinan, listikên bi gotinan, sohbetên di derheqê sûret, pirtûk û xwendinê de û xwendina çîrok û serpehatiyan, hêza zaroka te ya fantazyîyan û zimanê wî/wê bipêşdetir de dibe'

Bi dû re, di rûpelê sêyem de tê nivîsîn bê sendîka karin di vê derheqê de çî alîkariyan bi bavan bikin. Sendîka eşkere dikin ku ji bo bavan civînan dikin, bavan fêr dikin bê divê çawa bê kirin. Sendîka pirtûkên erzan peyde dikin û li cihên karan şewirmendan eşkere dikin da ku her yek bikaribe here bişewire û agahdariyan bistîne.

Piştî wê, îcarê armanca vê bultenê tê nivîsîn:

"Armanca bi yabo ka ji min re bixwîn, xurtkirina xwendina zilamên endamên LO (kinaya navê rêxistina karkirên Swêdê ye) a pirtûkan e. Bavên ku dixwînin, ji bo

piraniya zarokan zilamên herî pêşevan in, ên ku zarok herî bêtir dixwazin bişibin wan in. Û her wilo bawer dikin ku çîrokbêjî/xwendin, pirtûk û xwendin karê bavan e. Ev yek, ji bo perwerdekirina zarokên îro û zilamên pêşerojê gelekî girîng e.

Di rûpelê çaremîn de, hinek nivîsandina din a xurtkirina tiştên li jor e, heye. Tê gotin ku xwendin û demokrati, hevkarî û humanîzm bi hev re ne. Qîmetên demokrati, hevkarî û humanîzmê, bi xwendinê û fêrbûnê tên avakirin û parastin. Bi dû re jî tê gotin bê kîjan û kîjan sendîkayê ev bulten amade kirine.

Sendîka karkirên endustrî yên metal,  
Sendîka karkirên servîsê û komunîkasyonê, otel û restaurantan  
ABF, yekîtiya perwerdekirina karkiran (ev ne sendîka ye, awayekî dibistana karkiran e)  
Û rêxistina bi navê Pirtûkek ji bo hemû kesan

Bi baweriya min "Bavo, ka ji min re bixwîne!", ji bo me kurdan tê du maneyan. Mana pêşî, maneya xwe ya rast e, a ku sendîka eşkere dikin. A duyem, a di derheqa pêşeroja zimanê kurdî de ye. Heger zarokên kurdan fêrî kurdî û xwendina bi kurdî nebin, kurdî û xwendina bi kurdî li ba wan û ji wan pê ve dimire. Divê îro fêr bibin da ku sibe bibin kurdên kamil, bibin ên ku bi kurdî zanin bixwînin û binivîsin.

Heger xwendina hindik tirsê bixe nava swêdiyan, divê em kurd kabûsan bibînin. Heger rêxistinên wan ên kar û ên civatî xwe di bin berpirsariya guhertina rewşeke wilo de dibînin û dikin li hemberî xeterê rawestin, divê em hemû bi hemû hêza xwe û hemû rêxistinên xwe ji bo guhertina rewşa xwe ya kamax bixebitin û li hemberî xeterê rawestin. Ji ber ku em bîst sîh milyon kurd, di salekê de, bi qasî tiştên ku heşt milyon swêdî di rojekê de dixwînin naxwînin. Ji ber vê yekê û li gora lêkolîn û agahdariyên herî dawî ku min di vê derheqê de xwendine, divê em bi şev û rojan mirina xwe bi çavên xwe bibînin. Xeter û nîşanên ku zimanekî tehdît dikin û têk dibin, dora me pêçane û ne xema me ye.

Gava ez li vê rewşê û vê xemsariyê dinerim, ez hêsrên ji hesinê helandî dirijînim. Divê em vê yekê bisekinînin. Lê em ên ku dinivîsin tenê nikarin vê têkçûnê rawestînin. Vê yekê, em hemû bi hev re karin bikin. Divê em kurd li xwe vegerin. Divê berî ku bibe dereng em li xwe vegerin.

Ev yek, ev gotin û ev hewcedarî, ne ji ber ku ez bi xwe gelekî tirsiyame ye. Ji ber şaşiya rêya kamax ku me daye ser e. Heger ji bedêla ku em hukum li gora xwestina dilê xwe bidin û bibêjin na bavo, ma kurdî dimire, em rewşê li gora pîvanên ku lêkolîner didin dipîvin, em ê vê yekê wek alarmekê qebûl bikin û li xwe bixurcilin. Divê em hewl bidin û van dengan bibin hev û netewa kurd.

Ji ber wilo jî "Bavo, ka ji min re bixwîne!", pirs, xwestin û hewcedariya hemû zarokên me kurdan e. Lê mixabin ku wê piraniya bavan dahfekê bidin lawê xwe, ya jî silleyekê biavêjnê û wê ji ba xwe berdinê. Ji ber ku wê şerm bikin, wê nexwazin bibêjin "kurê min ez nizanîm bi kurdî bixwînim, pirtûk li mala me tune ne."

Ji ber vê yekê jî bi baweriya min divê berî hemû tiştan dê û bavên kurd xwe fêrî kurdî bikin, xwendina bi kurdî ji xwe re bikin adet, bikin şiklê jiyana xwe û bi dû re jî ji zarokên xwe re bixwînin. Divê dê û bavên kurd di vê derheqê de bibin pêşevanên zarokên xwe, wan fêrî kurdî û xwendina bi kurdî bikin û bibin avakarên neteweya kurd ya pêşerojê. Tiştê ku em dixwazin, tiştê ku hewcedariya me pê heye, ne ku çend mirov li vir û dera han bi kurdî bizanibin bipeyivîn e. Tiştê ku em dixwazin û hewcedariya me pê heye û me wek kurd heq kiriye, ku em xwedî zimanekî jîndar bin e. Ya jî bi gotineke din: tiştê ku me heq kiriye û hewcedariya me pê heye, zimanekî jîndar e, zimanekî ku em pê çîrokan, stranên dibêjin, helbestan, romanên, kovaran û rojnaman dixwînin, pê kar, sohbetê û xwendinê dikin. Pê cot, paleyê, tevrikê û ticaretê dikin. Bi gotina herî kin, zimanekî ku em pê dijîn e. Zimanê me xweş e, dewlemend e, lê heger em pê nexwînin, em mecala ku edebiyat pê bibe peyde nekin, heta du nişên din wê çend pîr li vir û dera han bi kurdî bizanibin û hew.

Divê ev yek neyê serê kurdan, dinyayê û zimanê me. Xebînetê dinyayê, herêma qedîm, çiyayên rengîn û welatê bav û kalan ku rojekê ji kurdan û zimanê kurdî xalî bibe. Ka em hewl bidin û nebin ew nişê xain ê ku xelesa zincîra dîrokî a zimên li ba diqete û dike serê weris ji destê kurdan bifilite. Ka em hinekî din hewl bidin, em kovar, rojmanê û pirtûkên bi kurdî bixwînin, li hevdu bigerînin, zarokan fêrî kurdî û xwendina bi kurdî bikin da ku zimanê me, edebiyata me, çand û pirtûkxana me bikaribe berdewar be. Da edebiyata me xurttir bibe û zimanê me bikaribe bijî. Ji ber ku zimanekî xwendin, nivîsandin û edebiyat pê nebe, mixabin îro nikare bijî. Ji ber ku îro ne wek doh e. Doh em bi zimanê xwe dijîyan. Me bi kurdî cot, paleyî, çandin, hilanîn, danîn û lêkirin dikir. Me hemû kar û bar bi kurdî dikirin. Stranvan û çîrokbêjên me hebûn. Me dawet û dîlan bi kurdî dikirin. Kar, dawet û jiyana gundîtiyê, kanî û garantiya zimanê me bûn. Gundên me

hebûn. Jiyana zinde li wan rûniştî bû. Lê îro? Mixabin îro piraniya wan hatine hilweşandin. Berê her ji sê çar gundan yekî ya jî duduyan tenê bi hinek tirkî zanibûn. Lê îro em bêyî alîkarîya tirkî nema ji hevdû fam dikin. Berê, carê tirkî bi cendirman re dihat û bi wan re vedigeriya û diçû. Pêwendiyên me yên bi tirkî re ew tenê bûn. Lê îro? Îro ên ku xwe bi darê zorê kirine mezinên me û dikin me hemûyan bikin tirk hene. Îro hejmara radyo û televîzyonan, a kovar û rojnaman nayê hesêb. Baş e ku ew tişt mişt hemû li ba me jî hene, lê bi hêleke xwe rehên me yên kurdûna me dibirin, tirkî dixin dewsa kurdî. Hemû bi hev re vektora têkbirina me pêk tînin. Inceş gava em bi xurtî û bi heter li kurdî xwedî derkevin, em dev ji kurdî bernedin, em bi kurdî bixwînin û binivîsin, em karin wê hêla neyar, wê vektora xurt pûç derdixin.

Ji ber wilo jî em bi hêsanî karin bibêjin niha du vektorên paralêl ku dikin qederekê ji me û zimanê me re binivîsin hene: yek jê vektora têkbirina me ye û a din jî a xelaskirina me ye. A têkbirina me bi xurtbûna concorde û a din jî bi meşa gêrikê di me de dixebitin. Em yeko yeko li kurdî vedigerin, lê bi hezaran dev ji kurdî berdidin. Bi vê xurtbûnê, bîst sal tenê besî windabûna me ne.

Em kurd bi piranî û bi taybetî jî di vê derheqê de bes tenê li xwe û hêza xwe dinerin û ji nav rewşan, qeder û pêşerojê bi dilê xwe ji xwe re hildibijêrin. Lê bi bawerîya min divê em berî hemû tiştan xeterên ku demê û pêşdeketinên teknîka demê, pîlan, xefk û kemînên ku dijminan li ber me danîne û hêza dijminan bibînin û redbîra xwe bigirin.

Belê, ez bawer im ji ber wilo jî "Bavo, ka ji min re bixwîne!", banga hemû zarokên kurdan e, banga rewşa dîrokî ya kurdan e, banga hewcedariya me ya neteweyî ye, banga rûmeta parastin û fersenda zimanê kurdî ya herî dawî ye, banga hinek xîret e. Bi qîrîn bangî hemû dê û bavên kurd dike. Heger îro ev bang neçe dê û bavên kurd, sibe dikare gelekî dereng be. Heger zarokên kurdan îro bersiva vê bangê nestînin, sibe ji bo wan gelekî dereng e. Sibe, ji bo çî zaroka ku îro bi ziman û kultura miletên "cîran", Hollywood, Walt Disney, Mc Donalds, Britney Spears, Backstreet Boys tenê mezin dibe, dereng e.

Ma gelo zarokên kurdan li welêt bi kîjan kultur û zimanê kurdan mezin dibin? Na, bi piranî ne piçekî jî. Mixabin hemû bi kultura asimilasyonê mezin dibin. Hejmareke mezin ji wan, hîna berî ku bibin heftsalî, nema kurd in. Wê ji %99-ên zarokên ku îro bersiva banga "Bavo, ka ji min re bixwîne!" nestînin, nema li kurdî û xwendina bi kurdî vegevin. Bixwazin jî wê nikaribin. Ji ber vê yekê çî dê û bavên ku bersiva vê bangê nedin zarokên xwe, destûra ku gava zarokên wan mezin bibin,

nema kurd bin didin wan, rêya ku gava mezin bibin nema kurd bin didin ber wan.

Tirkbûn ne halekî nizm e, lê ji kurdbûnê derketin nizm e. Nizmbûneke ku bi tu kurdan nakeve. Divê tu kes vê yekê bi dilê xwe, neke qedera xwe û me.

Hin dibêjin na bavo êdî xelk li kurdî vedigerin û tu xeter tuneye. Lê bi baweriya min ev yek gelekî şaş e. Heger ên ku vedigerin, vegeyiyayî bûna û ên din jî di cihê xwe de sekinî mabûna, rast bû. Berî bîst salan karîbû rast bûya, lê niha êdî ne wilo ye. Vektora têkbirina me, xurtbûn û hêzeke mezin girtiye.

Tê gotin ku li Diyarbekirê pêncî xwendevanên kovarên kurdî çêbûne, li Kiziltepe sîh kes çêbûne. Baş e, lê ma ên din? Gelo çi guhertin di wan de dibe, gelo wê çi bi wan bibe? Û ya bajarên din? Li wir tune ne, ya jî gelekî hindik in. Ew di ber vektora têkçûnê de ne.

Ji bo Diyarbekir pêncî û ji bo Kiziltepe jî sîh kes hindik in. Ma pêncî û sed çi ne? Heger mirov komela ên ku dîkan berdidin hevdu veke wê di du rojan de pêncî û sed kes lê bicivin. Devera ku kurdî herî bêtir lê xurt e, xwedêgiravî nav kurdên li Swêdê ye. Bawer bin rewşa xwendevanên li Swêdê jî a ên li Diyarbekir qet nê pir çêtir e. Îcarê ka xwestina kurdan a azadbûnê, ka xwestina parastin û vejinandina zimanê kurdî, ka serbilindiya kurdperwerî û hezkirina zimanê kurdî. Ka soza parastina yadigara bav û kalan.

Bi a min, heger em ê bi dilê xwe û bêyî ku em ji ber nizmbûneke wilo şerm bikin dev ji peyva bi kurdî berdîn û destûra mirinê li zimanê kurdî bidin, a baştir, erzantir, ewletir û xwestir ew e ku em dev ji hemû tiştan berdîn û bibin tirk, em dev ji şer û qir qirê berdîn û li mala xwe rûnin, xelkê bi vir û wir de nebin ser kozik û kemînan. Em wî çaxî ne tîn kuştin, ne tîn talankirin û ne jî tîn girtin. Heger em ê sênga xwe bel, dengê xwe gird bikin û wek ku tiştêkî baş bi me bûye bi serbilindî bibêjin "biz asimile olmuşuz" û li rêya vegeyê negerin, em ê li malê û hemû deverên din bi tirkî birepînin peyvê, baştir e ku em dev ji tiştên din jî berdîn, heqê tu kesan li gundî û feqîran tune ye. Bihêlin da ew cotê xwe bikin û bêtirs û xem bijîn. □

**Wek tu li ber pencerekê  
Li darekê binêrî**

**SABAH KARA**

Wek tu li ber pencerekê  
Li darekê binêrî  
Jiyan  
Porê xwe bi bayê de berdaye  
Li vir û wir  
Çi rûpelên  
Çi pelên zer  
Payiz  
Wisa melûl  
Ji ber te buhurî

Tu hê li ber pencerê yî  
Bayekî cemidî  
Li wir digere  
Li wir!  
Li cihê tu tenê heyî  
Li cihê tu tenê heyî!  
Ainayî  
Çi rûpelên sipî  
Çi zivistan  
Tu çavên xwe digrî  
Ji dîtina berfê re çav  
Ne lazim in  
Li cihê tu tenê heyî

Tu hê li wir î  
Carna ro derdikeve  
Kenek dibe  
Hezkirinek  
Şahiyek  
Xwexapandinek  
Carna wisa dibişire  
Bihar bi çavên zarokekî


Tu li ber pencerê yî  
Tu her li ber pencerê yî  
Te li ber xwe neda  
Te zîndan naskirin  
Mirin  
Girîn  
Çiqas girîn!  
Neynûkên te şikiyan  
Lê te li ber xwe neda  
Tu ne mîna herkesî yî  
(Genimê xwe dan hev  
Pû ji te re hitin  
Fêkî, yên wan  
Dar têra te dikirin  
Kaxez!  
Qelem!  
Kelem!)  
Havîn jî ji ber pencerê  
Wisa buhurî

*23.4.2000, Wuppertal-*

*22.11.2000, Düsseldorf*



# Pêwîstiya ramanên rexnegir



ŞEREFXAN CIZÎRÎ

Divê mirov bi çavekî rexnegirî û zanyarî li dîroka civata kurdan baş meyze bike. Li vir mirov ew ê gelekî zelal bibîne ku ramanên li ser civata me, dîrok û hunera me, gelek caran ne ji kîsê me bûye. Kurdan di warê entelektuelî de xwe baş newestandin. Ramanên ku di civata me de îro xwedî hêz in, heta niha bi gelek awayan ji kîsê biyaniyan bûne. Me li ber dahola biyaniyan govend girtiye. Wan raman ji me re afirandine û me jî qîma xwe bi vê yekê aniye. Biyaniyên ku bi sedsalan bûne dagirkerên welatê me, dixwazin ku ji aliyê ramanan de ji me re li daholê xînin... Ji aliyê ramanan de em heta niha, bi rastî gelekî belaş jîyan e. Di vî warî de me heta niha ji serdestan bi awayekî melûlî pîrsa ramanan kiriye. Di warê siyaseta de, di warê edebiyatê û zanyariyê de, di warê îdeolojî de me bi melûlî pars kiriye. Pêşengên kurdan bi dû biyaniyan û dagirkerên welatê xwe de liqata ramanan kirine. Heta niha me aqil û qeweta xwe, ji bo welatê xwe zêde nexebitandiye. Aqilê ku baş neyê xebitandin jî, eşkere ye ku nikare ramanên baş biafirîne.

Di civata me de, bi awayekî giştî, biyaniyên ku dagirkerên welatê me ne, ramanên xwe pêşkêşî me kirine û me jî ev raman dubare kirine. Bi giştî li welatê me pêşveçûn wilo bûye. Di warê akademîk, dîn, siyaseta, edebiyat, perwerdebûn û îde-

olojijê de, erê di gelek waran de, me heta niha wilo kiriye. Ev helwesteke rast an çewt bû? Ev bi rastî nîqaşek din e, lê belê me bêhişmendî an jî bi hişmendî wilo kiriye... Hêzên dagirkeran ramanên xwe bi awayekî rafîne gotine, me jî ramanên wan dubare kirine. Dubarekirina ramanên ku ne ji kîsê mirovan bin jî, weke tê zanîn, bi xwe re nexweşiyên psîkolojîk pêde dikin. Mirovên ku ji aliyê netewayetiya xwe de bîndest bin, hişmendî, kesayetî û ruhên wan jî hevdu tê hilweşandin. Etîka wan ya sosyal û netewî jî hevdu tê çirvirandin. Pîvanên wan serobino dibin û mirov bi xwe jî, dikarin riya xwe di vê pêvajoyê de gelekî zû şaş bikin. Pîsûla xwe wînda bikin. Mirovên wilo dikevin rewşeke patalojîk û bi gelek awayan têne qurmiçandin. Him civata dagirkirî û him jî kesên ku biyanîyên mîrasa xwe ya sosyal û netewî ne, dikevin rewşeke xerab. Ango bi vê yekê re xerabî dibe du qat. Ev rastiyeke zanyarî ye û ne pêwîst e jî ku mirov li vir li ser vê yekê zêde nîqaşan bike. Tenê mirov dikare wilo bibêje; di dîroka kolonyalîzma modern de ev encamê han gelekî hatine nîqaş kirin...

Wexta ku mirov ramanên dagirkerên biyanî dubare dike, wê gavê mirov bi kesayetiya xwe re, bi vî awayê ku me li jor qal kir, dikeve nakokiyên etîk û pratîk. Kesên ku di vê riyê de çewt diramin, di wextekî ne gelekî dûr de dibin biyanîyên xwe û ji rastiyên civata xwe dûr dikevin. Ji xwe û ji kultur û ji zimanê xwe bi dûr dikevin... Bi kurtî, ji aliyê raman û etîkî de ew li serê xwe û li serê derdora xwe dibin bele. Ew dibin bûyereke patalojîk û psîkolojîk...

Ramanên ku di civata kurdan de hene û serdest in, mirov dikare bibêje ku heta niha ne li ser hîm û avaniya xwe ya bi rastî pêşketine. Wek ku me gotibû; kaniyên me yên ramanan bi giştî yên dagirkeran û yên biyanî ne... Mebesta min helbet bi biyanîyan li vê derê serdestên tirk, faris û ereba ne. Saziyên ku di civata me de ramanan diafirînin, hîna di destên wan de ne. Ew bûne weke hûtê ku pêşiya avê li me girtibin, wexta ku li hesabê wan nayê şûr û rimên xwe li me dihejînin. Me tanbar dikin. Me tehdît dikin. Me diricîmînin. Ramanên ku ji derve jî tînan van welatan, pêşî li moxila wan dikevin û dû re berê xwe didin civata kurdan.

Gelek kurd jî di vê navberê de bûne weke bexên ber kêrê, bê deng û melûl dimînin. Helwesteke xurt nagirin yan jî nikarin bigirin, yan jî ji wan nayê ku li himber dijminên xwe, bi seriyekî bilind li ser lingên xwe rawestin. Derfetên jiyaneke serbixwe (ekonomîk) di destên wan de tune. Bazara civata wan di destê dagirkeran de ye. Dagirkeran pêşiya avê li kurdan girtine û naxwazin jî vî derfetî ji destê xwe berdin. Hefsarê kesên ku siyasetê dikin, li Kurdistanê bi awayekî rafînekirî ketiye destên hêzên dagirker. Derdor li me hariye pêçandin. Ji ber wilo jî divê mirovê

kurd, di warê siyasetê de gelekî bi hişmendî û bi hosteyî tevgerê bike... Tenê bi ajî-tasyonan û gotinên telomelo ev doz nikare baş bimeşe... Em nikarin her gav bibê-jin, de ka careke din! Pêşeroja gelê me tenê bi mertequlkên civatan hal nabe. (Di vê tevgerêdanê de ez li ser efsana Sifisos diramim; Sifisos efsaneke Yunaniyan e. Ev efsaneê ji aliyê nivîskarê frensî Albert Camus de weke efsana bêwatebûne hatiye bi-nav kirin... Bi kurtî ev efsane wilo ye; Sifisos li miqabilî Xwedayên yunaniyan sûce-kî mezin dike. Ji ber vê sûcî jî Xwedayên yunaniyan cezayekî mezin didin Sifisos. Cezê wî bi kurtî ev e; Sifisos divê keviyekî gelek mezin, her roj ji binê kaşekî bilind bibe heta serê kêş. Piştî ku Sifisos giha serê kêş, ew divê kevirê xwe ji destê xwe ber-de, ji bo ku kevir careke din bigindire binê kêş. Di hemû jiyana xwe de ew ê Sifisos vê kartî ducar bike... Kevirê xwe bibe serê kêş û dîsa berde binê kêş. Cezayê wî ev e û jiyana xwe jî wilo derbas dike!)

Dagirkeran her gav daxwaz kirine ku form û naverokekê li gora xwe bidin rama-nên ku di rojêva me ya felsefî û siyasî de hene. Ew in ên ku civatan û ramanan, li gora berjewendiyên xwe yê ekonomîk û pîvanên xwe yê etîkî çarçikê dikin. Em jî di nav vê çarçîka dagirkeran de diçin û tên... kurd bi vê awayê ku min li jor qal kir, ketine xefka dagirkerên welatê xwe. Kewên ribatê ku bê qefes bûn, îcar ketine de-hfa dagirkerên welatê xwe. Yan bi hişmendî yan jî bi bêhişmendî...

Di encama vê rewşa malkambax de, sergêjekiyeke ramanî di civata me de çê bû-ye. Ev yeka han her ku diçe bêtir girikî dibe. Danûstandin tevlihev dibin, nîsk, ge-nim û ceh li bin guhê hevdu dikevin. Em kurd, ji ber vê tevliheviya han îcar nema hevdu baş fêhm dikin. Em bi hevdu dikevin. Ji ber vê yekê jî, kurd weke neteweyekî, îcar ber bi rewşeke albûnê de bi lez gavan diavêjin... Xiyala xwe baş bidin civata me; tam û naverok di gotinan de nemaye. Mirovên kurd ji aliyên raman û etîkê de ji hevdu ketine. Zimanê wan çort bûye. Reş, îcar nema reş e. Kurdistan îcar nema Kurdistan e. Pirteqal îcar bûye hinar. Tîrî bûye bilalûk, ker bûne hesp... Naveroka hinek gotinan weke gotina aşî, şer, demokrasî, wekhevî, birakujî, sêkurtî, teslîm-bûn, qehremantî, netewayetî, ziman, çand, dijminayetî, siyaset, ûhwê. hatiye vala-kirin û li şûna wan gotinan jî, îcar tiştên telomelo têne gotin. Ziman îcar nema we-ke berê objektîv e, gelek kes dixwazin ji xwe re zimanekî nû ava bikin û naveroka gotinan jî, ji nû de li gora daxwazî û berjewendiyên xwe dagirin. Ev jî babeteke xwexapandina nû ye. Hêdî hêdî di civata me de zimanekî nû, ango zimanekî Or-wellkî pêde dibe. Ango aşî dibe şer, koletî dibe azadî, kurd dibin tirk, çavsorî di-be demokrasî...

Aştîxwazî li welatê me, di vê zimanê nû de bûye birakujî û bi hevdu re şer kirin.

Serok bûne pêxemberê wexta xwe, rêxistinên wan jî bûne weke terîqat û ji gel re li erbanan dixînin. Di gotinên serokan de li kerametên digerin... Wexta xwe bi wilo derbas dikin, birînên xwe wilo dikewînin, êşa dilê xwe dixwazin wilo kêr bikin... Li kuderê, kengî, çima û çawa hinek gotin tên bikaranîn, îcar ji bo gelek kesan baş ne zelal e. Kî çî dibêje û çî dike jê re dimîne. Di vê dema teknolojiyê de îcar hesab û kitab nema tên bikaranîn. Di siyasatê de pîrskirin nemaye. Li ba entelektuelan raman li moxilan xistin nemaye. Di gotûbêjan de lêpirsîn nemaye. Di devjengan de mehkemekirina ramanan nemaye. Di civata me de tenê erêkirina ramanên çarçîkbûye heye. Ev jî bi rastî mirovan fahmkor dike...

Agahdariya civatê tenê bûye yekalî. Serokên me dibêjin û em jî bêqeyd û şert eynî weke wan dikin. Di civata kurdan de qewet, îro ketiyê şûna rastiye. Maneyên gotinên me bûne weke yên mixalîfên (dagirkerên) me, pîvanên me bûne weke yên wan, pêşneyarên me bûne weke yên wan, di rastiya xwe de îcar em bûne eynî weke wan hêzên ku welatê me bi darê zorê dagir kirine. Ew dewletên ku welatê me perçe kiribûn, hebûnên me par ve kiribûn, malên me talan kiribûn, şerefa gelê kurd kiribûn binê cizmên xwe û xwestibûn ku kurdan ji dîrokê hilînin... Em û ew îcar hêdî hêdî dibin weke hevdu... Ma malkambaxiya helî mezin ne ev e? Ma heta niha we li kudere dîtiye ku mirov ji aliyê etîk, siyasî û felsefî de bişibin dijmînên xwe yên dagirker? Ma gelo ev ne tiştêkî beloq e? Ma ne pêwîst e ku em li ser wan bûyerên balkeş îcar baş, rast û kûr biramin? Ma em ê îcar li benda kê bisekinin? Kesên ku ewê di pêşeroja me de bîr alîkariya me, bi rastî tune ne. Ew ên ku em li benda wan in jî ew ê tu cara nayên hewara me. Lê di rastiya me ya civatî de jî, ew kesên ku em li benda wan in, ew kes em bi xwe ne! Em ji hemû aliyan de li bendamayê li bendemaya ne! Xelk li benda me ye em jî li benda hineka ne!..

Entelektuel, akademîsyen û siyasatmedarên kurd bi lez divê îro xwe ji dagirkirina ku biyaniyan di hişmendiya me de pêkaniye xelas bikin. Divê bi gotineke din em bi xwe re îcar şerê îdeolojîkî û etîkî bikin. Têbikoşin ku xwe ji gemara dagirkeran paqij bikin. Xwe li gora rastiya welatê xwe tekûz bikin û helwestên xwe yên etîkî, siyasî û felsefî li gora vê rastiye biafirînin. Bi rastî, ma gelo ezê çî bikim ji etîk û kultura dagirkeran? Ma çî wan î baş ji bo me heye ku em dilê xwe bibijînin wan û bibin weke evîndarekî naşî û melûl li miqabîlî evîndara xwe? Ma ne evîndara me Kurdistan bû lo? Heta ku em li ser rastiyan welatê xwe ramanên baş û pêwîst neafirînin, ew ê aqîlê me her gav ji kîsê dagirkeran be. Ma li kudera cîhanê mirovan dîtiye ku têkoşîn, ronahî û ronansa neteweyekî li kultura dagirkerên welatê xwe vegeriya ye? Ma we li kuderê bihîstiyê ku şiyarbûna netewiya gelekî bindest, diçe li

ser livînên dijminên xwe radikeve lo? Ma ku kurd weke netewe ne rehet bin ew ê çî bikim ji textên zêrîn? Di vê navberê de jî hinek mirovên nivbiaqil û kawik dikarin bibêjin; livînên dijminan ji periyên teyrik û tîlûran çêbûne, textên razana wan ji zêr çêbûne, xewa li ser wan gelekî xweş e! Wîlo jî dikare bê gotin, çawa be ew jî dîtinek e. Lê belê divê mirov baş bizanibe ku di bin van livînên han de bombeyên asîmûlasyonê kurdan hatine raxistin, di vir de jî em û wijdanê xwe bi hevdu re dimînin.

Ji bo ku mirov karibe hin ramanên pêwîst ji bo civata xwe biafirîne, divê ji aliyê semantîkê de mirov hin gotinên bingehîn ji nû de piçekî veke; mesele gotina rastî. Dibêjin ku heta rastî li sola xwe geriya, derew ji Bexdayê gihane heta Stanbolê! Weke tê zanîn gelek gotin bi hevdu ve girêdayî ne û di tevgerêdanan de bi hevdu re jî dibin xwedî wate. Rastî, zanyarî, duristî, bawerî, mantiq, felsefe, zanebûn, dîrok, civat, ûhw, bêî problem nikanin ji hevdu werin veqetandin. Yek bi yekê ve girêdayî ye. Ew gotinên han bi hevdu re dibin xwedî wateyên kamilbûyî. Di civatên weke ya me de ku tê de dagirker hene, rastî û rastî gotin dibe xwediyê taybetiyên pir bingehîn. Ew dibe sixletekî mirovantiyê. Weke ku baş xuya dike, rastî gotin li dijî neheqiyên helwestgirtinê e. Destpêkek e. Li welatê me divê rastî îro bi dengêkî bilind were gotin, divê rastî were parastin, divê rastî were zelalkirin û ji bo mirovên têkoşer ku li dijî dagirkeran xebatan dikin, ew her gav bibê weke pîvaneke etîkî.

Ez baş dizanim ku li ser rastiye gelek ramanên cihê cihê hene. Rastî dikare li hinek deveran were veşartin, li gora hinek helwestên îdeolojîkî were nixumandin, bi gelek formên cihê cihê derkeve hemberî mirovan û li ser hîmên xwe yê rastî raneweste. Ew dikare bi mirovan re tolaziyan bike. Weke Şivanşîxalînkê mirovan bi xapîne. Bike evîndarê xwe. Lê belê xîsûsiyeteke rastiye heye ku mirov çilo bikin jî, tu cara ew nikanin wê nebedî bikin; rastî jî bo hemû kesan amade ye ku were keşf kirin, ew her gav di civat û dîrokê de heye, hemû kes dikarin li ser rastiya dîrokî û civakî bibin xwedî dîtin û helwest. Ji ber ku rastî li ser rûdayên heyî bi awayekî objektîv ava dibe, li vê derê rîya rastiye jî hemû kesan re vekiriye. Di navbena rastiye û rûdayan de danûstandineke pir xurt heye, wexta ku ramanên mirovan û rûdayan hevdu timam kirin, li hevdu siwar bûn, wê çaxê mirov dikare qala rastiye bike. Ango rastî ne di ramanan de ye, lê belê ramanên rast hene. Rastî di civakê de heye, di dîrokê de heye û di xwezayê de heye. Rastî tiştêkî ku li derveyî mirovan radiweste. Divê mirov karibe bi rastiya welatê xwe re li hevdu bibane.

## Ramanên rast çî ne?

Ramanên rast ew raman in ku li ser objeya xwe agahdariyên dewlemend bide mirovan. Mînak; heger ku mirov ji çêlekê re bibêje ev hesp e, mirov rastiye nabêje. Heger ku mirov ji xalê xwe re bibêje ew xaltîka min e, mirov rastiye nabêje. Ji ber ku gotina xaltîkê ji bo mirovên mê tê bikaranîn û gotina xal jî ji bo mirovên nêr tê bikaranîn. Rastiya sosyal û biyolojîk wilo ye. Wexta ku raman di derbara objeya xwe de agahdariyên şaş bidin, wê gavê nerastî li miqabîlî mirovan radiweste. Hişmendî li ser binyatekî şaş pêş dikeve. Nerastî jî di bingeheş xwe de derew e û xwezapandin e.

Îro ji aliyê hinek kesên beradayî de hinek raman li ser dîrok û zimanê kurdî tînin gotin. "Pisporên" tirkên li ser zimanê kurdî hinek ramanên tînin zimên û dibêjin; zimanê kurdî ne ziman e! Zimanê kurdî devokeke tirkî ye!... Ev jî weke ku tê zanîn hinek babetên ramana ne, lê belê piçîkek rastî jî di wan de tune. Ji ber vê yekê jî, tenê ramandin nebes e, ramandin divê rast be jî, ji bo ku qîmeta wê hebe, ji bo ku raman baş çêhe xwe bigire, ji bo ku raman rê pêş mirovan bike, divê ramanên rastî li ser objeyên xwe sadiq bimînin. Ramanên ku bi objeya xwe re ne sadiq bin, ew raman yan ji bo xzapandina hinek mirovan tînin gotin, yan ji ber bêhişmendîya mirovan tînin gotin, yan jî ji ber netêrkirina mirovan dikare werin gotin. Wexta ku raman bi zanîn objeya xwe bi derewa bide naskirin, wê gavê duristî li holê namîne. Ma dîroka ku tenê ji bo propagandaya siyasî tê bikaranîn çî qasî bi objeya xwe re dikare sadiq bimîne? Dibêjin ku tirkên û kurdan li Çanakaleyê bi hev re li dijî dijminan şer kiribûn. Ma ev ne dereweke mezin e? Ma ne kurd ji mecbûrî çûbûn Çanakaleyê? Ma ne kurdan leşkeriya tirkên dikir? Û leşker jî li hemû deverên cihanê ji mecbûrî şer dikin?

Dîroka gelê kurd hatiye çirvirandin, hatiye çikuskirin û berevajî bûye. Dîroka me weke dîroka kevneperestan tê nîşandan. Kurd şivan û gavan in, ew jî kizir û wezîr in! Kurdan di dîrokê de dewlet ava nekirine, dibêjin! Kurdan bi hemû awayan biçûk dikin... Lê em dizanin ku dagirkeran dîroka me bi vî awayî bi kurdan jî daye nasandin û bi vê yekê jî ew dixwazin dagirkeriya xwe li welatê me berdewam bikin. Bandora xwe li ser me deyin. Ji bo wilo jî ew bûne pêşverû û em jî kirine paşverû. Heger Mistefa Kemalê wan pêşverû be, heger Mistefa Kemalê wan demokrat be, we gavê Kurdistan jî welatekî li Efrîqa ye! Wexta ku ev eşqa Mistefa Kemal ji dil be jî, mirov dikare heta derecekê vê helwesta han piçêkî fêm bike. Lê ma ku eşqa li miqabîlî serokê dagirkeran ku li ba hinek kesên heye ji tirsê be, ji siyaseta çewt be, ji ber şefîya bi tirkên re be, wê gave divê mirov bi awayekî durist

armancên xwe yê siyast jî eşkere bike. Heger mirov dilê xwe bibijîne ramûsanên dûvpişkan, wê gavê divê mirov haziriya xwe ya jehrê jî bike. Ji ber ku jehr mirovan dike, mirovan felc dike, mirovan kelexî dike û dixê bin erdê...

Armanc di vê mebestê de ne ramanên rastî li ser dîroka kurdan ne, ne ramanên rastî li ser demokrasiyê ne, ne ramanên rastî li ser biratiyê ne, ne ramanên bi rastî li ser aştiyê ne û hwd. Lê belê ev ramanên beradayî li gora daxwazî û berjewendiyên dagirkeran hatine formule kirin. Ji ber wilo jî dagirker bédeng in. Hin ji kurdan jî, ji wan re ji dil li çepikan dixînin. Lê bi vî awayî jî xwe û doza gelê kurd gelekî biçûk dixînin. Bi vî awayî xwe dixwazin bi dagirkeran şêrîn bikin, şelafiyên dikin, he nekên xwe bi bav û kalên xwe dikin û xwe bi dagirkerên zorkar re dikin şirkên împaratoriya derewan û pêşverûtiya wan î ku tije kurdkujî ye...

Gotina aştiyê jî di vê dema nû de, di devê hinek kesan de bûye weke benîşt. Herkes di vê demê de bûye aştxwaz. Gurên qert û roviyên fenek jî bûne aştxwaz. Gotina aştiyê li ser zimanê hemû kesan e. Lê di rastiya civatî de aştxwazên îro, xwe bi hemû awayan ji bo şerê qirkirina kurdan amade dikin. Civatê miltarîze dikin. Xwe bi çek dikin. Bi gotinên şerkeran çavsor aştiya xwe tînin zimên, doza teslîmbûne li kurdan dikin. Lê belê ji bîra dikin ku di aştiyek rast de teslîmbûn tune ye, di aştiyê de lihevdukirin heye. Hevdu qebûl kirin heye. Mafên hevdu naskirinê heye. Tolerans û azadiya ramanê heye. Lê mixabin ji bo gelê kurd îro ev derfet hîna tune ne. Rewşa malkambaxî ku li Kurdistanê heye û zordariya ku li ser gelê kurd heye, hêzên dagirker weke aştiyê xwe bi nav dikin...

Mirov dikare di vî warî de gelek mînakên bide. Lê bi ya min hewce nake. Em îro hewcedarê ramanên rast in ku ew karibin ev rewşa me ya girikî zelal bikin. Me ji vê rewşa girikî xelas bikin. Entelektuelên kurdan divê karibin ji bo civata xwe kûr biramin. Xwe ji bandora ramanên dagirkeran azad bikin. Ew di vê helwesta xwe ya etîkî de bi dilekî paqij li welatê xwe vegerin, rastiya welatê xwe ji nû ve fêm bikin û bi dilekî germ jî li himberî kultura dagirkeran bisekinin. Ma qey ev gelekî daxwaziyek zêde ye? Civata me ji aliyê ramanên rastî de, gelekî şepirze ye. Sazî û entelektuelên me ramanên ku ji bo civata me pêwîst in neafirînin. Nikarin wan bi afirînin. Zexeliyeke gelek mezin di civata me de heye û wê jî baş kok daye. Di warê siyasetê de, di warê edebiyatê de, di warê dîroka me û tevgerên sosyal de, di warê kultur û zimanê me de, me hîna jî ramanên bi rêk û pêk neafirandine. Konseptên me ji bo civata me hîn zelal nebûye. Em ji aliyê program de ne baş bi hevdu ketine. Em hîn ne tekûz in... Lê em ji aliyê bihevşerkerinê gelekî xurt in. Ji aliyê ku em hevdu tawanbar bikin em gelekî zîrek in. Ji aliyê ku em kêmasiyên xwe bixin stûwê hevalên

xwe, dîsa em gelekî jîr in. Ji bo ku em hevdu biçûçîk bikin û bêbextiyan di stûwê hevdu xînin, em gelek dek û dolaban dizivîrînin. Ji aliyekî de gelek kurd bûne weke şagirtên dagirkeran. Şagirt gelek caran mamostan jî derbas dikin. Di vî warê hanê de em ji dagirkerên welatê xwe gelek caran bêwijdantir tevdigerin...

### **Gelo ev yeka hanê çima wilo ye?**

Yek: Berî hemû tiştî welatperwerî li welatê me kême.

Kesên ku di siyaseta û gotinên xwe de qala weletperweriyê dikin, di jiyana û praktîka xwe de welatperweriyê ji bîra dikin. Welatperwerî di vê tevgirêdanê de tenê dibe weke alav ji bo propaganda siyasî. Lê welatperweriyekê ji dil weke ku tê zanîn, divê berî her tiştî bibe babetek ji jiyana mirovan. Ango bi rastî divê mirov hez ji kultur, ziman, gel û welatê xwe bike.

Dudu: Em nikarin zora dijminên xwe bibin...

Gotineke kurdî heye; dibêjin nikare bi kerê dibeze kurtên! Bi rastî me kurdan kurtanê keran ji hevdu çirvirandiye. Ji ber ku em nikarin zora kerên boz bibin, îcar em bi kurtanan daketine. Em bi kêf bi hevdu dadikevin, hêza xwe li miqabilî hevdu bi kar tînin, fortan li hevdu dikin, ên ku pêşmergan û gerîlan bi hevdu didine kuştin, li miqabilî dijminên xwe gelekî reben tevgerê dikin. Ên ku di civata kurdan de weke kewên ribat xwe didin nîşandan, li miqabilî dagirkeran dibin weke pepûkê. Li xwe dixin... Ên ku li miqabilî dagirkeran doza demokrasî û azadiyê dikin, di nava kurdan de guh nadin ramanên demokrasî û azadiyê...

Sisê: Ramanên kûr ji bo çareserkirina problemên welatê me nehatine afirandin. Rewşenbîr, siyasatmedar, xwenda û hunermendên me, ji gelê xwe dûr dijîn. Mebesta min bi dûrbûnê ne dûrbûna fizîkî ye, lê belê dûrbûneke etîkî û felsefî ye. Ev tiştên ku em li vir qal dikin û tînin ziman, bêguman ji ber hinek tiştan e; pêşengên kurdan, gelê kurd biçûçîk dibînin. Xwe di ser wan re dibînin. Dibêjin ku em çawa daholê lêxin ew ê gelê kurd wilo govendê bigire. Carna bi rastî wilo dibe, lê hemû caran nikare wilo be... Ev kes di derbarê gelê kurd de tije kompleks in. Bi berçavka dagirkeran li gelê xwe dinerin. Çawa dagirkeran kurdan weke lipaşmayî, hov, nexwendê, ne medenî dane nîşandan, gelek xwenda û pêşengên kurdan jî wilo li civata xwe temaşê kirine. Kurd gelek caran, ji bo wan xwenda û pêşengên weritî weke alavê siyaseta hatine pejirandin. Gelê kurd, li derveyî biryar û programên siyasî dimîne.

Rastiyek di civata me de heye; ev pêşeng û xwendayên han, ku ji aliyê kurdayeti-



ya xwe de weritî ne, heta niha serkêşiya siyaseta welatê me dikirin. Ango li ser navê kurdan siyaseta dikirin, ne bi kurdan re siyaseta dikirin. Gelê kurd tenê ji bo wan weke alava siyaseta bû. Divê ev rastiya dîrokê gelek caran were dubarekirin. Wa ne li gora qîmet û etîka kurdan siyaseta kirine, ne li gora berjewendiyên gel program nivîsandine û ne li gora hişmendiyeke modern tevgeriyane, lê belê tevgerên me yê siyasî û pêşengên civata me, ji bo civata kurdan ramanên telomelo ji xwe re kirine program. Ev programên ha jî bi gelek awayan biyanîyên civata me bûn...

Çar: Li ba kurdan bawarî ji zanyariyê xurtir e. Kurdên ku siyaseta dikin bi zimanekî dîndarî li bûyerên siyasî dinerin. Li şûna zanebûnê, bawarî rê nîşanî mirovên kurdên siyasî dide. Mirov dikare bibêje ku bawariya kurdan qewmî e lê belê zanebûna wan kêma e. Li şûna realîzmeke zanyarî kurd giraniyê didin xeyalên xwe. Li şûna ku ew aqilê xwe bixebitînin, bi tevayî ew hîsî tevdişerin. Hîs û aqil li ba kurdan hevdu timam nakin. Bi zimanekî zanyarî mirov dikare ji bo vê rewşa wilo bibêje ku li şûna felsefeyêke materyalistî, rasyonel û radîkal, em giranî didin fideîzmê, ango em hemû tiştên xwe bi termînolojiya bawariyê ve girê didin...

Ez bi kurtî dixwazim li vir bibêjim, ku gelê kurd û entelektuelên xwe divê ji nû ve li civat û dîroka xwe veşerin. Li civat, etîk û dîroka xwe bibanin, bi xwe re li hevdu bikin û li ser bingeheke rastî kodên xwe yê netewî û sosyal vekin. Bi felsefeyek radîkal bixwazin rastiyan civata kurdan fêm bikin û ramanên pêwîst ji bo civata xwe biafirînin. Ji xwe re xetêke felsefa siyaseta ji bo problemên welatê xwe ava bikin û vê xetê bikin weke pisûlayêke netewî û sosyal. Divê berî her tiştî em riyêke tebût ji xwe re bibînin. Û divê pîraniya kurdan karibin vê riyê bidin ber xwe...

Helbet armanc di vir de ne dijminayetiya gelên cîran e, lê belê berî her tiştî xwe û doza xwe baş naskirin e. Em li miqabîlî dagirkeriyê têkoşînê didin, ew pêwîstiyêke ku divê ji bo kurdan baş zelal bibê. Lê belê divê mirov dîsa baş zanibe ku xebata me ne li miqabîlî gelê cîran hatiye lidarxistin. Em li dijî dagirkeriyê û hêzên dagirkeran in. Sîstema dagirkeriyê him gelê kurd û him jî kodkarên gelê serdest diçewsin e. Ma polis û leşkerên serdestan tade li herdu gelan jî nakin? Ev yekê ha divê baş were zelal kirin. Bi dengêkî bilind divê ev rastî bê gotin. Em di vî warî de divê ramanên ku pêwîst in biafirînin. Li himberî dagirkeriya welatê xwe divê em rawestandîneke etîkî û entelektuelî organîze bikin. Em weke gelekî ku îro li vê cîhanê dijîn, divê karibin bi serbilindî doza hemû mafên xwe yê mirovî, kulturî, siyasî û aborî bikin. Ma gelo ew daxwazî bi rastî tiştêkî ji bo gelê kurd zêde ye? Helbet na!

Di dawî de li vir divê mirov tiştêkî baş zelal bike. Ev ramanên ku ez li vir tînim ziman bi giştî ne li dijî siyaseta ne. Ez rexna berî her tiştî li siyaseta şaş û birakujî-

yê dixwazim bigirim. Ez ji hemû tiştan bêtir, dixwazim rexnan li zexeliya siyasî û bêdengiya etîkî bigirim. Ez baş dizanim ku gelê kurd hewcedarê siyaseteke durist e û ev duristî jî divê hêz û etîka xwe ji welatperweriya kurdan bigire. Helbet di vê revgirêdanê de tenê welatperwerî jî ne bes e. Ev welatperweriya ku em li vir qal dikin divê bi siyaseteke sosyalîstî re were hûnandin û şikil û şemala pratîka welatê me bigire. Sosyalîzm li ser xaka welatê me divê bibişkive. Rehên xwe ji kûranî û rastiya civata kurdan bigire... Divê ji bo hûnandineke wilo Marksîstên kurdan îcar biramin û li ser vî bingehî bixwazin welatê xwe rizgar bikin. Di vî warî de divê ramanên me ji kîstî me bin. Dema liqata ramanên biyanîyên dagirker û çepên serdestan yê ku weritîne îcar xelas bûye. Kurd divê birnên xwe bi destê xwe bikewînin, xezîna xwe ya ramanî bi destê xwe ava bikin, qîmet û ramanên ku ewê li dû bimeşin baş li bêjîngan xînin û ji hevdu re soz bidin: Berî ku em tîfîngan berdin hevdu divê em sed carî biramin, berî ku em kurdan bikujin divê em sed carî biramin, berî ku em ji kurdan re bibêjin sîxur û cahş divê em sed carî biramin, berî ku em rêxistineke kurdan weke dijmin pêşkêşî raya kurdan bikin divê em sed carî biramin, berî ku em hinek ramanan ji xwe re bikin îdeolojî divê em dîsa sed carî wan li bêjîngan xînin... Rastiya civatî û duristiya entelektûelî divê bibe qubleya kurdên welatperwer, lîberal û yê Marksîst... Bi kurtî divê em pêşî baş biramin û dû re jî kirariyên xwe li dar bixin, ne ku em pêşî kirariyan lidarxin û dû re jî biramin. Weke ku bav û kalên me di vî warî de baş gotine; heger te girt bermede, heger te berda jî bi dû nekeve. Ez jî dibêjim; heger te kir lê baş xwedî derkeve, heger tu ê lê xwedî dernekeve jî qet neke. Ango kirin û gotin li ba kurdên siyasî divê li hevdu bibane û hevdu timam bikin, ji bo ku tama siyasetê li welatê me xweş bibe... □

## Tu neyê jî ez li wir im

### QYA MAZÎ

Di demeke şaş de  
Tunebûna te li serê min xist û çû  
Bi destpêkirina payîzê re  
Ku qul dibin ji zîpikê pelên zerguzê  
Dîsa wê kovanî toreyê xwe bişopîne  
Û ezê dîsa baranê bipê.  
Dilê min î şaxê lablabkê  
Wê bi êşan re li hevdu bigere  
Li odayên ku nizanin xew çiyê  
Li şûna ken  
Wê dixana cixareyê min bifetisîne  
Û ezê dîsa şopa dixanê bipê.  
Gelo wê hîn bibe zimanê min î bear  
Di dembuhêrkên bêyî te de  
Tu zanî min qet tahm nekiribû tenêtî  
Û bayê şibakan qet ez wiha xemgîn nekiribûm  
Te jî  
Qet li min hoveneda  
Û guhdarî tenêtiya min nekir  
Te fêhm nekir ku em nikarin cihê bijîn  
Her tim tore û tirsê hov  
Qurincik li te didan  
di qozikên xalî de  
Ezê dîsa qozikên xalî bipê.  
Ji tirsan me dibixweşî tahm nekir  
Heta dema sitêrik li rûyên te biriqîn  
Te digot qey  
Bersiva pirsên bê encam didan  
Lêvên te  
Ezê dîsa şopa çavên te bipê.  
Heke tu vê helbestê bixwînî  
Û fêhm bikî ku  
Hertiştî min vedibêjin

Rêzikên tije bersiv  
Tu rûmeta wan nizanibî jî  
Bi rûmet in ji bo min  
Dîsa ez û helbesta xwe emê te bipên.  
Lê ez ne bêbext im henike  
Way dîsa payîz hariye  
Tu zanî ez dîsa tîm wê derê  
Û dîsa kul dibin çavên min  
Ji toza kulîlkên diçin  
Îro ez dîsa payîza paşîn dipê  
Dîsa şev dirêj in... wey li min  
Ji çîrokên ber dergûşê re.  
Dîsa ez tîm wê derê  
Wî warî...  
Şopa te dipê dîsa  
Bi bêhna takên keziyê  
Kezî kur bûbû li wê derê  
qursik qursikî  
Kezî bêhna min dipê  
Hawîrdor bêhna te dipê  
Li ser pelê wê zerguzê  
Dîsa kur dimeyziîne mejî  
Kur dibihîze dengê te  
Kuur...  
Dîsa guhdarî ba ye guh  
Bayê dengê te dipê  
bê navber  
dîsa lal im li wê derê  
dil dipeyîve ji dêvila min  
dil dipê ji dilên zerîn  
dîsa divêm baran be  
bi teqîna birûskê re  
dîsa divêm tu bî  
bi çipikên girover re  
tu neyê jî ez li wir im  
li wir  
çipikê baranê dipê.

# Berfa hevrişim

EVDILE KOÇER

Nizanîbû wê çî bikira. Şaş û mat bûbû. Tenê mirineke şepirze dihat bîra wî. Dû re hêrs bû, li dor xwe re zivirî û belasebep tif kir. Ji bêçareyî çend gavên din meşîya û li ber kevirê mezînin sekinî. Pêşî bi destê xwe, dû re pê gav û serê pêlava xwe li ber vî kevirê tûjik, di nava berfê de, mîna tîrbeke axspî, kortaleke biçûk ji xwe re kola. Ji bo ku xwe ji ba û bagera berfa fiqspî biparêze, tenê ev hatibû bîra wî û ew jî kiribû. Hevsarê hespê xwe bi delalî li navtenga xwe girêda û weke nîvmirîyekî, xwe berda nav kortalê. Eynî mîna leşkerekî têkçûyî di nav kortalê de, pala xwe da kevirê mezînin. Xalidê Etar, bona ku çend kîlo çeçulat, hinek şekerê qulo qulo, pênc şeş sandok loqumên sorik û şexîslamên ku mirov digot ji dikanên bihûştê hatine, çend mêtro çiftexazê spî (hineka bo kefenê xwe jî diemiland), terhiyên hevrişim û qumaşên rengîn bifroşe ev çar roj bûn gund bi gund digeriya. Bona ku du sê terhiyên din jî bifroşe jin û pîrekan, qirik li xwe diqetand. Dema ku hemû alavên xwe firotibû, bi kêfxweş siwarî hespê xwe bûbû û ber bi gundê xwe ve meşîya bû. Lê tepika berfê û ba û bahozê wê, di nav newaleke kûr re wekî melkemotekî rûspî, wî zefî kiribû. Xalid, di nav kortala berfê de qapûtê xwe yê dirêj li serê xwe pêça û pê germahîya hilma xwe bi dilekî têkçûyî destê xwe miz da. Çawa ku di nav kozika şer de be, piştî xwe da kevirê gewrik û bi çavên hûr li kûrahîya asîmana temaşê kir. Heta demekê jî bi aramîya xwe ve li ezmanê bêserî nihêrî. Lê ji bilî çend ewrên reş û parçeyên berfê ên ku bi ser serê wî re dibariyan, tu tişt bo xilasbûna xwe nedît. Ew parçên berfê, mirov digot qey hinek li ser serê wî re dibarînin. Teyroka ku carna di nav bagerê re dipekiya, mîna bizmarên tûj dihat li rûyê wî diket. Bi paqîşkirina ruyê xwe re, çend fikrên bêçare wek van libên teyroka zû hat bîrê. Heta çend deqa jî li neçartîya xwe, çerxa qederê, dawîya jîyanek têrtîjî û rêwîtiya li ber mirinê ponijî. Di nav hilma xwe de carina bêhna mirinê jî dikir. Dû re jina wî

ya bêzarok, mal û milkê ku jê xêr nedîtibû, zarokên ku bona şekirekî didan dî, gundîyên ku deynê wî li ser wan bûn û pênc şeş tiştên din hate bîrê. Çawa ku mirov bêje her tişt beredayî ye, çavê xwe girt û xweziya xwe daqurtand.

Berf, wek yarek rûspî xwe di nav hemêza deşt û çîyan re raxistibû û mîna barekî jî dibarîya li ser kurtanê hespê heşinboz. Fikrên Xalidê Etar bi hatina bayê xurt re car cara diguherin. Berfa ku mirov digot qey bona mirina wî dibare, vê newala kûr û dirêj jê re xistibû goristanek. Çawa ku mirovek li benda nefesa xwe ya dawî be, welê sekinîbû û li ber barîna berfê bêçare bû.

Bagera ku ji nişka ve li ser berfê xuya dikir, dişibîya rûpûşa mirinê. Rûyê mirinê tu carî ewqas nêzikî Xalid nebûbû. Rehma dilê wî bi vê tofan û xezeba siruştê re zêdetir bûbû. Ew zarokên ku rojekê li ber pez bazdabûn û bona şekirekî di vê newalê de rêya wî girtibûn, di nav vê berfê de bûbûn dîmenekî spî û wekî xewneke kevn dihat bîrê. Berfa ku carina bi bayê xurt re dibû gilolîk, çawa ku ew zarok li ser berfê bigindirîn û wî ji vê kortala mirinê xilas bikin, rûyê wî dibişirand. Ew gilolîkên berfê yên ku di hişê wî de dibûn zarokên gilover, wek xarên kevîran diketin kortala wî. Dîmenê zarokan ji ber çavê wî tu carî nedîçûn. Zarokên gund, di hiş û mejîyê wî de bûbûn hêlînek germ. Lêva wî çawa ku bibêje, "Xwezî, min tu carî dilê wan zarokan nehiştibûya; Xwezî, min hemû şekir, loqum û biskewêt li ber dilê wan rêz bikira; Xwezî, min tu carî nehiştibûya ku ji min re bibêjin: Xalidê tima, Etarê tima..." Xwezîyên ku dereng mabûn weke çîrokên berê, di nav libên berfê re libo lib wînda dibûn. Berfa ku mirina wî nêzîktir dikir, wek fikrên wî yên neçar bi hemû hêza xwe ve dom dikir. Berfa spî, wek mirovekî bêbav keysa xwe lê anîbû û her deqe kortal tejtîr dikir. Berfa ku Xalid di nav kortalê de piştî xwe dabûyê, wek terhiyên hevrişim nerm, lê mîna kefenekî jî her deqe erjengtir dibû. Taqeta Xalidê Etar, di nav kortalê de dibû wek mûyekî zirav û hêdî hêdî sist bibû. Qerasê mêra tu carî bawer nedikir ku mirin, wê di newaleke welê de wî zêft bike.

Dirûvê deşt û çîya û hema bêje ezmanan jî bûbû rengê berfê. Darên bilind, girên kin û dirêj weke bûkên zivistanê bi berfê hatibûn xemilandin, çend kom rêzên daran jî dişibîyan tehtên şikestî. Spîbûna berfê wek rengê dojhê, dijarîya xwe her dem zêdetir dikir. Berfa ku qet nedisekinî, hema bêje kortal tijî kiribû. Serê Xalidê Etar, di nav vê kortalê de dişibîya qurmê darekê. Mirin, wek hevalekî kevn di nav berfê re hebûna xwe nişanê wî dikir. Mad û mirûz û nêrîn û tevgerên wî, weke yê mirîyan çilmisî bû, tilîkên wî jî êdî nedilivîyan. Ger ku hespê car carna ew nekişandibûya, wê di nav berfê de bûbûya meytekî bêxwedî. Çiqas ku hesp ew bikişanda, dihat ser hişê xwe û bê bawer xwe di nav kortalê de didît. Ew hevsar, wek zincîra li

nav jîyan û mirinê, li navtenga Xalid û bi stûyê hespê ve hatibû girêdan. Ev hespê ku di hemû pêşbazîyên herêmê de bi çalakbûn û jêhatbûna xwe ve yekem dihat, te digot qey bi zanyarî ew dikişand û ji mirinê xilas dikir. Ev hespê ku hineka digot dişibe heştirekê, di vê roja zor de jî wek rêhevalekî siwarê xwe nas dikir û lê xwedî derdiket. Hespê şînoz, ji sermayê zêdetir birçî bûbû. Ji xwe ev rojek bû dimeşîyan û kaya wê jî xilas bûbû. Ev hespê ku dikaribû gîyayê mêrgekê xilas bike, bona qetek gîya serê xwe dixist nav berfê. Hesp, eger ku ji birçibûnê xwe nelivanda, wê di nav berfê de bibûya girekî spî. Pirça hespê, weke kezîyên keçeke spehî li ser stû re daketibûn jêr, lê zerbûna pirçê di nav spîbûna berfê de winda bûbû. Kurtanê jihevketî, hevsarê qetiyayî, nalê kevin û çewalên pînekirî te digot qey timabûna Xalid nîşan dida. Mazûyên ku Xalid ji bedêla loqum û biskewêtan standibû, li ser kurtanê hespê bi ava berfê re girantir bûbû. Bager, carina wek pîrhebokekê ji hewa dadiket û her tişt dida ber xwe, carina jî mîna mirovekî pîdirêj, di dor darên bilind re te digot qey direqîst û berfa li ser çiqilan diweşanda jêr. Hirîna hespê şînoz û dengê gur û wawîkên ku ji kûrahîya newalê dihat, wek sira berf û bagerê di guhekî Xalid re diçû û yê din de zû derdiket. Xewnên zarokatiya wî yên erjeng, di nav kortala berfê de gav bi gav rast derdiketin.

Xalid, di heştaliya xwe de, li daristaneke mezin di nav liça avekê de her a navtenga xwe dema ku qerisibû, di nav darên bilind re çend gurên boz derketibûn û ser û destê wî yê ku li ser cemedê mabûn bi qirte qirta hestîyan ve xwaribûn. Ew jî bi qêrînek saw ji xew hişyar bûbû û ji tîrsa wê xewnê heta şeş mehan jî nepeyivibû. Dengê wan gur û wawîkên ku ji dûr dihat, ev xewn dîsa anîbû bîra wî. Xalid, ji tîrsa dengê gur û wawîkan serê xwe di nav kortalê de veşartibû û pê hilma germ pif dikir bêvila xwe. Çawa ku kalepîrekî jihevketî di nav serbûrîyên xwe de li çarekê bigere, di kortalê de xwe piştxûz kiribû û gunchê xwe bi xwe dianî. Çend niçe niçên bêwate êdî bi kêrî tu tiştî nedihatî. Berfa ku mîna serada patozê bê pîvan di-barîya, wek kefenekî li hawirdora Xalid rapêçabû û hêdî hêdî dawîya wî amade dikir. Ba, mirov digot qey weke ruhê xwînîyê wî ji derdor berf top dikir û dixist kortalê. Êdî xilasbûn jê re tunebû. Xwezaya ku bawerîya wî pê dihat, îro jê re bûbû gorek bêkêl. Ew berfa ku gelek caran şekirê cejnê û terhiyên hevrişim zêdetir dida firotin, hindik mabû ku jê re bûbûya xwelîya gorê. Dev û bêvila wî weke yê bizînekê derketibû derve. Berfa li ser simbêlê wî yê boq, hindik mabû ku bubuya qeşa. Canê wî ê reşthlik bi lerizandinê re dom bi dom diqefilî. Gumeguma sir û seqemê, vejandina birûskan, zûrîna gur û wawîkan û hirîniya hespê heştînoz tîrs zêdetir dikir. Bi bawêşîna bagerê re hespê dîsa kir hîrîni, lê vê carê çawa ku bona cengê

gazî bike her du pîyên xwe hilda jor. Bi vê dûmenê re, fikreke erjeng û ewqas jî saw ket hişê Xalid. Heta nîv saetê jî li ser vê fikrê bi kûr û hûr ponijî. Dû re, bi berfê destê xwe firkand û çavnêrî li hespê kir.

Berfa ku wek dîlekî ew girtibû, di nav hişê wî de rêya biryarên erjeng vekiribû. Etarê ku hinek mirovan jê re digot "Ji ber bêzarokbûnê, nedîtî û destgirtî ye..", biryarek welê girtibû ku mirov pê diveciniqî. Di nav berfa hevrişim de, biryarek saw û tirsnak. Piştî fikrandinên dûv û dirêj, biryarek ji bo xelasbûna xwe. Xalidê Etar, hevserê hespê ji navtenga xwe vekir, li her du destê xwe pêça û bi hêza hespê re ji kortala berfê derket. Pîyên wî carna li ser berfa qerisî disekinîn, carina jî heta ber navtengê di nav berfê de dima. Dema ku bi destê qefilî ji paşila xwe demançe derxist, teyrekî ku ji sermayê qefilîbû ji nişka ve ket erdê. Bi çavê nêçîrvanekî li hespa xwe nihêrî û bi hêdî hêdî û bi qirte qirta pîyên xwe ve nêzî bû. Hesp, çawa ku ji tiştêkî haydar bibe, bi hemû hêza xwe ve xwe hejand. Hirîniya wê ya vê neqlê ne weke hercar bû. Tilîkên qefilî li ser lûla demançe bi hêsanî nelivîyan, lê dîsa jî mec-bûr bû. Xalid, serê hespê nişan girt û ji demançeyê guleyek berda.

Teq...

Teqînek dengbilind û bi olan. Lê ji ber ku destê wî lerîzibû, gule bi tenê parçeyek ji guhê hespê firandibû. Ji bilî çend dilop xwîna li ser berfê û olandana li nav çiya, bi kêrî tu tiştî nehatibû. Hesp tirsiyabû, çawa ku xwe ji tiştêkî biparêze du zîtik li ser hev avêtibûn. Ji ber qefilandina serma û seqemê, ji guhê xwe yê jêkirî ne haydar bû.

Xalid, qet nesekinî û guleyeke din berda.

Teq...

Dîsa teqîn û dîsa olan. Guleya mirinê, vê carê li serê hespê ket û di milê din de derket. Hespê heşînboz, weke gêja du sê caran li dora xwe zivîrî. Piştî çend hejandinên ku mirov digot erdê jî bi xwe re dihejîne, li ser teniştê xwe ket nava berfê. Gule, di nav serê hespê de kortalek biçûk vekiribû û xwînê jî wek moxilekê reşandibû derdorê.

Bi berfê re wek destebirakî carina libên teyrokê jî dibarîyan. Xalid, piştî kêlîyek din kêra tûj ji ber qayîşa xwe derxist, bi neynokên xwe tûjbûna wê ceriband û dû re nêzî hespê bû. Lê demarên zikê hespê hîna jî dilivîyan.

Hesp hîna jî xwe di nav berfê de dilivand. Çend lib ceh bi kef û xwînê re di devê wê re derketibûn derve. Xalid berfa li ber zikê hespê, bi lingên xwe paqîş kir. Zikê hespê, wekî gotina gundiyan dişibiya yê hêştirkê. Dîsa li kêra xwe nihêrî. Çawa ku di zebeşekî re bike, kêra tûj di nav zikê hespê re kir û heta ber qirikê qelaşt. Çend



hep ûr û rûvîyên genî di zik re derketin ji derve. Xwîn û şîlavîya ku ji zikê hespê derket, di bin berfê re mîna ava li bin kayê bû cohek biçûk û bi rengbûnîya xwe ve herikî. Xalidê Etar, destê xwe yê qefilî di zikê hespê re kir û heta qederekî jî di nav xwînê de hişt; carina jî difirkand. Dema ku destê wî germ bûn, hemû ûr û rûvîyên hespê bi hostayî derxist. Bêhna xwîn û goştê xav, heta ser zinarên jor diçû. Bi berfa spî zikê hespê bi delalî paqîş kir û mîna çêlikekî, xwe di nav re dirêj kir. Hesp, êdî jê re malîkek germ bû. Zikê hespê, wek şkeftên xewnên erjeng şil û pil bû. Xwîna hespê li çarnîkarê wî herimandibû. Dema ku dilopek xwîn ket ser lêva wî, dilê wî li hev ket. Hindik mabû ku vereşîya. Paresû û goştê germ yê hespê tesîra xwe zû nîşan da û canê wî zû bi zû germ kir. Xalidê Etar, xwe ji ba û bagerê ya ku mirov li ber xwe dibir vê gavê parastibû. Hinavên wî, di nav zikê hespê heşinboz de germ bûbûn. Berf hîna jî wek qulma mirovan dibarîya. Bêhna xwîn û goştê xav, dengê gur û wawîkên dirinde zêdetir kiribû. Birçîbûnê, di nav dengê wan re xwe nîşan dida. Dengê ku bi bêhna goşt re zêdetir bûbû, çiqas diçû nêziktir dibû. Ew deng wek terqîna melakî, bi tirs dihat guhê Xalid. Etarê ku carina heta spêdê jî ji ber dizîya zarokên gund di mal de nobet digirt, ji tirsê wî dengî di nav zikê hespê re xwe qurifandibû. Dengê gur û wawîkên birçî, jê re nîşana mirinek din bû. Dilê wî jî ber tirsê dikir kute kut. Ji mirina sermê filitîbû, lê ketibû tirsê vî dengî.

Tiştên ku di hişê Xalid re diborîyan, ger ku rast derkera wê çerxa feleka wî biketa devê gur û wawîkan, wê hestiyên wî û yên hespê bibûna sîxikê ber devê wan.

Tirseke mezin kete dilê wî. Ji ber vê yekê, destê xwe bir ser demançê û kêra rûj. Lê dengê kovîyên dirinde vêga nêziktir dihat. Bi bêhna xwînê re zû gihîştibûn ser şopa goşt. Çar pênc gur û wawîkên birçî, bona perçeyek goşt dema ku termê hesp ber bi xwe ve dikişkişandin, di aqilê Xalid de tenê fikra demançê mabû. Tirsê ku ketibû dilê wî, zirav lê qetandibû.

Xalid, destê xwe bir ser lûla demançê û bêhneke dirêj stand. Bi tirsê ve, serê xwe di ber zikê qelaştî re derxist û li ser hev du gule berdan. Dengê guleyan ne tenê gur û wawîkan, hinekî ew jî tirsandibû. Gur û wawîk, ji ber van teqînan revîyabûn çarnîkar, lê dûrtir neçûbûn. Xalidê Etar, guleyek din jî berda û bi lez di nav zikê hespê re derket. Zûrîneke tevîhev li ser şevtariyê ketibû. Ji tirsê xwe, guleyek din jî berda. Wê hingavê çêlika gurekî bêhemdî bi guleyekê birîndar bûbû, lê wî nedîtibû. Dengê guleyan di nav kûrahiya tarîbûnê re zêde olan dida. Dirindeyên birçî, bi teqîna guleyan re tevî tarîbûna şevê bûbûn. Gur û wawîk bi xwezîya goştê hespê heşinboz ve revîbûn û şopa xwe winda kiribûn.

Piştî ku pêjna gur û wawîkan sekînî, tirsê jî ser rûyê Xalid çû, lê heta qederekê jî

bi dudilî li benda dengê wan sekînî. Kêlîyeke din, dîsa xwe di nava zikê hespê de dirêj kir û wek livînekî her du parçên qelaştî li hev pêçandin. Destê xwe danî ser lûleya demançê û guhê xwe ji dengê gur û wawîkan re vekirî hişt. Her dengê, her livandinek fikarek dixist dilê wî. Heta ronahîya şevqê, geh ji dengêkî vedicinîqî, geh jî di nav xeyalekê de bi xew ve diçû. Bi ronahîya spêdê re dema ku hat ser hişê xwe, di nav tîrêjên tavê re carina berfa hûr jî dibarîya. Berfa ku ji şev heta niha barîyabû, hem bêhna goşt birîbû, hem jî termê hesp di nav xwe de winda kiribû. Xalid, mîna meytên ku divejên di nav zikê hespê de derket. Pênç şex deqeyan nola stêrkên rijiyayî li hawîrdora xwe nihêrî. Bêwate bêwate, heta qederekê welê sikînî. Dilê wî bi hesp şewitî, lê dîsa jî tiştêk ji xwe fêm nekir. Digot, qey xewnek saw dîtîye û wê niha rabûya. Lê, zû fêm kir ku ne welê bû. Serbûrîyên wî ji rastîyê jî wêdetir bûn. Cara dawî li hesp û kortalê nihêrî û ji bêçareyî ber bi gundê xwe ve meşîya.

Meşîna wî wekî mirovê li ber mirinê hêdî hêdî, gav bi gav bû. Sir û seqema hewayê di nav tîrêjên tavê re tûjtir dibûn. Deşt û mêngên derdor mîna zevîyên pembûyan spî dikir. Rê û rêçikên gund di bin berfê de winda bûbûn. Lê ew rênasê hemû çiyayên di wext de jî şêrbazê zinaran bû. Berfendeya ku ketibû newala wêdetir, bi xwe re çend darên berûyan jî xij kiribû. Ji sedema vê yekê gavên ewle davêt, lê dîsa jî rêya ku pêlê dikir, ji ber xwe ve dixijikî. Xalid, xwe di nav berfê de wekî mirovêkî bêruh dihesiband. Te digot qey hinekan ew ber bi gund ve kaş dikir. Wî jî nedizanî çawa bi rê ve diçû. Carina di nav berfê de dima, carina dişemitî û dibû gilollik, carina jî wekî zarokên berşîr bi çarpiyan dimeşîya. Dengê gur û wawîkan car cara di nav bayê re difilitî, dihat ber guhê wî û gavên jihevketî leztir dikir. Xalid, bi dest û piyê werimî ve dema ku gihiştibû nêzikî gund, gur û wawîkên dirinde jî ketibûn ser goştê termê hêsp.

Dema Xalid di pişt girekî re li gundê xwe nihêrî, ji bilî spîbûnek tevlihev tu tişt nedît. Pêşî got qey di nav berfê re rêya xwe şaş kiriye. Lê piştî ku li çarnikarê gund nihêrî, mîna ruhstandina ezraîl bi tirseke mezin ve vecinîqî. Tiştê ku dîtibû rast bû, ne riya xwe şaş kiribû, ne jî hatibû gundekî din.

Etarê bêzarok, tiştên ku li gund bi çavê serê xwe dît, ji serbûrîyên wî erjengtir bû. Berfa ku bi şev barîyabû, ne elametê xêrê bû. Çiyayê ku gund di hemêza xwe de diweşart, te digot qey berfa xwe bi mecerfeyekê rijandibû ser gund. Xanîyên ku ji axê hatibûn çêkirin, di bin berfendeya çiyê de mabûn. Quntara çiyê niha goristanek spî bû. Di bin berfê de, tenê serê minara mizgeftê xuya dikir. Ne dengê gundîyên belengaz dihat, ne jî pêjna wan zarokên ku jê re digotin: "Xalidê tîma, Etarê tîma..." □

## Mepirse

### ŞAHÎNÊ BEKIRÊ SOREKLÎ

Çelenga min!

Di giyanê min de hişk dibin tamerên hesta evînê,

Di dilê min de melûl dibin çirayên xwedîtinê.

Xweşik min!

Wekî pelên darên di mehên payîzê de

Diweşin daxwaz û meraqên min.

Bênavê!

Bihejîne bejin û bala xwe, bihejîne,

Di giyanê min de hestên evînê dîsa vejîne.

Çavşînê!

Çîroka jiyana min di nav mijê zivistaneke gundê me yê şewitî de wenda bû,

Rûpelên rojên min ketin nav talîzoka gulaneke bêbaran û bi çolê ketin.

Mepirse li roja jidayikbûna min,

Megere li navên dê û bavê min:

Hemî ketin bin axweliya goristanê.

# yarê

## ARJEN ARÎ

sed pîvok der bûn, sed kulîlk zer bûn  
sortir vebûn yek ji yekê;  
ev xec e, ev lîloz e, ev bûka pembî...  
seqem tenibî, roj dibîşîre  
yarê, ka bêje  
kîjan kulîlkê bikim berbiska te..!

ji simbilên ne seridî tê  
bîhna te; baskê hênîkahiyê, pariyekî binevîşî,  
zevîyan dadigire, çîyan dixê bin hikum.  
nêrgîz e bi pirahî  
-heke ez bim- hinekî jî geyakê sêvê...  
ce, hêdî hêdî diseridin li vê lêvê  
yarê,  
bikeve rê,  
bihar e lêêê, bihar e!

dî eşqê werbûye;  
bi bêrek ava zêde, dixulxule  
mîna min bi dil e kaniya jêrî.  
dengê qemdîlan digire newalê,  
dîya min kilê zêde dike li meşkê.  
berke ji Xwedê;  
nanê sêlê, dimsa Torê  
û loqek nîvîşk û tasek dew e  
yarê, kerem bike ser sifra Arjen Arî!

## Heftok

yekê yek bir  
duduyê yek xwar,  
sisê sêwî mêwî ma  
çar pê re stuxwar,  
pênç mîna şêran bû  
şaş ji ber heftê rabû  
heştê cih neda nehê  
da ku neh negihe dehê  
bi stûyê yazdehê girt  
di bin sêzdehê d'ma duwazdehê mehê,  
çardeh berizî pazdehê  
got 'gidî, zêde mebe!  
nebe tu bibî pazdeh;  
bi dû te de welleh  
dor tê jimara şazdehê!  
zarokno, ji bîra we neçe  
îro bû salvegera Helepçe!

# Sê hezar û heft

## ARJEN ARJ

Niha, zarokin raperîkîbûna guliyên min.

Ji berûyên min bixwarîna, bileyistina li ber siya min.

Mîn çiqasî bêriya wan kiriye! Mizir bûn, şûm bûn. Çav bi şelêq, difn bi lîçik bûn. Dîsa jî xweşik bûn.

Porkê hinekan mîna berûyên bi min ve zerik bûn. Delalîyên ber dilê dê û bavên xwe, niha li ku ne...?

Mîna min bi tenê ne?

Têr in, xwas in, birçî ne?

Bi çavgirtînkê dileyizin, gelo? Mezin bûne, niha leyistik ji bîr kirine. Dîlanê, niha jinek e. Serdaro esseh bûye xortek!

Hê wê gavê, çaxê ku gund şên û ava bû, pêşenîka xwe mîna ku çêlekê bialasta, şafk dikir. Mizir mizir li Fatimê dinerf. Mîn didît: serê xwe ji şibaka aliyê bareş derdixist, bi hêla kaniyê de dimêzand...dimeyzand. Fatimê jî xwe bi avê disêvixand! Heta ku dêya wê negotiba 'waaa Fatiiim!' av bi cêr dadikir.

Mebêjin dareke berû...û ev hizir!

Gund ava bûbû nebûbû, li wê raserê, li wî cihê asê, şîn hatibû. Ji kalê herî kal ê li gund bitementir bû. Ji ber ku di xirêm de bû, keysa êzingvên jî lê nedihat. Bekirê Ehmedo rojekê li dora wê çû û hat, û got 'Çar bar êzink di wê mîratê de hene!' Lê, nikarîbû bibira. Beriya ku Bekiro wê rade çavên xwe, bizinina çav berdabûnê. Bizineke reş î reş, mîna ku dilê kerê bibije kelbeş, li dorê çûbû û hatibû.

Wê gavê hê devî bû. Derxeke cik î ciwan! Bizina bênefs, bi çil çilî,devê xwe bi

stûyê xwe re dirêjî karekê kiribû. Bi dirêjkirinê re bizina min û te ji tahtê hatibû xwar. Ji vê bûyerê bi şûn de gundiyan, gotibûn ev dar ziyaret e! Êdi kesekî tengî neda. Û Bekiro jî, çar ker di ber de gava ku ji bajêr tê, bi rê de luqma nanê firnê û helawa Mêrdînê di gewriyê de dimîne!

Di şûntaziyê de gundiyan cîran, gotibûn 'Rehma Xweda lê be! Daran heyfa xwe jê hilanîn!'

Rojê, li ber ava êvara meha payîzê dibeevand.

Sê sal tê hebû; dara berû ji wê raserê li gundê kavil dimeyizand: Pisîkek, kûçîkek nedidît!

Mirîşkek, dîkek nedit! Şaxekê, mîna ku bibêje ka bizina hît? keribî, duwazde berû ji berê xwe dawêşand! Her berûyek bi deverekê de pengizîn! Kodê hinina ji berûyan filîtîn! Stewiyabûn. Zer bûbûn. Masûr ketibûn qaşilê hinekan. Kodekê ji wan li erdê, got 'Ezê bûbûma ceft!' Ya nêz ku di nava tirabêlkê de mabû, kelogirî lê vegerand:

-Tiyê! Tu ê çawa nebî ceft!

Hejmara gundên kavil bûne sê hezar û heft! □

# Armand Gatti

FAWAZ HUSÊN

**G**ava mirov derbasî berhemên Armand Gatti dibe, mirov dikeve qada şer û bi taybetî hinava nalîna birîndaran. Çi li Fransayê, li Almanyayê, li Amrîka Navendî, li Çînê, çi i Sovyeta kevin be jî, şer herdem gûrr e, mirov wê bi xwîna xwe an bi hovîtiya xwe dinivîse. Dem û navçe tên guhertin, lê tekoşîn hergav guhertinên mezin û fedakariyê dixwaze.

Gatti ne bi tufing û bombeyan beşdarî cengên sedşala xwe dibe, lê bi wicdanê xwe, bi dilê xwe. Ew bi gotinên xwe ên bipêr behsa wan kesên ku mîna barnê dikevin dike. Ew bi wan re dişewite, dikeve, dimre, lê ew bi wan re jî radiibe, zinde û geş dibe.

Helbestên Gatti tevlihev in, bi zhemetî tên xwendin. Ji dûr ve, gotina Gatti mîna gotinek winda, peyvek derbider xuya dibe. Gotina Gatti ji qada şerekî diçe qada şerekî din, cîhana hustûxwaran dibîne, li deriyên hovîtiyê û hejariyê dixîne. Riste, dîmen, nexşe, hemû tevlihev dibin û xwendevan gelek caran dikare bawer bike ku Gatti dikeve taya hezeyanê. Lê gava helbest diqede, dîmenek giştî li ber çavan peyda dibe. Weha jî, xwendevan tê digihêje ku, mîna jiyane, helbest dijwar e, tevlihev e, zehmet e.

Armand Gatti hozanê dîmena ketin û rabûnê ye, nexşeya Bîranîne û besta jiyane ye. Gatti hevalrêyê mirovê şikestî ye, mirovê ku hebû, yê ku heye, yê ku wê hebe dostê wî yê kevin e. Weha jî, mirovê ku di qada tekoşinê de dikeve, winda nabe. Ew dibe stêr, fener, çira. Ew rê vedike, tarîtiyê diqelêşe, ronahiyê dibarîne.

Gatti li ser wî mirovî dinivîse, mirovê ku pergî xwe te, karînen xwe dinase û weh jî mirovê ku dibe, bê sînor.

**Sedsala me, tu ya ku li ser erdê yî  
bila navê te haş be  
lê bila şoreşa te bê.**





### **Kurtejiyana Armand Gatti:**

- 1924 Di 26ê Çile de li Tonkin'ê, bjarekî tenekan ye ji Monaco'yê tê dunyayê. Navê diya wî Laetitia Luzona ye, yê bavê wî Auguste Reinier Gatti ye.
- 1939 Bavê wî Auguste dimre. Armand Gatti li dibistana Monaco'yê dixwîne lê ew zû jê tê qerwrandin.
- 1941 Armand lîseya xwe diqedîne.
- 1942 Ew dikeve nava şerê berxwedana Fransayê diji dagîrkirina Almanan.
- 1944 Ew beşdarî şerên rizgarbûna Fransayê dibe, nîşanek pê ve dibe.
- 1954 Ew wek nuçeguhêz diçe Guatémala, Çe Guevara dibîne.
- 1957 Armand dibe redaktorê kovara Libération'ê
- 1958 Armand diçe Çînê û Koreya Bakur
- 1960 Di warê sînemayê de, Armand Carti filmê Percin diafirîne. Ew romana Kafka ya bi navê Qesir, dike film.
- Armand Gatti pir ji bo şanoyê, sînemayê kar dike û berthemên wî wek rojnamevan û nuçeghuêz bêhejmar in. Ew li Parîsê dijî.

# Perçîn

ARMAND GATTI

Hîna peyvîne raz û borînê mabûn

Venasînek ji bêgumanên çît di tixûbê navbera erd û ezmên de  
Wan ta wê demê em parastibûn, em herdu.

Hîna peyvîne raz û borînê mabûn

ew ên dawîn bûn

û me ew yek dizanîbû

û ligel awirê te yê şîn

dûrî riha bor ya ku rûyê te dagîr kiribû

û dûrî destên te ku ji ber kar pehn bûbûn

nefesa te li ser rêya ji kevîran

rêya ku giraniyê jê bar kiribû,

windabû.

Wek gezîndeyê li ser dara belesanê

\_ erê perîk û pelik bi eynî şîrêzê tên avdan

lê neçar, ew nikarin xwe bi hev bikin yek

wêha jî heryekî hewl dida ku bi saya gotinan biaxîfe

gotinên ku ta hevçot bûna nema bi têgaştina tiştan

dihatî rohnî kirin

Stêr çiqasî şewqa wan hûr dibe

ew wîqasî mezin dibin.

## Mirî-Karker

Rêyeke kadizan vekirî  
rê de deh niçikên rohnî  
cîh digirin  
ji bo ketineke  
ne ber bi jor  
ne ber bi jêr.

Peleke mirî yê darê

di navbera bestên Dîrokê de  
hilawestî  
lê ji mêj ve,  
bi salên rohnîyê dirêj  
berxwedana wê  
diyar bû  
ne li gor ku me bawer dikir  
Mangirtinê berdewam dikir  
zanyariya hewayê digot dunya ê xweş be  
û di du rêzên kuncnivîsarên rojnameyan de  
sê hezar hindî ji birçîna dimirin.

Erê weha jî bi derba qontaxê  
tu di nava sindoqên serobinî de  
û depên agahiyên daxwaza  
misogeriya miaşê herî nizim dikir,  
tu vegevizî  
(rojgirtina nîvco ya stêrekê ku ji nişkê ve dibû rastiyeke û hemû rastiyeke me ên  
hêna nûzade li dor kom dibûn)

Mangirtinê berdewam dikir.

Karkerên mirî      nizanin pêşkêşî û daxwazî çî ne  
                                 nizanin pelên meaş çî ne  
                                 nizanin nan û qer çî ne

Mirin, mirî nizanin ew çî ye  
Mirin bo zindiyan e.

ji hemû miriyên te

ji wan, min paşmakeyek girt

(û Camille û Denis birayên te ên belavbûyî  
û François û Pirost û Pêpê û Baffi'yê serbaz  
hemû bi nexweşiyêke tewş mirin :  
nexweşiya ji bo niştimanê

û Mèlnieya nazik, Blanchea kulekî,  
xwehên te ên hêna pir biçûk

û Ange (Firişte) ya ku navê wê temam li gor wê bû  
navê ku di bîra te de bi sed caran miribû  
beyî ku mirov bikarîbûya çihê wê mirinê belt bikira)  
min ji wan paşmakeyek girt

Wêha jî min naskir ji ber çî tu bavê min bûyî.  
Min ji xwe re digot :

Em stêrkok in  
lê em nizanin li dora çî  
digerin.

Em stêrkokên xwedî şêne ne  
Gava mirovek dikeve  
hemû dunya diket

Lê bi saya giraniya van kesên ku diçin  
em berdewam dikin,  
digerin.

Yê herî bi temenê xwe mezin

bîstsalî bû \_ û tu jî vî temenî  
tucarî derneketî  
Ma piştî çûyîna te  
min ê çawa fikir nekira,  
ku ew ne  
ji bo girtinekê dihatin,  
ji bo ku erd, daristan, zivistan, siyên wan û tu, bavê min, hûn xwe bikin yek

(Di nav bombeyên ne teqayî û termên  
leşkerên mirî û zarokên ji birçîna  
mirî de, daristan hiştin hatin)

Çiqas jiyan di nav nedaryiyê  
û stêrikên terî dirêj de windabûn  
lê û ne tîrejekê dikarîbû navenda ronahiyê bicîh bikira  
û Mélanie, û Blanche û Pépé, û Pinot, û Ange

hezar rûyan  
ji bo seriyekî tenê ku  
her destê sibehê  
bi devê sator  
diket.

Û ezmên digot ezman  
û erdê digot erd  
û jinan digot erd  
û mêran digot ezman

Li wê devera ku ewrên hesareyî  
şiklê nîşaneke mezin ya pirsînê digiric  
û ji bo me gişan şiklê bersîvekê  
û wan digot

û zarokan bi birînên  
ku van agahiyan li dû xwe  
dihîştin,  
dilîstin

mîna kewara stêrkokên ku  
neynika nîvrojeyê ya ku dixwest  
rêgeyên wan binase  
di cîh de rawestîne

û wan digot

Ma tu bi wan re bûyî?  
Ma tu bi saya wê qula  
ku bombeyê vekiribû

tu filitbûyî  
wê qula ku ew têre  
digeriyan?

Nemreya 304  
Çiyayê reş  
Rêya Xaniman

Ez di nav van navan de hatim girtin  
ez yê ku min tiştek ji newal û çiyayên wan  
nas nedikir  
ez yê ku min tiştek ji wan  
nas nedikir  
tenê  
ew şeva ku bîst salan paşê  
ji nû ve te xwest wan peyda bikî  
min nas dikir

Çiyayê reş  
Rêya Xaniman  
Argonne

Te gotibû : gerek ez rabim xwe bigihînim wan!  
Çavê wan li rêya min e

Min xwest bawer bikim ku ew  
di toza hecên ku tu kes naçe wan de  
gorbiser bûn

û di berbangê de  
min ji xwe re endîşeyên kesên xwedî hêviyan  
çê dikirin  
da ku tenê bi carekê  
ez wan bîst salên ku wan derbas  
nekiribûn,  
rohnê bikim

Carekê

di dilê ronahiyê de,  
ewê baş bizanibin  
ku ez ne dijminê wan im  
insan ji gula valahiyê çê dibe  
eger ez wan vedigerînim şev û rojan  
ew e ku da ku ew pertolên xwe  
ji xwe bikin  
pertolên ku ew di wan de  
pir zivistanan lerizîn

Nemreya 304  
Çiyayê reş  
Rêya Xaniman  
Argonne

û wan di nav berfê de  
sîh metrif dûrî malê  
te bêhiş dît.

Argonne bê qêrînek  
bê dengê

Wek gava gerestêrek ku van  
malbatên seyr ên ku tevgerên  
wan hevcor in dighîne hev  
lê nasîti nemumkun e

Roja din, fermanên lêkdanê  
li hemû bajêr bi dîwaran ve bûn

erê wan tucarî teva nebûbû  
wî herdem berdewam kiribû

ji ber vê sedemê jî goristanên leşkerî  
hergav, ji pîr ji mêj ve, bi rêkûpêk bûn

Belkî ew hewldanek bû  
da ku mirov bikaribe,  
bêyî hêviya vegeerê,  
bitemamî derbasî bîst salên te  
bibe

Çûnkî mirov dibe bê sînor  
wê gava ku ew tê  
da ku pêrgî xwe bibe.



Ev axa zikqekaştî  
ev roja ku her spêdê di nav gullebaranê de zinde dibe  
ev bedbîniyên ku di bin rohnîyek sersar de  
bi mirinekê bang dikin  
mirineke mezin, wek çerxa guhertina demsalan mezin

Weswasên te, di dema şikestina rojê de

Ew Ewropaya  
bîstsalîyên min bû

li ser girên ku dar û mirov  
çavdêr bûn,  
Ewropa eletewş dibû  
agir bi daran diket  
mirov, siyên ku axê çavên xwe dibijand wan, diketin

(û Marcel Totiléeê ku bi saxî di şelwarê xwe yê  
xakesterî de şewitî  
û Clocheê ku bombeyêkê zikê wî qul kiribû  
û Lilouê ku ji ber riqê çavên wî xêl dibûn  
û Pacoê endelûstî)

Nêrîna wan ya şîn ya rojê bû  
mûyên bor ên li ser rû dirêjbûyî  
û ronahiya giranbûyî  
ji ber bikaranîna çekan

Çinîna parsekê  
cemserên ezmanî  
li tersî xêza asoyê

Ewropa eletewş dibû  
her kevirekî şehkirî  
dibû dîwarekî zindanê

nivîsên ser dîwaran  
bi bêhêviyê û bi tolê  
diqêriyan  
di nav bêdengiyên xwe de  
girtî bendewar bûn \_ tevgerên şevên wan di rengê tevgerên dînî de bûn, tevge-  
rên ku agirê tifengê wê bibra derveyî cihê nîşanê \_

Hey silav!

Ev berbanga cemserî  
ku li ser keriyên mezin  
ên piştxwaran radibe  
keriyên li ser hemû gulên bayî belevbûyî

Hilbijartinek ku xêzên tarî ên reşikê rojî  
dizê

Ew Ewropa bû  
Meydana mehrecanan  
Zindana Tulleê  
Girtîgeha Eyssesê  
û welatên ku pinpinik nema  
diçûn wan  
( Zarokên ku di karwanên mirinê de dihatin rêghueztin diketin xwena rêwiyên  
rojekê )

Hey silav!

Thierry! Mirinek  
bêhejmar  
ya saleke di nav jihevketina bêyî  
xirecir de,  
bê kurtepişt  
tu ji birçîtiyê û hevaltiya  
di hemû awiran de xwedî  
par bûyî!

Thierry, sê sed û şest

rojan min te dît, min

te bi kiloxê te yê nû teraşî,

bi milpêça te ya sor î  
rengperî, bi çakête te yê  
anîşk rizyayî û nigên te ên  
di nav paçikan de  
pêçayî, min te dît

(wî xwe di bin renckirinê de negirt)

Erê, min te dît,

li meydanê

dirêjbûyî

li ser erda cemidî  
min te dît, Thierry  
te bermîla pîsiyê vala

dikir

Ewropa di hezeyanê de bû

hezeyana hemû zaroyên xwe

ên ku ji şerên din filitîbûn.

geş çerxên helwestê,

duwanzeh stûnên teşiyî bo kelişeyekê bi kincên resmî ên : tirsê

Mirinê xwe di bin

girekî gihayên bizdihîn de winda kiribû

ew li paş tîlên dirrek dikuliya

mumkin dibû nemumkin

û nemumkin, tişteki rojane.

bi hezaran îsa û sêdar

wek gulên bûk û zave hişîn dihatin

ji agirê êzingan ra rêyeke kadizan

Rêya kadizan tenê bûbû rêyeke girtî

Hingê gotin, mecosên wan û dîtanekdarên wan  
bûbûn hevhesû

Dijwariyê baweriyên wan şikenandin  
û wan di karwanên dirêj de  
ber bi van teşeyên gogî  
bar kirin

û eger ew li wê derê hêna derdora xwe  
rohnî dikin

ew e ku mirina wan ya bi milyonan  
hêna negihaştiye dawiya xwe.

Nikyê Volgayê  
an yê Dniepr'ê  
an yê çemê zîrzemînî  
yê ku di nava bajar û kavilan de  
me digihînin hev  
di destên jêkirî ên  
bavûbapîrê rûst

Û cewiyên tçekî  
ên ku di berbangê de  
çûn

û hevalrêyên min ên  
Givors'ê  
ez nizanim ew li ku  
windabûn

û kesên min?  
û kesên te?  
ew tevlihev dibûn

û stêrkoka, dîvelanka bi şêne tenê ma nexşeyeke vîkîvala  
ku bi engirîntî di nêçîra cîhanê de digeriya.

Çiqas ez ji wan dûr diçim  
ez wiqas nêzîkî wan dibim

Çend caran, bavo, em bi hev re  
çûne jûra gazê  
û ez bi tenha xwe, bi sed salan ji wir dûr  
hişyar bûm  
di nav wê şermê de ku  
min hêna bîhna xwe dida û distand

Ma ew ji ber ku stêr mezin dibin her ku şewqa wan kêm dibe?

Sed şevan, me bi hev re da ser rêgeya dawîn  
Lê gava me her tişt kir  
te xwe disipart paş mirtalê nişanên û te ji kevîran dixwest ku ew mirina bi şewat, nexşeyê wê yê leşdar, forta wê, rave bikin  
û bêçare,  
li ber alavên renckirinê  
ên ku tucarî nehatibûn bikaranîn,  
ez diketim.

gadî  
carinan dihat  
ew di cilûbergên hefteyê de dihat :  
wê nav, tarîx, bajarên ku mirov bi hêviya peydakirina yekîtiyekê li wan digere  
- şadî çiqas belengaz û feqîr e!

Ma çî fêda wê heye ku mirov nav û tarîxan li ser nexşeyên vîkîvala deyne?

Kêla yadgariyê  
ez nikarim tucarî  
wê bispêrim êgir

Tenê şikestineke biçûk  
wê bikaribûya hemû nişanan bixîne  
lê çiqas şaxên hişîn  
ên ji canê darê jêkirî  
wê têrê bikin  
da ku agirek bê vemirandin,  
agirek, ku ne yek, wê  
bixwaze hebûna wî webûl bike?

Vexwarina şîr di bin konê sibîryayî de  
bo gotûbêja li ser pezkûviyê dîn

lêkolîna li ser xwedîkirina pezî li biyabanên Pamir, li wê dera ku erd û ezman  
zewaceke spî lidar dixin

di baxçeyên Cathy de  
dîtina cihê kûsiyê bi kêl  
li wê dera ku ji hezarên salan  
gavan û cawker nişanan pir dikin

du çavên kamyonê şeva Yûnanistanê  
qul dikir li wê dera ku mirovek û belkî gulek jî  
diketin

Sendeliya elektrîkî heyv ji jora  
avahiyên pir bilind  
qewrandibû, her şev wê di govenda zarokan de,  
di xewna du sêwiyên li paş deryayan de,  
dîlan dikir.

Reşikên nihênî bêyî hevî  
di bîraniyan û di tozê de  
hergav rêz dibûn.

Û ez di bajarinan re dibuhurîm  
bajarine ku ji destên min  
hişîn nehatibûn  
û ez bi mirovinan re dibişirîm  
mirovine ku tucarî di hêza min de, di pêşmaniyên min de noq nebûbûn  
(lê bi nanê nihênî ku di nêrîna tendûrên Martin de dihat lêxistin, me gişan baweriya xwe dianî  
û wek nîşana destûrdanê  
me behsa pêşerojê dikir)

Bi slogan û baweriyên me  
em hemû stêrkok bûn  
me bi xwe re bi sedan  
miriyên ku nikaribûn di navbera xwe re  
dunya din bi hev re dabeş bikin,  
digerandin.

### Ewan

carinan xwe li dawîya dunyayê  
digihandin min

Kesên Guwatêmalayê, hun ên gotinên nû  
diguhezînin  
hun li ser çiyayên sor, wek zarokên ku gerek ji  
dibistanê  
bizîvirin, hun rêz bûbûn  
Li ser piştê nêriyên ji heriya hişkkirî  
bixûra ku we  
berî qirkirina xwe dişewitand  
hêna dişewirî

û hevalê min yê ji Biskra yê ku di bin dara  
xurman de xulmaş bûbû  
Ma xaniyê ezmanî yê Camille an yê Denis bû ku  
hergav navnîşana xwe diguherand?  
û hevalê min yê Konstantîne?  
û yên din?  
ji kîcan gerestêra terîb gorên wan tên erdê qul  
dikin û erd wan dadiqurtîne?

Sedsala me, tu ya ku li ser erdê yî  
bila navê te haş be  
lê bila şoreşa te bê

gotinên şivanê di nav tavê de winda,  
ew dibîne ku keriyê wî bi saya  
deh hezarên çiyayên ku  
negehbanîya erdê  
dikin

deh qat  
bûye

Bo bavê ku em giş ew in  
çûnkî bav herdem yê din e  
Bo darikê şixatê ku diarande, pê dikeve û xwe dişewitîne  
Bo lampeya ku rêberîya payên rojê dike  
Bo seravên ku biyaban li pey wan e lê ciyên avê didin dû wan  
Bo her heft deryayên ku ezman di wan de dibe talî da ku ji nû ve di xwê de zin-  
de bibe  
Bo motorên ku nelivînbarîtiya me dixîne ser dûvelanek din  
Bo tevliheviyên ezmanî ên ku sêlên parabolên dikin asoyên birrî, asoyên birrî  
dikin bêdengî,  
û bêdengiyê dikin nîfrîna ku ji devê lawikê nû zade derdikeve  
Bo xewnên ku mirov dagîr dike bi kîsekî tije alav wek balgehê  
Bo rûyê wêranbûyî yê rojê û rûyê wêranbûyî yê gemşoyên ku ew diperçiqîne



Bo stêran gava dibin gulleyên tifingan da ku baweriyên bi paş ve bibin û wan mezintir bikin

Bo saetên dîwarî ên bûne bernamêyên mêrên gihaştî.

Bo westiyayên mezin ên xwedî gotinên firindeyên şevî

Bo jinê, bo refên rojê ku ber bi wê ve diçin

Bo zarokê dijî wêneya xwe ya ezmên

Ez dibêjim ERÊ \_ (stêrkoka bi şêne).

ERÊ \_ lê li dora kîcan

têgihaştina tiştan ev erê ji mêj ve

digere?

Wergera ji fransî: **FAWAZ HUSÊN**

## Helepçe

### BERKEN BEREH

em bi hev re mirin mirovno!  
pênc hezar insan  
ne şinahiya asîman  
ne xweşikbûna kûlîlkan  
herikîna çem û rûbaran  
û ne jî berbangên awaz çivîk xema  
me ye êdî.  
stranên me yê evînî rawestan  
lê negerin  
naxweyê  
di bîbûkên me da jîyan  
ji toza ewrên zerî û bêhna sêva  
riziyayî zêdetir.  
ji xwe em xizmê hev bûn  
xewn û xeyalên me wekhev  
em bi hev re mirin  
pênc hezar insan.  
pîr û kal  
min tucar nebîhistibû dengê wiha  
bêhneke wiha min nekişandîbû cerga  
xwe  
derewan nakim.  
dibe we ez ne aniyam bîra xwe  
an kûlîlkek neçikanda li ser gora min.  
ji xwe  
gotinên me pere ne dikir

nîvmirî bûn em  
tirsîyam dîsa jî  
derewan nakim.  
lê ew zarok çima bi me re ne  
qey wê ne jîyan  
bê nasnav be jî  
an xizaniyek bi xedar.

dergûş/

çi bêjim bê feyde ye  
hatin û çûna min bi hev re  
ji xwe  
hê nav jî li min ne hatibû kirin.

dayik/

va bêbavan  
pirtûkên pîroz jî ne xwendine  
ji evînê bê par in  
berxê min di derguşê de ma  
destên min bûn dareke hişk  
û me hev hembêz nekir.

zarok/

min digot qey  
ev jî lîstokek e  
hey hawar dikim  
kes nayê banga min  
goga bavê min îroj kirî jî  
ma li hewşê  
wê kî pê bilîze gelo  
kes ma?

mamoste/

çiqas li min xweş dihat  
evîn ê hînê zarokan kim  
hevaltî, biratîyê  
hê zengila betlanê lê nexistibû  
ev mirin çima  
û li depreşê nivco ma  
nivisa serfiraziyê.

axa/

ev çend mal û milk  
ev çend dirav û zêr  
û bêdadiya min...  
nikarîbû rawestîne mirinê  
min digot wê em ne tê de bin  
çima em haydan nedan?

xort/

min gustîlkek kirîbû  
ji bo gulbihara xwe  
va em bi hev re çûn  
wê ya bidin yeke din  
min ji bo wê hewce nema

helbestvan/

kê digot  
wê hevqas bi wate be helbesta me  
ku tucar pênúsa min  
xwîn ne rijand.

şivan/

hê nû zayî bû  
berxa bizina bedew  
yekcar şîr nemêtibû hê  
li ber xwe nakevim  
bizanin  
me bi hev re veşêrin  
di bextê we de me  
bi seyê har re.

xweda/

e jî şaş mam bawer kin  
kê destûra vê komkujiyê da  
li min biborin  
ketime bextê we

mirovahî/

hûn bi hev re mirin  
bi wekhevî, bi biratî  
rûreşî para me!

dîrok/

bû deqek tenî  
rûnişt li ser eniya min  
navê te Helepçe

## Tûtek

### ROŞAN LEZGÎN

tûtek!

janê to yo bêfam sipeyî dindananê to ra çurusêno  
fekê to yo akerde de  
hewayişê to yo qurmûçnaye çimanê min de  
cemediya...

tûtek!

kamî hewayişê to qurmûçna-  
kamcû hewayî to kirişna qeraxê nê şherî?  
sergo  
halînê xaranê to bi qey?  
letêk nan  
kufikbiyaye  
û destê to yê balûkinî..

çerekanê riyê to de nexşeyê welatêk  
vinîbiyaye...

oyy oy tûtek!

emrê min

wa emrê min lîlikanê to de bi cemediyayne  
ti bi kamcû ziwani bermenê loo-  
ti bi kamcû ziwani qisey kenê ha?!

hero tûtek!  
nê hêsrên to yê lewanê min ra çilkenê  
(wa qe boya lewantî rêzikanê şairan ra nêro hendî.)

hero tûtek!  
hêviyên to perperokê zerê min de  
-baskê înan cemednayey...

ax turek!  
wereka  
ma kendalanê Kosûrî de bêne nika  
binê dara tuwere de  
şilêk piyaz û letêk nanê tenûre  
destanê ma de...

*Hamnan /2000- AMED*

# Li rojavayê Kurdistanê tevgera siyasî û çape- meniyê ya bi zimanê kurdî -2-



Keça Kurd

## Kovarên serbixwe

Kovarên serbixwe jî li Kurdistanê rojava derketin. Û ji van kovaran:

1 -Kovara *Gurzek gul* e. Ev kovar li ser destê mamosta Konê Reş û çend xortên dî belav bû. Hejmara yekê di sala 1989an de derketiye. Hejmara 15an ku a dawî bû di sala 1992an de derketiye. Ev kovara ha, a pêşî bû ku hêja Konê Reş li destpêkê bi tena xwe derxistiye.

2-Kovara *Zanîn* kovareke serbixwe bû, hejmara 12an a dawî bû, di sala 1997an de derketiye û li ser bergê wê temenê 6 salan nivîsiye. Mamosta Ebdilbaqî Huseynî derdixist. Û di nav kovarên partiyên û ên serbixwe de, tenê li ser bergê kovara *Zanîn*, edrêsa wê aşkere bû.

3-Kovara *Aso*, hejmara yekê di sala 1992an de derketiye. Çar hejmar derketin û paşê rawestiya. Lê ji beriya demekê min ji Kurdistan TV bihîst ku hejmareke nû, eger ne şaş bim hejmara pêncan, got ku derketiye.

## Rewşa kovarên me

1- Mebest ji derxistina van kovaran; ne ji bo avakirin û pêxistina ziman û toreya

kurdî bû. Gotina rast ku mirov bêje; ji bo berjewendiya partiyên xwe bûn. Û çavlêkirin bû, da ku bêjin filan partiyê filan kovarê derdixe.

2-Komîta nivîskarên kovarê ne ji wan kesên bi rastî xwediyê pênûseke babet (la-yiq) bûn. Hin ji van kovaran, mirovekî berpirsiyariya wê dikir, ku salê deh rûpel bi zimanê kurdî ne dixwend. Çi kovarên partiyan û çi ên serbixwe armanca wan dagirtina rûpelên kovaran bûn, ji bo kesî ne xeyidînin (endamên partiyê), hema çi ji wan re biçûta, belav dikirin. Eger ji xwe pesnê serok û yê partiyê ba.

3-Rexne, mixabin ku hêsta rexneyê rêya xwe di kovarên me de nedîtiye; tîrsa rexne li ser nivîskarî heye (ewê di rastî de n enivîskar e) Eger rexne bibê jî, li ser binge-hên zanistî nakin; bi serê xenceran hestiyên hev kun din. Rexne li rex mirovên zana avakirin e, lê li rex me herifandin e.

4-Xwendevanên kovarên kurdî gelek hindik in û ev jî vedigere ser çend hoyan:

1-Berpirsiyariya herî mezin di stûyê tevgera kurdî de ye; ji ber ku ziman û toreya kurdmancî di ser guhê xwe re avêtin. Di bin siha siyasetê de û bi hoya şerê navbendî, ji kultura xwe re tiştê ne kirin. Rastiyek heye û hûn hemî jî dizanin, li Başûrê Biçûk an jî em Rojava bêjin, yek ji sedî ji civaka kurdî, di mala xwe de bi zimanê erebî (biyanî) na peyive. Û hûn dizanin ku gelek hene hîn bi zimanê erebî nizanin biaxivin, nemaze jin. Û ji beriya bîst, sih salî, di mala kurdewarî de zimanekî kurdî î xwerû hebû. Û tevgera me dikarîbû kultura kurdî ji gelek mijaran ve, ji windabûnê rizgar bike. Û dikarîbû li dirêjîya çil salî bizava wêje û zimanê kurdmancî gelek bi pêş ve bibe

Dixwazim bêjim: Eger weke rojên pêşî ji damezrandina partiyê û li ser wê bizavê bimana û rê ne guhertana; ew tevgera xweferkirin û guhdana bi ziman û toreya kurdî sist nebûya û çapemeniya partiyan ji sedî pêncî jî bi zimanê kurdmancî ba; ez di wê baweriyê de me, ku tevgera çand û çapemeniya bi zimanê makî gelek bilind dibû û gavin fereh ê bavêtana; cihê pesn û serfiraziya me hemîyan bû.

Ji deh salan vir de fersendeke mezin ji me re hat; di bin perda bédengîya dewleta Sûriyê de, tevgera kurdî ji bo çand û çapemeniya kurdmancî, dikarîbû karekî hêja bike. Lê mixabin ku tevgera me a siyasî ew fersend ji destê xwe berda.

2- Rewşenbîrên me yên ku şhadên bilind bi dest xistine, gelek ji wan hene ku xwe pis dikin û xwe ronakbîr dibînin, lê çanda ku bi zimanê dê ye, zimanê gelê wî ê bindest e, ageh lê nîne û gelek li xwe giran dibîne, eger rûpelekî ji kovareke kurdî bixwîne. Nayê bîra wî dema ku naxwîne, çanda xwe bê biha dike û bi vê yekê zimanê me li paş dimîne; dema ku xwendevan nebin, ezê ji bo kê binivîsim!

Pirtûka (Xoybûnê) a Mihemedê Mele Ehmed, di sala 1993an de min wergerande

ser zimanê kurdî. Min û Mihemed me got divê em wê bi zimanê kurdmançî çap bikin, ji beriya ku bi zimanê erebî derkeve; da ku hin kes hebin vê pirtûkê bixwînin; çî kesê ew pirtûk didît, keserek vedida û digot: Xwezî we ev pirtûk bi erebî derxista...

Mamosta Hejar di hevpeyvînekê de bi vê wateyê dibêje:

"Eger mirovê kurd bixwaze, di şeş mehan de dikare hemî zaravayên kurdî fêr bibê. Zarav (devok), zaravên me ne û em hemî li dibistanan fêrî tîpên latînî bûne; gelo çima em nikarin kovara û pirtûkna bi zimanê kurdî bixwînin?"

Çil sal xebata siyasî û ta niha tiştek ji mafên civakî ên siyasî me bi dest ne xistiye. Rast e dijminên me xurt in, rewşa welatê me û a dinyayê em neçar kirine, lê ew xebata ji bo mafên rewşenbîrî, ka me çî jê re kiriye? Eger em bi xwe di mala xwe de nikarin û xîret nakin hinekî xwe biwestînin û hînî xwendina zimanê xwe bibin. Eger me ziman û toreya xwe bê biha kiriye, naxwe çima em doza mafên rewşenbîrî li dewleta Sûriyê dikin?

Ji heşt kovaran, kovara *Pîrê* bi tenê maye, bi rastî girîyê min li ser wan kovarên kurdî tê û di şîna wan de, ezê bi rengêkî dî gilî û gazindên xwe bikim û hinekî li ser wan bilorînim:

Darbestek, dudo, sisê... bi rê zin. Darbest pênc cin, her pênc jî, neviyên Hawarê ne. Bi hevpişkîyê (hevbandîyê), nizanîm li kîjan warî, li bayê kîjan babilîsokê, di keviya (bihareke) bê rewayî axlêv de, û di goreke bê kêl de, di çaroka reş de, ew veşartin. Pênc kovar, neviyên Dapîra Hawar, li Kurdistanê biçûk, di bermala çanda kurdî de, bi hev re ew bingor kirin.

Li encamê civînekê ji aliyê komîta Hevbandî, pênc partiyan xwediyên çar kovaran (Gulistan, Gelawêj, Stêr û Xunav) digel xwediyê kovara *Zanîn*, biryareke dîrokî dan û ji bo karekî weha (ne hêja?) pênc darbest, ji bo pênc kovaran amade kirin. *Gelawêj* û *Stêr* ji nav dilê asmanê tore û zimanê kurdî hilkirin. *Xunav* jî di zikê ewran de ziwa kirin. Vêca li ser termê van hersêkan, herdu xuhikên wan; *Zanîn* û *Gulistan* di nav tariyê de, bi agirê windabûnê şewitandin. Paşê li demsaleke, di bin asmanekî bê stêr û gelawêj de, li axeke bê av û xunav, bê zanîn û gulistan, li gora gotina wan xweşmêran (xwediyên biryarê) ê (Biharek) di zeviya çanda kurdî de şîn bibel?

Di vî warî de, nizanîm stîrî, dirikan bi destê kê biçînim?


Tiliya xwe ber bi rûyê kê ve dirêj bikim? Sed mixabin, ku ez nizanîm gilî û gazindên xwe li rexê kê bikim? Gavekê bi pêş de davêjin, lê pêncan bi şûn de dizivirin. Kovareke ku navê wê *Bihar* e, bi navê Hevbandîyê derêxistin, gelekî baş e. Lê, ji bo



bihayê vê kovarê, pênc kovaran rawestînin û dernexin, wa bizanîm şaşiyek e, gune-  
hê wê jî gelekî mezin e. Pênc çirayan di jorê kultura kurdî de vedimîrînin, da bika-  
rin dohnê çirayekê pêk bînin. Gelo ma ev jî me re ne şermezarî ye?

Çiqas kêmayîyên van kovaran hebûn jî, lê başiyên wan jî gelek bûn; di riya van  
kovaran de, xwendevan û nivîskarên zimanê kurdî çêbûn. Û îro jî me nivîskarên  
hêja hene ku navên xwe di dîroka çanda kurdî de çandine... □

## Çend perçe ji romana *Wêran*



LALÊŞ QASO

### Beşê yekê

Hertiştî mîna sehera sibehê nuh dest pê kiribû; hertiştî mîna memikên keçikan serî hildabû; teze, geş û xweş bû. Hertişt wek navika bûkan şên bû û gulav difûrand. Jiyan tevdilebitî. Biharê bi gulên xwe ên rangareng deşt û çiya neqîşandibûn. Tîrêjên rojê kişiyabûn erdê û di qûntarên çîyan de mîna çirûskên tenûrê diçirisanandin. Teyr û tilûran xwe di xeml û xêza biharê de raxistibûn û di nav perên ewran de bi hev re şa dibûn. Şalûrên ku her yek ji wan mîna şahnekê bi rûyê ezmên ve xuya dikirin, li cihê herî bilind sekinibûn û li refên kevokên ku ji borangehan difirîyan, temaşe dikirin. Bi şerqe şerqa baskên wan re erd û ezman direqisî. Gewdên darên ku koka wan bi erdê re bûbûn yek, mîna termên nav mayînan di nav pûş û pelaxê de vepelixîbûn. Û gîhê jî mîna ku sirekî veşêre xwe li wan rapêçabû û heta bi şaxikên herî piçûk jî nixumandibû. Siha darên ku ji berqefên zinaran dikişîyan, gulgulî vedabûn. Bi hatina biharê re hertişt şîyar bûbû û bi lez tevdigerîya. Lêbelê şer û pevçûnê bêhn ne dida tişteki; kaniya di mêrga xatûnan de çikandibû, rê li ber hertiştî girtibû û wek banga sibehê ku bi destpêka xwe re dawî li xwe dianî, hertişt dişewitand û winda dikir.

Ewrên belek belekî di ser Zorava re hevdu pîne dikirin û ber bi rohilat de diherikîn. Ezmanê ku ji hêla Serhedê ve şîn vedabû, di nav darên behîvan re wek ava okyanûsan xuya dikir. Barana şevê xwe bi nav biharê de berdabû, gîha şûştibû û bûkî-

na dawî jî di kulîlkan de vekiribû. Erd têt av bûbû. Hilma axê têkilî hilma gul û rihan û nêrgizan bûbû û hawêrdor difûrîya. Gîhayê ku serê xwe wek tîrên nijdevanan ber bi rojê de rakiribû, di bin baqên tîrêjên wê ên zêrînî de diçirisan û bi bayê sibehê re diricîfî. Kurmikan xwe pê ve daliqandibûn, serî dikurisandin; kêzikan kok dixwarin; kulîyan dabûn nav û dipelixand; û karwanên gêrikan jî bê piştî û bar, berê xwe dabûn çol û beyar û goristanan. Mîna ku ji ber pêlên êgir direvîyan, bêserûber dabûn ber hev, bê reqş û sema li hev dinerîn, bê reng û ceng tevdigerîyan û bi lez diçûn. Deng ji axê dihat, ax diherikî qeş û koncalan. Gul û nêrgiz û teyrîkên ku pê dijîyan ne rehet bûn. Qore qora refekî qulingan di nav ewran re, bi haweyê ku wê derek bişelîhandana, dihat. Çûkên ser hêltnê bê hizûr bûn. Deng ji şalûran ne dihat. Li hewa jî xuya ne dikirin. Bûmekî xwe li ser darên guhîjên binya gund danîbû, her ji bêhnikekê mîna ku dixwest tiştinan bibêje û kes lê guhdarî nake, bi lez şaxê darê dinikiland, dengêkî fetisî ji qirikê derdiket, difirîya ser dareke din, li wir jî mîna berê dikir û dîsa difirîya ser dareke din. Gava ku bê pêjin disekinî jî, tam diruvê axan pê diket.

Bi girîniya terempêla ku dihat gund re firîya. Terempêleke eskerî bû. Di cîhê xwe de tibabekî baş bilind bû, li hewa sekinî, baskên xwe mîna konekî ji hev vekirin û li gund temaşê kir. Piştî çend kêliyan, bi haweyê ku xwe dade nêçîra xwe, ser-serkî hate xwarê, ji lapûşkan ve xwe bi çiquliyekî darê ve daliqand û ha ha vir û wir nikiland. Ji kuştina Sarê û Heso û vir ve karê vî bûmî ev bû. Çend carekî Cîrcîs çifte jî berdabûnê; lê ne xistibû û dû re dev jê berdabû.

Terempêl li ber deriyê Cîrcîs sekinibû û gundî jî li dor wê bûbûn dîwar. Dîwarê ku ji insanen çêbûbû, ji hindama darên guhîjan feşkilî xuya dikir. Pîrek vê carê di nav komê de tune bûn. Zarokan wek kevokan xwe dabûn ser hev, ketibûn pişt wan û di bin guhikên perdên pacan re li komê temaşê dikirin. Hemîyan jî mîna ku zimanê xwe daqurtandibûn, bê deng sekinibûn. Roja biharê bi qasî ku di kulekên berzikên xaniyan re derbasî hinduran bibe, nizm bûbû. Çûkên beytik bi çirt vîtkên xwe ên ser tîngan re memnûniyeta xwe li himberî rojê didan xuyakirin. Birek kûçîk li navtara gund li hev civiyabûn. Ū hemû jî li bendî ku hema yek ji wan devê xwe ji hev veke û ên din bi hev re êrîşî ser wî bikin. Gişan jî tengijî xuya dikirin. Lingên xwe ên paşî bi erdê ve dixijiqandin û habela li dora hev dizivîrîn.

"Bila Cîrcîs axa jî bê vir!" û di nav zilaman re wek dîkê ku bide nav mirîşkan çû û hat.

Cîrcîs di kuleka qesrê re lê dinerî. Ji wir bang kir:

"Ha ha Atilla beg, hema ez têm!.."

Gotin û harina wî bû yek. Di xwe re ne gihabû ya jî ji bîr kiribû ku bi ser şerwêl de divabû qutikek jî li xwe kiriba. Tena fanêrê sertazî û xwas hatibû. Pîrça sêngê, sertaziyê wî ê debixî hildabû û zik bi sêngê re kiribû yek. Ji navikê û berjor de derba cewdikê paleyê bi Cîrcîs diket. Şerwalê wî ji toz û terabêlka eşêfa nav rez gewr bûbû. Devdelingê wî ê çepê fetiqî bû û navranê jî hinekî sist xuya dikir. Tilîyên lingê wî ê rastê di xwînê de mabûn. Tilîya mezin li keviyekê neqebê ketibû û nenûkê dabû goşt. Rûyê wî mîna rûyê rêwiyê ku di dûrbînê re xuya dikir, tevlihev bû. Çavên wî ên qels tam westîyabûn. Bi tirs bû. Serê wî ê tazî wek gula ku li ber bê dihejiya, bi vir de û wir de ditewiya.

Xwest ku rahije destê Atilla û xêrhatinê tê bide. Lê Atilla xwe paş de vekişand û destê xwe nedayê. Û hema wilo pê re jî destê xwe mîna şûrekî bi ser de hejand:

"Tu bi dewletê re xayîn derket, Cîrcîs axa!" Ji dil kenîya, "Niha bi rastî, tu bi xwe bawer dikî ku tu ê bi wî serê xwe ê wek şimamokekê bikaribî li himberî me siyasetê bimeşîn(!) Na na, eman eman! Dibe ku mirov bikaribe herkesî bixapîne, lê mirov tu carî nikare dewletê bixapîne. Ên te du çav û du guh, ên dewletê çar çav û çar guh hene." Vê carê jî xwe hêrs kir, "Tu û Reyîs hûn ê li hevben ha! Tu ê terorîstên wî bihewînî mala xwe, tu ê bi wan eşqîyan zarokên xelkê û eskerên dewletê bidî kuştin, hi!.."

Cîrcîsê ku li himberî eskeran jî dêvla temamê gundîyan him difikirî û him jî dipeyivî, dev ji xura piştî stuyê xwe berda:

"Terorîstên çî begê min..."

## Beşê pêncan

Dawîya sala 1996an bû. Rengê kuştinê li çîyan bi haweyekî û li gund û bajaran bi haweyekî bû. Li çîyan dest, ling, ser û guhên mirovan jêdibûn û çavên wan dihatin xerimandin; li gundan bi kevir û daran, derbên qezetoran û xenceran û li bajaran jî di hindurê malê de, li ber deriyê dikanan, di hindurê mizgeftan û sikakan de mirov dikuştin. Li çîyan kuştî binax ne dibûn; li gundan bi rojan term li erdê diman; li bajaran bi êvarkî re karmendên beledîyê term radikirin goristanan; neşûştî, bê kefen, bê selewat û tekbîr, qîr û halan, terqîn û mele, bi dozerê vedişartin. Ji balafirên bombe dihatin xwarê, agir bi dar û devîyan diket. Êgir li rihberan dilîst. Çîya di nav dûmanê de diman. Insan perçe perçe dibûn. Û bi insanan re teyrik û tilûr û teba jî dişewitîn. Bêhna kelaxên zîvar zîvarî ji her derê çîyan difûrîya. Insan di nav paletên tenqan de dibûn nanik. Bi derbên topan, zinarên herî bilind hildiweşîyan.

Bi gulên panzer û tenqan kolanên bajarên, bajar li erdê sekinîbûn. Mirovên jîr û zana di êşkencexanan de mîna pez digurandin...

Li Omerîya, Torê û Xerza çûna çiyê qedexa bûbû. Li herêma Botanê û derên din jî wilo bû. Li gund û bajarên wek Nisêbinê hema hema ji her malê mirov hatibûn kuştin. Bi şînê re xizaniyê girtibû herêmê. Ji bilt maldaran herkes birçî û tazî bû. Nexweşiyê mîna ewrekî xwe dabû her derê. Dewlemend bi qasî ku kolanên bajarên û pesajên dikanan bikirin dewlemend, û feqîr jî bi qasî ku li parsê bihesilin feqîr bûbûn. Tebaqa navîn ne mabû. Gelek keçan û jinên bi zêc û zaro, xwe di ber çengek savar û birinc, çemçikeke rûn û bi çend nanekî difirotin. Kultur û exlaqê civakê ne mabû. Çerxa civakê bi darê zilm û zorê digerîya. Li gundên ku bi pîberayîyê xwe li ser lingan hiştibûn tîmekî mezinahî, li navçeyan yuzbaşî û bînbaşîyan û li wîlayetan jî generalan hikim dikirin. Wâlî hebûn, qeymeqam, hakim, sawcî û reyîsên belediyan hebûn. Lê hemû jî ne li ber tiştêkî bûn. Hemîyan jî di bin emrê eskeran de kar û barê xwe dikirin. Li herêmê du şiklên hîlbijartinên belediyê hebûn. Xelkê piştî ku hîlbijartina xwe dikir, eskeran jî hema di eynî rojê de zir teriyêke "terorîstî" bi dû ve dikirin û ew rêyî êşkencexanan dikirin. Heger di êşkencexanan de nekuştana jî, ji wir derdixistin mehkemê û di girtîgehên de ew dirizandin.

Li her gundî komeleyek, li her navçeyê hikûmetek û li her wîlayetê parlamento-yek hebû. Û hemû jî ji eskeran, 'muxbirçî', beqçî û polîsan pêk hatibûn. Selahîyeta beqçiyekî bi qasî a qeymeqamekî, a polîsekî bi qasî a walyekî û a eskerekî jî bi qasî a generalekî mezin dihat. Berpirsiyarê mafê insanan esker û ê daristanan jî pîber bûn û hemîyan jî insan dikuştin û daristan dişewitandin. Ji wan bêtir kesekî behsa heq û hiqûq, qanûn û edaletê ne dikirin. Û bi qasî wan jî tu kesî pê li heq û hiqûqê ne dikirin. Jiyan bi avê hebû. Av ji ser bajarên qut dikirin. Qebloyên elektrîkê bi damarên dilê wan ve hatibûn girêdan. Çawa dixwestin wilo dikirin. Kanalizasyonan bajar genî kiribûn. Li postexanan beqçîyan kar dikir. Li nexweşxanan dîsa beqçî û polîs bûn. Li herêmê doktorên sîvil bûbûn qaçax. Eskeran ew karê heqîmî-yê jî dikirin...

Çekdarên Reyîs di bajarên de bi qasî ku nikaribin mirovan bikujin û xwe di qul û qulêran de veşêrin, qels ketibûn. Eskeran ji hin kurdên santore û kurdên ku çekdaran zikê wan êşandibû, komik bi komik xwe pev xistibûn, bi demaçe û kincên sîvil digerîyan û li vir û li wir mirov dikuştin. Lêbelê dîsa jî kuştina herî bi xof, "Sofîk"an dikirin. Vê rêxistina ku bi navê misilmanîyê derketibû meydana şer û xelkê navê wê kiribû «Sofîk», di bajarên de piştî ku du-sê polîs kuştibûn, hilfa xelkê û gelek esnafan kişandibû û dû re jî berê xwe dabû hemîyan, piştî xelkê herêmê şike-

nandibû. Mîna kerîyên wawîkan deh deh-bîst bîst ji vê malê xwe dadidan mala din, bi keleşkof li kolanên bajaran digerîyan û her kesê ku bêhna kurdayetîyê jê dihat, terîyeke "minafiqîyê" pê ve dikirin, "Zilamê Reyîs e" digotin û bi haweyekî barbarane dikuştin. Di şerê li himberî wan de, bi rastî jî çekdarên Reyîs demeke kurt, baş li ber xwe dan. Xelk parastin. Kuştin û hatin kuştin. Bi vekîşandina wan re sofîk xurt bûbûn û koça mezin dest pê kiribû. Ji Nisêbînê, heta ku sofîkan mirovekî bûnistrî di hindurê malê de û li pêş çavên kufletê wî ser jê ne kiribûn jî, karwanê koçê bi qasî ku hin kolan bi carekê ve vala bibin ewqasî mezin ne bûbû. Lêbelê bi kuştina yekî darî re ev koç gihabû bandevê. Sofîkan, mîna malê mazatê kuştin pêşkêşî xelkê kiribûn û digotin "Tu çawa dixwazî em ê wilo te bikujin; ji xwe re rengêkî kuştinê hilbijêre..." Hemoyê darî jî ji wan xwestibû ku zarokên wî hemîyan ji hindur derxînin, xwe têxe nav livînan, lihêfê bikişîne serê xwe û bê kuştin. Wilo kiribûn. Lê carinan jî li mirovê ku wê bikuştana guhdarî ne dikirin. Li Batmanê keçeke xerzî bi sebeba ku pantor li xwe kiribû û bi ser de jî sêngvekirî û servekirî derketibû sûkê, li ser rayên trêne girêdabûn û trêne jî ew perçe perçe kiribû. Li Farqînê jî jinek avêtibûn tenûrê. Li ber devê derîyê lîsa Qosarê zendê keçekê kêr kiribûn. Keçik zendtazî bû. Li Nisêbînê jî li çend keçên pazdeh-şazdeh salî wilo kiribûn.

Çekdarên Reyîs piştî ku bajar bi carekê ve ji insafa esker û sofîkan re berdabûn, vê carê jî temamê qeweta xwe li çîyan dabûn ser hev û bi haweyê ku maka temamê xerabîyê pîber bi xwe bûn, her roj êrîş dibirin ser gundên wan. Di her êrîşê de bi kêmanî deh-duwazdeh kes dihatin kuştin. Ji herdu hêlan jî mêt diketin. Lêbelê zembelîlkên ku ji xwîna zarok û heywanan di cokên xwîne re diherikîn, ji ên çekdaran û gundiyan jî pirtir bûn. Arpicîyên ku çakdaran bi kar dianîn, mîna topên osmanîyan ter û hişk didan ber xwe û derûdor di nava êgir de dihiştin. Li gundekî Torê bi tenê ji malbarkê, bi yek carê re şazdeh zarok hatibûn kuştin. Çekdarên ku zarok di propaganda xwe a li himberî ronakbîran de wek serweta welêt bi nav dikirin, bi şev girtibûn ser gund û dest bi dest bombe avêtibûn hinduran.

Şer exlaqê insanîyetê têk biribû; qedandinî ne mabû, hevalbendî û dostanî bûbû pere, herkes mabû li ber a xwe û li xerabîya hev digerîyan. Çerxa zemanê Kurdistanê bi şer re digerîya û şer jî zemanê wê bi qasî xwe bêexlaq kiribû. Bêexlaqîyê mîna xuya gur ji her derê welêt diçirisan. Hin dê û bavan ji destê xizanîyê keçên xwe ên çardeh-pazdeh salî mîna heywanan difirotin. Şer kultura hezar salan dabû ber xwe û talan kiribû. Şexsiyet bûbû wek ravên biharê. Qedir û marîfet bûbû devê tivingê. Hejêkirin dihat kirin û firotin. Têgeha zewq û eşq û zewacê ji zimanê wan derketi-

bû. Çemê ku ji goştên pevzeliqî diherikî mexzena laşên mîna rojên biharê, ziwa bûbû û rihberên di hêlînê de bi çêbûna xwe re fetisîbûn. Hertişt mîna karê êvare ku reşayê digirt ser, wilo nêvcî mabû. Bextewarî bûbû xeyal. Kêf û seyran û govend û dîlan ji gasînên gund û bajaran derbasî avanîyên polîsan, esker û rîman bûbû. Dengbêj û muzesyenên herf mezin li wir civîyabûn; muzîka herf xweş li wir lê diket. Pêlên şewetê ji wir bi ser gund û bajaran de dihat xwarê û xwe li çîyan dixist. Xwe jar û hejar diditin. "Qedera me ye" digotin. Belkî jî rast bû. Heger wî xwedayê ku dabûn dû, hêsrî pişka ezî ne daba wan, çima wê ew qederên ecêb û ecêb bi serê wan de bihata? Te digot qey herkes bi tena serê xwe li vê dinyayê bû; kesî ne dixwest kesî bibîne; kesî ne dixwest dengê kesî bike. Qey ew jî qedera wan bû. "Xwedê li ebdê xwe dihat xezebê, Xwedê li ebdê xwe dihat rehmê, Xwedê dilê herf hişk nerm û ê herf nerm jî hişk dikir", wilo gotibû dîne wan. Heta bi rivînên ku ji laşê wan diçûn jî bi hev re bûbûn dijamin. Rivîn ber bi hev de ne dihatin, xwe li hev ranedipêçan û hevdu ne dikişandin. Herkesî xwe bi qasî kêzîkekê didit. Helbet xwendinê zanîn û zanîne jî hêvî dida mirov. Lê tiştêkî wilo ne bi wan re û ne jî li ba wan mabû. Dijminên wan ên herf pîs û bi qirêj bûbûn kitêb. Aqilê wan mîna ê robotan bi gotinên desthilardaran tevdiogerîya. Te digot qey bi tenê çimekî mejiyê wan dixebitî. Tişt diditin, lê tiştên ku girêdayê tiştan bû ne diditin. Di nav zerazengên pîvokan de bi tenê deqa mezin diditin û hew. Mîna ku dinya li wan bûbû mahşer, xwe di nav valahîyeke bê dawî de his dikirin. Ne mercên dîna û ne jî ên civakî nas dikirin. Xerabiyê wek mîla pisûlayê berê xwe dabû herkesî û li ser textikê enîyê sekinîbû. Li ser enîya çekdaran jî. Eskeran çîya mayîn dikirin. Û wan jî rêyên ku ji gundan derdiketin, xaçerêyên çol û çîyan, çiv û zîvonekên sikakên rezan mayîn dikirin. Bi van mayînan jî gelek kes hatibûn kuştin. Û pirên wan jî zarok bûn.

Ji çar alîyên welêt insanên ku agir li xanî û avanîyên wan, li mal û milk û mizgeft û Qurana wan dilîst, mîna gêrikan dikişîyan Diyarbekirê, Tirkîyê û Ewropayê. Çayî bûn, deştî bûn, gundî û bajarî bûn. Di nav wan de axe, eşraf, beg, şex û mele hebûn. Dewlemend hebûn. Ên ku qet bi êşa birçîbûnê nizanîbûn, qirêj û gemar ne dîtîbûn dinav wan de hebûn. Û hemû jî talan bûbûn. Çîya û newalên xwe, deşt û zozanên xwe, gund û bajarên xwe berdabûn û bi dinyayê de terqîyabûn. Sekin ne diket karwanên koçê. Ne malbatek û deh-duwazdeh hezar malbat, ne eşîrek û çil-pêncî eşîr, ne gundek û du-sê hezar gund, ne navçeyek û pêncî-şêst navçe bû ev. Karwanek dihat ê din bi dû de bû. Kom bi kom, qor bi qor, pêl bi pêl û bêwestan dihatin. Ferman bû. Halan bû. Talan bû. Lêdan û kuştin bû. Dê weledê xwe avêtîbû!.. Ji her derê Diyarbekirê dengê insanan dihat. Te digot qey mahşer e. Her der

tije insan bûbûn. Bi deh hezaran zarok di kuç û kolanên wê de ji nêza digirîyan; bûbûn parsek û mal bi mal digerîyan. Kal û pîrên ku bi ser êşa xwe de dinaliyan, mîna kûçikan di nav kevnoktên rizyayî de û wilo li ber çavên herkesî bi ezabekî pîs dimirin. Bi deh hezaran gundîyên birçî û tazî xwe dabûn ber Bedenê da bistirin. Lê stara çil.. Di qul û qulêrên Bedenê de her sibeh pênc-şeş zarokên ku serê wan ya li ser kevirekî reş û ya jî di navbera du dîwaran de, tilîkên wan di devê wan de û bêcan vezilyayî dihatin dîtîn. Dayîk di bin lat û berqefan de dizan. Deh çêdibûn, neh dimirin. Ji bîst dergûşan du-sê dergûş. Bi sermê re diqerisîn, bi germê re difetisîn. Beden bi bedena wan re bûbû yek. Ew Bedena ku bi stûnên tarîxa wan bilind bûbû û tîr û rimên împeretoran nikarîbû derbas bikira, gurzên fêris, betil û pêhlewanan nikarîbû çimikekî wê bifiranda, topên kemalîstan nikarîbû qul bikira, mîna beretan li erdê pijilî bû. Vir bûbû goristan; goristaneke ku bûbû stara hêsîran û di birçên wê re dergûş difirîyan Çemê Dîcleyê. Zarokên ku mîna gwêşiyên tîrî, mîna mêşên hingiv, mîna kulîlkên biharê di kulekên tarîxa wê de xwe bi ser hev de qijilandibûn, dihatin xwarê û perçe perçe dibûn. Ji her derê vê Bedenê dengê qîr û hewar û nalînan bi ser bajêr de bilind û bilind dibû! Kortikên çavên xatûnan ji girî, mîna newalan kûr çûbûn. Lêvên kezîreş û kezîzeran çilmisî bûn. Çavên wan ên xumarî, mîna ezmanê ku barana xwe dibarand, di nav reşaya xeşimên bedenê de çênî xuya dikirin. Lê westîya bûn. Melûl bûn. Zarok hestî û çerm mabûn. Li vir jî bi dû wan de bûn. "Wey li minê! Ax li minê! Haho li me bêkesan!.." Li wan dixistin, digirtin û dikuştin. Li vî bajarê ku tije kerxanên seyar bûbûn, tîman li derîyê herkesî dixistin. Polîs û tîman mê û nêr herkes di êşkencexanan de şilftazî dikirin. Dikuşt û birîndar dikirin. Ji Çemê Dîcleyê xwîn diherikî. Li ber derîyê her dikanê, li ser her rêyê, di kuçên herî ronî û tarî û di nava sûkan de esker û tîm sekinîbûn. Tenqan bajar rapêçabûn. Panzêran duryanên rêyan zêft kiribûn. Erêêê!.. Vir dilê Kurdistanê bû, zend û çepilên bakur, başûr, roava û rohîlat bû. Qîral û qeranan, padîşah û mîrekan li vir di berpala memikên dilberan de govenda herî mezin gerandibûn û hikim li Mekê, Medîne û Qudsê kiribûn. Betil û pêhlewanan ji vir xar berdabûn "Selefên Siwarên Kufre" û di çol û beyarên ereban de dabûn ber devê şûr û rîman. Împeretorek ku devê dinyayê diçirandin hêsîr kiribûn. Fêrisên herî bi nav û deng, birêvebirên herî jîr û zana dîsa jî li vir bi dar ve bûbûn. Erê!.. Vir wilo bû, îcar gelo li nav tirkên çawa bû? Ne av û ne xwarin, tiştêk di ber wan re ne digiha. Didizîn, direvandin, bi şev diketin malan, devê xwe li ber herkesî xwar dikirin, fêkiyên xerabe didan hev, çi tiştê ku bi navê xwarinê didîtîn radihiştênê û dixwarin. Bajar di bin wan de ketibû. Dilê dewlemendan pêşî bi halê wan şewitîbû, dû re ji



wî dilf qetran herikî û pişta xwe dan wan. Ji herkesî bêtir dikandaran nefret ji wan dikir, ji herkesî bêtir xwedîyên aşxanan dijminayî bi wan re dikir û erza wan dişke-nand; ji herkesî bêtir nanopêjan ew ji ser tenûrên xwe diqewirandin; ji herkesî bêtir eskerên ku nobet li ber deriyê firinan digirtin li wan dixist û ew diavêtin erdê. Û ji herkesî bêtir feqîrên ku serê wan li hedan diket, bi halê wan digirîyan û ji devê xwe dikirin û didan wan. Sêng û berên xipşên xezalan bê gokên zêran, newqa zirav bê kember, tiliyên maşikî bê xekek, hingulîsk, bazin, xixal, xizêm û guhar mabûn. Bi zatorê ketibûn, bi janazirav û tîfoye ketibûn. Mirinê mîna tîm û eskeran, piçûk-mezin herkes dabû ber xwe. Melkemot li wan bûbû agir! Rê û rêwanî di goristanan de ne mabû. Û temamê goran jî bê nav, bê kulîlk, bê rihan û gul û nêrgiz bûn. Erê!.. Vir Diyarbekirê bû. Lêbelê li Wanê jî wilo bû.

Li kabên xwe dixistin:

"Ax ku hema min ji van zarokan re çengikek şekir peyde bikira. Lawkê min, vî şekirkî bixwe da ber dilê te bigire!.."

Mîna wawikên nav mayînen binya Zorava bi ser Xwedê de dizûriyan:

"Şêrinê ber dilê dîya xwe, rihê min, tu ê bi kurtêlên bermîlên çopê nexweş bike-vî!.."

Zarokan girtibûn her derê. Û ji her derê mîna cewrikên kûçikan dengê nûze nû-za wan dihat. Mêr bi jinê re, dê bi bavê re, xwuşk bi birê re ji ber deriyê vê aşxanê ber bi deriyê a din de bazdidan. Ew bêertz dikirin. Lê wan nizanibûn ku birçîbûn çendî zor e. Birçîbûn bêexlaq bû, birçîbûn isyankar bû, birçîbûnê ew "şeref û namûsa ku ji islamê girtibûn" nas ne dikir. Û heta bi Xwedê û pêxember jî bêminet dikir. Birçîbûnê li tişteki guhdarî ne dikir.

Xwe li ên bi qerewat digirtin. Qerewat remza medenîyetê bû. Wilo xistibûn serê wan.

"Ez xulamê te me çend qurûşekî bide min da!.."

"Siktir ol pîs terorîst! namûsûz evladi!.."

Xwe li dikandaran digirtin û bi îske îsk digotin:

"Ez di bextê namûsa te de, zarokên min xwas û şilfîtazi ne!.."

"Biqeşite!.."

Jê dipirsîn:

"Ma li ser çi? Ji bona çi?"

Digirîya, porê xwe dikişand, li serê xwe dixist, dev canê xwe dikir:

"Ji min nepirse! Nepirse!.. digot û xwe ji ber çavan winda dikir.

Mîna ku kesî kes nas ne dikir, her yek ji alîyekî dinyayê hatibû, ji hev fedî ne di-

kirin. Belediyê car carê bi qemyonan nan belav dikir, hemîyan bi hev re êrîş dibirin ser qemyonan. Li vir dîsa zarokên ku nan dipûrisandin, di nav lingan de telef dibûn. Pîremêr û pîrejîn jî. Ji bilî esker û polîsan, bi kelbetanan jî mirov nikaribû devê wan ji hev vekira. Bi qasî ku çekdar ji Reyîs ditirsîyan, ew jî wilo ji hev ditirsîyan. Wan jî mîna çekdaran ji hev re ne dixwest û bi şik li hev dinerîn. Reyîs mîna ewrekî reş bi ser mejîyê wan de nixumîbû. Wek ku cin ji hesin bitirse wilo jê ditirsîyan.

"Ev yextiyarê ku di nav van potikan de xwe bi ser hev de qjilandiye, pîber bû, nêzikî wî nebe, ha!.."

"Binere, lê binere, hefza xwe ji wî zilamê ku di devê wê berqefa tarî de rûniştiye, bike!"

"Çi kiriye, çi, çi?.."

"Eskeran di mala wî de bi hevalekî re kurekî wî kuştibûn û hevalan jî ew xayîn ilan kiriyê!.."

"Kuro rebeno, ev kalekwîrkê ku li wê navê digrî, ma ne melê mizgefta Mehela Qijlê bû, hi?.."

"Keçê hişş dengê xwe neke, hevalan jê re 'Meleminafiq' digot!"

"Ê ne te nedît hevalo, bê min şevê din ew hirmeta han çawa dikila!

"Bi çi qasî?"

"Bi heqê xwarinekê."

Hemîyan jî xwe têkçûyî didîtin. Bi destpêkê re ji wan re gotibûn, hûn dê û bav û kalên me ne. Wan jî bi çavên dê û bavîtyê li wan nerîbû û hertiştê xwe dabûn wan. Azadî xweş e, serbestî rûmet e, gotibûn. Bawerî bi wan anîbûn. Xelasî bê mal û can nabe. Mal û canê xwe jî pêşkêş kiribûn. Xwe bikujin!.. Xwe perçe perçe kiribûn. Xwe bişewitînin!.. Xwe kiribûn xwelî. Yek ji bo hemî, hemû ji bo yekî. Wilo kiribûn. Yek bi hemî û hemû jî bi yekî. Ketibû serê wan. Hemû bûbûn bahola Reyîs. Lê Reyîs jî mîna cesedekî bû. Ne têhna jîyanê jê diçû û ne jî bêhna jîyanê jê dihat. Rewşa ku ketibûnê tiştê di bîra wan de ne dianî. Ji rojê ditirsîyan, lê ji şevê hîn bêtir. Şevên Bedenê bi qasî giraniya wê giran bûn. Bi reşaya êvarê re deng û rengê wan yekser dihat guhertin. "Wey li minê! Lolo bira! Ax lê dayê! Haho babo!.." Bi dengê qîr û hewarên wan qada Zulcelêl, erd û ezman û Diyarbekirê mîna hêlanê bi dinyayê re dihejiya. Lê tu kesî jî ew deng ne dikir. Aha..

**Not:**

WÊRAN dewama romana Laleş Qaso a bi navê «Xezbe Azadiyê» ye. Û Xezbe Azadiyê jî dewama romana wî a bi navê «Sê Şev û Sê Roj» e.

## Weberhênana Kulan

bihar batiye dibêjin, gumrah gumrah  
esman strana qir û sayî  
li derve artêşa jinan  
qereqol dane ber keviran  
heqê Adarê didin

di vê hêlanê de çawa kiriye niza'm  
azadeyara min pekiya hundir  
ji aşxaneyê malnişînbûyî  
wekî her carê zêde şêtane û xwedî karvanî  
li qewsikê zêde kiriye  
takkulîlkeke stûşikestî û bêhnên têkelhewa  
bihar aniye wê bi xwe re

min got qey ev e Adar  
hemî mehên din weberhênan

**KAWA NEMIR**

# Mirina di ber nêçîra evîna serberdayî de



SERKAN BIRÛSK

Masiya min.

Di destê min de şewka min li ser mesîlekî li benda mesiyekî me. Roj li serê min, masî xwe li şewka min dide. Nêçîr e. Rêwîtiya ber bi binê sebrê ve ye.

Xelekên avê fireh dibin û li rûyê avê vedimirin, ta-pa min binav dibe. Dikişînim. Çengelê min bê êm e. Masiyek devçiriyayî avê şîlo dike. Bi êşa rizgarbûnê, ew li dawiya mekanê xwe hukum dike.

Axa binê piyê min diherif e, ez gerî golê dibim. Bi kulman bi hêrsa xwe dikevim. Nêçîra min bi devê xwe yê çiriyayî bi min dikene. Kengiriyê me li valahiya ezmên pêt didin. Ewrên narincî, rojê di zerdika wê de zîz dikin. Em li dawiya roja xwe ronî digirîn.

Em ji avê der dikevin. Artêşa mozên sor bi hevkarîya zirkêtan êrîşî me dikin. Em dişewitin, ji tazîtiya xwe. Dûmana çixareya me li ser serê me ye, lê dîsa jî, em têne pêvedan. Em xwe bi kolika xwe digihînin. Çaya bi agirê pizotan bi firtênî tîna me datîne.

Em pasevanê şeva risqê ji evînê ne.

Heyv li çem diçûrise. Serê marê avî û reqê ji me ve xuya dike.

Qurîna beqê û şelpeşelpa kevjalê tevî xuşîna bayê şevê dibin û li dilê me sawa sahwêran peyda dikin.

Qudûmê naşîtiya me diçire. Çavên me li tirsî me mukur tên. Ricfa ku ji sariya sawa me der dibe, me mîna pelê payizê bi ser hevdu de dihejîne.

Lê em xwênîyên evîne dilên xwe bi yê hevdu germ dikin.

Lê em du ciwanên naşî gelekî ser bi êşî ne. Êdî zaroktî ji me ve xuya nake. Ne jî bîranînên me yê li peravê cokên avê di hişê me de zindû dibin. Em êdî xatirê xwe ji zaroktiyê dixwazin. Pê re jî ji hev. Em ji hev dûr dibin, mîna du şaxên ji darekê ne. Tenê bayê ku li pelê me dixê dengê me dibe digihîjîne hevdu.

Em bi dilên xwe bi hevdu ve girêdayîne. Hewlên min yê danûstandinê di dij-wariya dûrahiya zorê de bêncam dimînin. Lê ez serhişk im. Ez pê hesiyame ku têkilî esas in. Em divê têkildar bin. Ez dihingivim bîranînan. Lê tu naxwazî dûrahi bişkên...

Xezala min.

Ez li Şînbazokê siwar bûbûm û min berê xwe dabû geliyê Jiyanê. Min serê hespê xwe yê bayî berdabû. Ciwanîkê min yê dola bergîla avî û hespê bayî, ez li bayê bezê di ser hemû mesil û kendalan re, ber bi evîna di nava qalikê mirinê de difrandim. Min çiyayên ji reşê, golên ji xwînê, kortalên ji teqînê û newalên ji birînê li pey xwe dihiştin.

Min guhên xwe ji şîretên kalan xitimand û hewara pîran li ber firîna rimê xwe ber didan û ez diherikim. Min qêrînên dayikan û hewarên zarokan, li kevîyên gundan, ji firîna agir re dihişt û min xwe li asoya soringî ya di ser dilê min de mîna şî-şeke sor çikandî ve radikişand. Ez bi diranan diçûm asoyê. Lêvên min dihatin daxdan. Lê min aso di nava diranan de dişidand. Heta ku mejiyê min dileqiya, min aso ber bi xwe de dikişand.

Ez vediziliyam, ta ku ezman di kefa destê min de dibû hilmek û erd di nav simê hespê min de dihatê strandin.

Min berê xwe dabû qubleya dilê xwe û piştî xwe dabû hişê xwe. Di sehera ku bi tîrêjên rojê gewrik dibû de min nêçîra xwe rakiribû.

Xezala min xwe ji xiramê li pozê Agirî berdabû û berê xwe dabû ocaxa Pêxemberê nivîsê.

Xazala min ya li bayê bezê li ser sekûya dilê min mîna baletê ku li ber muzîka îlahî ji xwe biçe direqist. Ew di nava pêlên xweşiyê yê ji muzîkê de xewr dibû.

Wê bi hemû şaneyên xwe dans dikir. Ew pêtên bi rivîn yên li çavên wê dilê min li ber xwe devgirêdayî dikir. Wê bi tevgerên reqsvaniyê giyana xwe ji dilê xwe dişexitand ser bedena xwe. Hemû sirên bedena xwe yên veşartî pêşkêşî min lawikê reben yê dilzivistaniê dikir.

Û li dilê min yê qeristî germelehiya evîne radikir. Ez ji şehwetê dibûm pêlek agirî û di nava damarên wê de mîna lehiyêke pêş diherikim. Ez jiyana dibariyam li giyana wê û ew jî, mîna kulîlka zivistaneê şîr dihat li ser sînga min.

Min berê xwe dabû bihara vî welatê dil bi kul. Daristana ku bayê berbangê bêhna wê bi ser min de dianî, ji min û xezala min re bûbû tirata nêçîra evîne serberdayî. Xuşîniya ku ji pelan bilind dibû tevî xumîniya ava boş ya newelan dibû û em ber bi dawiya mekanê mirinê ve kaş dikirin.

Firehiya deşta Mûşe konê xwe li dilê min vegertibû lê di guhên min de jî hebû, vizîna bayê tebxê, ku sariya xwe ji berfa li serê Nemrûd ê hevalpişkê Sîpanê Xelatê hildigirt.

Ew bayê ku xwe di ava gola Wanê de hênîk dikir û di germava li biniya Nemrûdê de xwe germ dikir, rîşên hespê min li ba dikir.

Dişa dengê simê gan yên ku tevî tekelen virxunên qamûşvanan dibû.

Çend qijak bi qijîniê ji ser daran difiriyan û li ezmanê şîr ber bi rojava ve ji hukmê çavên min diketin. Rojê ew ji ber çavên min difirandin û ew di ronahiya xwe de dimihandin.

Roja ku destêpaka vêjîneê û dawiya wê tîne, bi aliyekî ji min ve xuya dikir. Ew mîna tawambarekî herimî bû. Lê dişa jî, wê xwe ji binî ji ber min hilnanî bû. Ew-rên qalind ku bi tîrêjen rojê yên qels sor dibûn, bi hesteke germ, ez ber bi xwe ve dikişandim.

Ez diçûm, berê min li daristana tije sir bû, her çiqaş ez di devê jiyaneê de ji piyan ve dihatim dabelihandin û hêrandin jî.

Darên mezin yên berûyan ez derbasî xwerista welatekî kevnare dikirim. Bi carekê re demê wateya xwe winda kiribû. Min xwe dadabû. Ez di navbera ser û binê bêdawayî de bi tevgerêke guncaw çûbûm û hatibûm. Ez di deydîka zemên de diçûm û dihatim. Çûbûm û hatibûm.

Min jî serê hespê xwe berdabû. Firîna firdikên hespê min tevî şîhîniya wê dibû û li çiyayên banî mîna hêrsa di binê Agirî de bi rûyê ezmên de diteqiya.

Hespê min geh mîna pilingekî li pey nêçîrê ji hev vediziliya, geh jî, mîna keroşkeke tirsiyayî dibû gilokek.

Felqeyên tehtan mîna guleyên topan ji ber nalên hespên min li zikê kendalan be-

reh û şikeftên bêbinî vedikirin. Nevbera min û nêçîra min geh teng dibû; dadiker çend qevzan, geh jî fireh dibû; digiha kîlometreyan.

Bêwestan û rawestan, me şev û roj mîna libên tizbiyan bi dû hev de berdabûn. Heta xezala min li şikefta Pêxemberê peyvan xwe ji ber çavan revandibû. Bi lez û bez peyabûm. Ez derbast şikeftê bûm. Li raserî min şewqek ji ilmê hebû. Herdu çavên min ji binî tarî bûn, ji roniyê. Min bi hêrs dengê xwe hildabû:

- Kalo min evîna xwe divê.

Kalo serê xwe hilda awirek ji nivê çavên min veda. Destê xwe bire ser rîha xwe ew bi nermî mizda. Bi herdu destên xwe pirtûka xwe hilda. Ew ber bi min ve rada. Min bi hêrs destên xwe li pirtûka wî da. Pirtûkê li ser zemîna şikeftê qêjînek îlahî veda. Bi hezaran tîp jê bazdan û ji ezmanan mîna terizên biharê bi ser zimanê evîna min de bariyan. Destên kalo ricifin, qermîçonkên li eniya wî beltir bûn, çavên wî yên westiyayî bi carekê re firehtir bûn û ew bi hêrs bi ser min de hil bû.

- Te nêçîra xwe ji dest xwe berda. Te qalik hil da û te evîn ji dil ber da.

Di dîwarê li pişt kalo de deriyek ji reşê vebû. Zihayek tê re peyda bû. Zihayê xwe rast bera nava pêxêrên nêçîra min dabû. Dest û pî li min şemirîn. Her tişt li ber çavên min reş bû. Berenakî reş î qîrî ez hilanîbûm li binê heft tebaqeyên erdê danîbûm. Teyrê miradan careke din ez li pêşberî kalo danîbûm.

Kalo sekinî bû. Li nava çavên min nerîbû. Li evîna min ya beden jehrî temaşe kiribû.

- Kerem bike. Rake xezala xwe, kalo gotibû.

Kalo bi carekê re bûbû bi hezaran çirûskên ji êgir û li ezmên belav bûbû. Bedenek ji evîne ziwakirî li ser hîzarekî neqîşkirî ji min re hiştibû.

Ruhê xwe dixim ber yê wê.

Min damarên bedenê kiribûn şirînek, da ez ji giyanê jîne dilop bi dilop biniquftînim sînga wê ya terîkî, da ez evîna wê bi lêvên xwe yên lexrikî ji striyên têlên xewnê berhev bikim û wan di bedena xwe de bitamînim.

Da wê bi rondikên çavan li kendalê bedena xwe mîna kulîlkên biharê şîn bikim.

Da bejna min mîna dargulekê li çolistanê, ji dora xwe ferq bike. Da hersî demsal di dora xwe de bibuhirin û دنیا li dargula li dilê min bihesile.

Bi vê mebestê min zend û bend li ber revandina te badan û min xwe li evîna te ya bêtevger rakîşand.

Di vê demê de min ji tayên pora xwe kindirek rêsa, ji bo te pê ji bîra jibîrbûnê rizgar bikim û te ji şevên tarî bi ronîya çîkên çavên xwe biborînim û li ser kabên

xwe bilorînim.

Lê hema di wê demê de navê te bûbû gezegezok li ser zimanê hemû zemînê û dengê strana dilreşiyê belav bûbû, li ser ezmanê govenda evînê.

Lê dîsa jî evîna te pizika li ser zimanê dilê min bû û her tim mîna kaniyê der bû. Evîna te li bedena min birîna bêderb bû. Hêsirên te yên ji şewata dîlîtiyê, mîna di-lopên findê dibariyan ser dilê min, û min xwe li dîwarê reş yê bêveger da. Min destê xwe ji cîhanê berda û bi destên te da, û min kolanên labîrentên qedere yek bi yek li xwe badan. Heta felekê careke din xwe mîna marê reş li me bada û kofendîla xwe li dilê me rebenan veda û destê me ji hev berda.

Lêgerînek bi hêrs.

Û careke din berê min ketibû nediyariyê. Vê carê ez siwarê ciwaniya ji xezebê bûm. Ez li te digeriya û li te digiriya. Di giyanê de dimeşiyam û ji peyvê diêşiyam.

Wê serê sibeha destpêka meha adarê ya ku biharê hîna nû dikir, xwe ji nava lepên zivistana dijwar ya welatê Serhedê rizgar bikira, min xwe li bêvegerê dabû. Çawa ku mijek li nava ezmanekî sahtî belav dibe, ez wisa li jiyane belav dibûm. Min jiyane yeker dabû ber xwe û ez pê de diçûm. Min ji jiyane re gotibû "keko birao! Tu hilîne ji ber min. Ma çend û çend ji te re? "

Ez bûbûm bayê sor û bi jiyane ketibûm.

Min ê hemû çavikên li darên tazî ketibûn berî pişkiwinê biteqandana.

Min ê nehişta dar bi çavên serên xwe biharê bibînin, bêhna kulîlkên xwe li xwe-rîstê belav bikin û bi fêkiyên xwe jiyane li benderihan xweş bikin.

Min ê bi hêrsa li ser dilê xwe bendek ji çavnebariyê li pêşiya gera cîhanê ava bikira.

Min ê gera jiyane berevacî kiribûya. Berê min li zivistanê bû. Ez û gera cîhanê li bingê hevdu ketibûm. Me ê bi darê qewetê bileyista. Min nig dabûn erdê û bi herdu destên xwe bi darê asoyê hişk girtibû,

û min ê bigota kurp û çerxa cîhanê ji binî mîna serîyek silk ji kokê rakira

û min ê ew li pêşberî çavên biharê liba bikira.

Lê çerxa cîhanê ez mîna marekî dabelihandim û ez ji dil ve dihatim ferikandin.

Mirin.

Di nava tiliyên min yên terikî de pîjek ji serhişkiya min, ez pê birîna li giyanê hûr hûr kûr dikolim. Serê min ji nava milên min mîna fêkiyekî gihayî ber bi dilê



min ve dixile. Ez giraniya çena xwe li ser dilê xwe hîs dikim. Girêza min diniqute ber pîjîkê min. Destên min dilerizin.

Lê ez bi dil û can gora gewdeyê me di giyana xwe de dikolim. Bayek axa kolayî bi ser dev û rûyê min de tîne. Ez bi zimanê xwe yê kişiyayî bagera axê tam dikim. Ji axa giyana min tameke bi bêrî li nava devê min belav dibe.

Li raserî min hebûnek heye, ew li ser dîwana dadê rûniştiye. Çavên min wî narefsilînin. Ez ji bo cara dawî hewl didim xwe. Ew fermana xwe dixwîne. Ez ji qam de mîna dareke kevnar ya çinarê gêr nabim. Tenê dilê me dipengize ser maseya dadê. Ew bi mîkutkê xwe dilê me di nava hevdu hûr hûrî dîke...

Baranek dibare, tovên di nava hevdu de kutayî berdide malzaroka axê...

Lehiyek radibe xerzên ji dilê me li golên evînê belav dîke...

Bayek tê me bi ser hemû kulîlkan û daran de direşîne... □

## Mexdûrên sala par

FERÎD HAN

Sala par  
melekan ji mirov re stêrk nedotin  
vexuran, çavgirtî vexwarin tariyê  
dizan dengê lingên xwe dizîn  
qûm, sist û pist  
şevnas, şev temirî meşiyar  
bûk, qederên reş welidîn.

Sala par  
aso hîç sor nebarîn  
kes bi sekana xwe hestîn nebû  
roj bengîn neçû ava  
hewldanên zebeşfiroşan  
kel û kapek derbas bûn  
sêhrbazan asayên xwe xwarin.

Sala par  
muzeyan kevçiyek zêr  
zanyaran fosilekî dêw  
nêçîrvanan postê pilingek nêremê  
defînegeran gustîlek keçikên pêrî  
remildaran mareke dilxwazdayînan  
dermanxaneyan dermanek mirov evîndar dîkir  
şevan stêrkek şairan jê hez dîkir

û dewlemendan micewherên jinên xwe  
winda kirin.

Sala par  
rêwiyê di rê de rikdar  
miriyê di mezel de sar  
şervanê di şer de sist  
paleyê di zewiyê de piştxûz  
û kaptanê di keşiyê de tazî  
negîhîştin xana xwastinê.

Û sala par  
te dît?  
hîna çil roj mabû  
zivistana guran biqede  
tîfinga me şikiya  
û kûçikê mala apê hecî,  
mir!

*Kanûn, 1999 /Salzgîter*

# Qedirşinasî û rûmetmedarî bingehê karakter û çanda kurdan e

ŞAKIR EPÖZDEMİR

Civata kurdan, wek ku gerokên biyanî bi israr dibêjin ne civatek koçer, bê war û sekan e. Kurd tenê ne şivan, gavan û golikvan in. Kurd, milerek ji millet û civatên Mezopotamyaya qedîm in. Wan di avakirina Împaratoriyan û dewletan de ciyên xwe girtine; key û qiral û siltan anîne homê; beranberî bi dewlet û civatên dor û berên xwe re kirine; tenê şerê kurd û asûriyan hezar salan dom kiriye.

Kurdan, bajar ava kirine, li dora bajarên sûr ava kirine û bo welatê xwe ji dijmin biparêzin; birc û keleh li seranserê Kurdistanê bilind kirine.

Bajar, bajarvanî, bajêr, şar, şaristan, şaristanî, bazar, kirîn, firotin, dan û standin, bazirganî, kar, xisar, karwanî, guhertin, sûk, çarsû, kuçe, kolan, tax, meydan, qesir, olî, birc, xanî, mal û menzel, çywan û dîwan û bi sedan termên bajarvanî di çanda me ya qedîm de ciyê xwe girtin e.

Herweha kurd bi hezar salan e ku navê mezin û rêvebirên xwe bi zimanê xwe telefuz dikin. Wek key, keya, qiral, siltan, mîr, emîr, melîk, hakim, wezîr, kizîr, şane, şah, şahêşahan, mîrêmîran, serok, pêşkêş, rûsipî, giregir, malxwe, fermanदार, serdar, fermanrewa, şewirdar, şêxzade, mîrza, mîrzade, prens, torîn, pismîr, pisaxa, pismam, etê, xatûn, xanim, stî, banû, şehbanû, jinmîr, jinseyda, jinaxa, mîranî, mîrbanû, mîrzade, dadmîr, dadşah, domam, kek, kak, kekê, metê, xaletê, tî, jintî, jinbir, jinmam, domam, diş û bi sedan nav û termên civakî ên gund û bajariyên qedîm.

Malmezî, maldar, zengîn, dewlemend, halxweş, haltenik, destteng, malava, malkanbax, cihû, merd, tima, çavtêr, çavbirçî, mêr, camêr, şêrejîn û wek van bê hejmar bêjeyên ku bi riya binecîbûnê, gund, bajarî û civarek xwendevan û fermî de hatine homê û ketine ser zimanê gelê kurd.

Di delavê ticaret û huner, siyaset, komelî û hemû şaxên jiyane de kurd şeqla medeniyetê li rûyê vê gerdûna ku niha bo me bûye cehenem daye.

Qedîrşînasî, ji zanîne, ji xwendevanî û bajarvaniyê, ji perwerda civakî tê meydana. Em gava li bajaran, bi sedsalan di medrese, dibistan, mizgevt û dîwanan de hînkirî rabûn û rûniştinê, dan û standin û diyalogê, qedr û qîmet û rûmetmedariyê bûne û heya îro jî li gundên şên û ava an li bajarên kurdan ev qedîrşînasî, terbiye û nezaket di rewacê de ye.

Kurd, bi rastî ne pêxwas û birçî û taziyên li ber poxanên dirokê ne. Bilakî kurd miletekî medenî, aristokrat, şareza, dinyadît û xwedan xasîyetên taybetî ên xwemal û qenc in.

Kurd waye 1500 sal in ku li xar û jor bi 4 zimanan dizanin. Tirkî (osmanî), farisî, erebî û kurdî ziman û qedera me ya hezar salan e. Kurd û ermenî, kurd û suryanî, kurd û cihû û zemanekî jî rum û yewnan bi sed salan di nava hevdu de jiyane û dan û standinên wan bi hevdu re çê bûne. Kurd zarokên Mezopotamyayê ne. Kurdan ji Pêxember, qîral, feylozof, ilimdar û serdar ji nav xwe deranîne û xizmetên kurdan ên hêja gihîştîye diroka însanetiye. Em li kaş û kendalan, li çol çîyan li ber heywanan mezin nebûne. Kurd, heta serê sedsala bîstan û çariyeka vê sedsalê bîndest mabin jî wan efendîtiya tu kesî nepejîrandine û xwe ji tu qewmî re nizim nekirine.

Ku di zimanê kurdan de termên nazik, rûmetmedar û edebî tunebûna, gelo 300 sal berê şahesera Ehmedê Xanî ê nemir wê çawan ew çendî xweş û mezbût bihata nivîsandin. Ma feylozofê kurd li serê çîyan bû ilimdar?

Şêx Ehmedê Xanî, rêberê ziman û edebiyat û toreya kurdayetiye ye. Feylozofê nemir dibêje: "Botî û Mehmûdî û Silîvî; Hîn lal û hinekdî zêr û zivî." Ma mumkun e ku Şêx Ehmedê Xanî, ji bo zimanekî bê usûl û qaîde û terbiye û rijî re wiha bibêje. Jixwe izbata dewlemendiya zimanê kurdî di rêzên Mem û Zînê de tên ber çavan. Emê çend rêzan ji Mem û Zînê pêşkêşî we xwendevanên hêja û xoşewîst bikin. Hûn xwendevan ji kerema xwe van xetên mamostayê mezin bixwînin û bala xwe li ser van rêzan kûr bikin, ka qedîrşînasî û rûmetmedariya Şêx Ehmedê Xanî di çî delavî de ye û ew bi çî çavî dihêjine.

Ciwamêrî û himmet û sexawet  
 Mêranî û xiret û celadet  
 Her mîrekê wan bi bezlê Hatem  
 Her mîrekê wan bi rezmê Ristem  
 Ger te divêtin bibî Mîr û Serok û Rêber  
 Kizb û xilafê nebêje, ger te bikin ker bi ker  
 Rabit ji me jî çîhanpenahek  
 Peyda bibîtin me padîshahek  
 Ger dê hebûya me serfirazek  
 Sahîb keremek, suxunnexwazek  
 Ger dê hebûya me jî xwudanek  
 Alî keremek, letîfe danek  
 Ger dê hebûya me ittihadek  
 Vêkra bikira me inqiyadek  
 Namûs li hakim û emiran  
 Tawan çî ye li şair û feqîran?  
 Bi fikir ji ereb heya Gurcan  
 Kurmancî ye bûye şîbhê burcan...

Min ev çend rêz ji kitêba Mûrad Ciwan, ya bi navê "Ehmedê Xanî" berhev kir. Ji van rêzan dixwiye ku 300 sal berê, filozofê kurd, bi kurdî pîrsa daxwaza yekîtiyê û itifaqê dike û divê kurd xwe bidin hev, bibin yek. Ew bi rêk û pêk bi rêz û rûmet e. Kurd bi zimanê xwe dixwînin, li bajar û gundên xwe azad in, hukmet û statuyên wan ên serbixwe, nîvserbixwe û mixtar henin û ne şivan û gavan û xulamê kesî ne. Rastî jî ev e.

Îro jî em mêze dikin, ku sed spas ji kerema xwuda re kurd bi gelemperî hurmetkar in, nefsbîçûk in, qedirşînas in û camêr in. Mezinên me di merdîtiyê de hatem in, gelê me ê bindest di mêraniyê de lehengên wek Ristem in. Lê em qedrê hev nizanin. Em siyaneta mezinên xwe nagirin. Mezinên kurdan hemû hêjayî pesnê, rûmetbilindiyê û pêşkêşiyê ne. Em bê wan nikarin ber xwe bibînin. Ew bê me nikarin bimeşin. Gelek, miletek an eşîr û civatek bi mezinên xwe dixwiyên û serbilind dibin. Hejmara gund û bajarek hemû tiştî îfade nake. Gund û bajar û millet bi lîder û pêşkêş û mezinên xwe nizim an bilind dibin.

Riya yekîtiyê di dilxweşiyê, dilgermiyê, dostanî û birayetiya re dibore. Ku me

qedrê mezinên xwe girt û mezinên me jî qedrê xwe zanîn û qedrê hev girtin, wê dilê me û wan û wan û wan li hev fire bibe û evînek bikeve dilê wan. Însan heya nêzikayî li hev neke, hev nas neke. Bi hev re nede nestîne; ji hev piştrast nebe û qîma kesî bi kesî neyê. Ev jî bê nêzikayî û têkiliyan ne mumkun e. Bi zêf û dijminan, bi îtham û iftiran û derewan û zimanê sar, ne mumkun e ev nêzikayî pêk bê.

Nexwe em ê çewa bikin? Em ê berîya her tiştî dev ji înadê berdin, xebat û teba ku bi salan e me derbas kiriye, em ê bixin binê piyê gelê kurd û destê birayetî û dostaniyê dirêjtî hev bikin, yekîtî, yekbendî û tifaqa xwe ya neteweyî damezirînin. Ev yek berî hertiştî di dilan de tê avakirin.

Kurd bi gelemperî diltenik in, dilgerm in, dilsoj in û bi xîret in. Dayikên me ên birîndar di halê vê bindestî û şerpezetiyê de karîne şewqet û merhametê li canê me de tof bikin. Şewqat, dilovanî, rastî û duristî van dayikan di canê me de çandine; hêşîn kirine û em bi van karakterên giranbuha xemilandine. Me xîret, mêranî û camêrî ji bav û kalên xwe girtine. Qedirşînasiya me, rûmetmedariya me, camêriya me û hemû karakterên me yên qenc hema ji xwe ve çênebûne û nehatine holê. Miletê kurd li mizgevt û medrese û dîwanan guhên xwe dane mamoste û mezinên xwe û rê û rêçika xwe nas kirine.

Wek hemû miletan, refleksên kurdan yên milî henin. Kurd jî qencî û xerabiyên ji hevdu dertînin. Refleksên me ên milî henin û ev refleks di hemû deman de derketine rûyê erdê.

Di dîroka nêzik de jî me ev reflex di reva kurdên Başûr de ji ber bombeyên Seddam li ber çavên xwe dît. Dîsa ev refleks li ser meseleya parlementerên kurd ku ew ji parlamentoyê xistin û bi stûkira endamê Şîrnaxê Orhan Dogan girtin û ew li tek-siyê siwar kirin me hemûyan dît. Girtina birêz Ocalan û vekirina pêçanan ku di balafirê de li hafa alemê qewimî; gelo li ser rûyê dinyayê; kurdek heye ku bi vê menzerê neêşiyabe û birîndar ne bûbe. Ev reflex û xîret bû ku bi dehan însanan xwe şewitandin.

Bi zanîn û nezanîn, qenc û xerab, kurd mêr in, camêr in û bi xîret in. Xeberke pêşiyê kurdan heye, dibêje; " Xîretê avêtina ber sa, sa qebûl nekiriye"

Di van salên reş û tarî û bêkeysî ku di ser kurdên Başûr re derbas bûn; kurdan ji binî hedimand; her çendî ku bi gelemperî, ev heyasizî û timahiya malê dinyayê seranserê Tirkiyayê genî-gemar kiribe jî; lê bi raybetî ya kurdan nayê taswîr kirine. Lewra li welatê me, tişteki ku dîrokê qeyd nekiribû qewimî. Ji bo 5 milyonan, 10-15 milyonan bi dehhezaran kurd xwe xistin kirasê qelsiyê. Ev kiras li bejn û bala kurdên xweşmêr nehat û di nav qewm û der û dorên xwe de sik û nedelal bûn. Di-

gel vê jî; pirên caran em dibihîzin ku bi gelemperî ne bi xweşiya xwe ev kiras li xwe kirine.

Salên 1987 an meseleya koruyuciyekî Kurtalanê dihate behs kirin. Dibêjin başawîşê qereqolê di nava axaftina xwe de ji koruyiciyan re gotiye; " - kî serê apo bîne ez ê deh milyon Lîran bidim wî." Yek ji koruyiciyan dibêje " - Qumandar, qumandar! De tu serê Kenan Evren werî ez ê 100 milyon Lîran bideme te.." Ma ev ne refleks e?

Bi ya min lazim e ku kurd qedrên hevdu bigirin. Hev neşkînin û tu wextî hevdu bi îxanetê îxam nekin. Bêjeya xiyanetê ne ya kurdan e. Xiyanet kirasekî wisa necis e ku gereke kurd li xwe nekin. Divê tabîrên kirêr û ne qenc em nexebitînin. Em hev bilind bikin. Siyaneta hevdu bigirin û ji hevdu hez bikin. Em bi partîyek, du partiyan, bi serokekî û pênc serokan jî rizgar nabin. Rizgariya me barekî giran e û divê kurd bi hev re mil bidin bin vî barî.

Li dîroka xwe ya 200 salan meyze bikin. Sebebên ku serhildan û micadeleyên me ên neteweyî neçûne serî; hemû ezezî û bêminetîya reş e. Her yekî xwe di eynika dêwan de dîtiye. Ên din jî, her carek o xweşika xwe bi şihitandina van hereketan anîne. Deka bêjin sebebê vê çi ye?

Ev 2000 sal bêtir in ku kurdan yek carekê bi piranî û bi îradeya xwe a milî li Amasyayê bi Osmaniyan re lihevhatinek li dar xistine û bi împaratoriya Osmaniyan re ittîfaqek ava kirine. Kurd bi carek heya berî bi çend salan ji vê ittîfaqê re digotin firotin û "xiyanet". Niha jî mixabin ku piraniya me wiha dizane. Sebebê şaşiyên me ew e ku em dîroka xwe nizanin û em li gor îdeolojî û felsefên xerîb meseleyên milî dihêjin.

Ez niha 63 salî me û şîretekê li kurdan dikim. Dibêjim, bila kurd hemû qedrê hev bigirin. Bila qedrê mezinên kurdan bigirin. Bila siyanetiya kurd û Kurdistanîyê neşikînin. Bila kurd kêmasiyê ji hev bikişînin, lê tu wextî xwe kêmî dijminên xwe nebînin. Bi destûra we be ez ê nimûneyeke ji Şivan Perwer bidim û her kurdek bila li gora vê mîsalê Kurdîtiya xwe bipîve.

### **Nimûneyek balkêş û camêriya Şivan Perwer**

Sala 1987 an qirkirinek wek qedîama Hîroşîmayê li Helepçê li dar ket, Seddamê zalim û rejîma Baasî ya xwînmêj di ser vê de; ji mintîqa Barzan di yek şevkê de 8000 mêrên eşîretên Barzaniyan li kamyonan siwar kirin û ew roj ev roj e kesî salix û guman ji wan negirtine. Ne dinyayê ne jî der û cîran dengê xwe nekirin."Kesekî



li halê me nepirsî\*

Di havîna 1990 de Seddam Kuweyt dagîr kir. Zivistana 1991 Emerîka û bi hevalbendên xwe ên koalîsyona şer, li Iraqê xistin. 100 seat Seddam û artêşên wî yên taybetî anîn rê.

Di bihara vê salê de kurdên vî welatî giş bi hev re serî hildan û hemû gund û bajarên mintîqa Kurdistanê di nava çend rojan de ji dijmin standin. Gava ku ereban û dijminên kurdan dîtin Iraq bû 3 dewlet (kurd û ereb û şîî), hema pêre pêre Emerîka îkna kirin ku destûra Seddam bide û Seddam dîsa artêşên xwe ên devbixwîn û teyareyên xwe ên ji bimbeyên jehrê dagirtî bajo ser kurd û Şîîyan. Seddam li kurdan da; kurd bi mal û dû, biçûk û mezin û jin û mêr; ketine çîyan û berê xwe dane sînorê Îran û Tirkîyeyê. Di vê navê de hemû raya giştî a cîhanê û bi taybetî ya Emerîka û Ewrûpa rabûne piyan, ka gelo bê çî warîlek petrol ji mîletekî 40 milyar bêhtir giranbuha ye.

Li ser vê rewşê bivê nevê Emerîka mudaxele kir, ji bo kurdan û Şîîyan, herêmên azad tespît kirin, di Kurdistanê de dewleta federe ya herêmî bo kurdan saz kir û bi hemû dinyayê jî da pejirandin.

Vê çîrokê hemû kurd dizanin; dûbarekirina min; min xwest ku careke din jî xwendevanan bibim wan rojên dijwar û dram. Ev mînaka ku ez ê ji Şivan Perwer bidim; di van rojên teng û tarî de derbas bûbû. Em ketibûn halekî nexweş. Em melûl û zelûlê alemê; sêwiyên dewletên Misilmanan û li ser welatê xwe yê qedîm xwegirtiyên lave lave bûn. Erê, êsîr, bender, bêçar û xwegirtiyê welatê xwe.

Ev çîroka ku ez ê niha behsa camêrtiya Ş. Perwer bikim; perçeyek ji alîkarî û piştgirtina raya giştî a alemê ku hunermendên navdarên Ewrûpî ji bo propaganda û alîkariyek maddî bigihîje kurdan li Londrayê konserek navneteweyî saz kirin. Belkî bi xebat û teşwîqa kurdên li Ewrûpayê jî ev konser li dar ket. Me hew bihîst ku wê şeveke eyan li Londrayê ev konser ketiye programê û ku ez ne xelet bim gotin ji kanala TV ya Starê li Tirkîyê wê em bikaribin temaşa vê programê bikin. Û nihayet ew şev hat. Em bi mal û dû, bi mêvanên xwe ve wê şevê ranezan. Bi rastî jî konserek gelekî xurt bû. Her çendî min dengbêjên biyanî nas nedikirin lê qîz û xortan ew nas dikirin û pesnên wan didan. Konser, pir dirêj bû. Hatina wê şevê hemû ji kurdên başûr re bû. Ji ber wê bi gumana min alîkariyek baş gihîşte kurdan.

Em li Enqerê ne, yek dido di nav me de bi zimanê îngilîzî dizanin; hinek tişt em hizir dikin; hinek jî ev xort û qîz bo me tercûme dikin; berê sibê ye. Xewa me nayê, lewra çav û guhên dinyayê li me ye. Dilê herkesî bi me ve ye. Dinyayê wê şevê

bo kurdan distira. Dengbêjên navdar ên alemî ji bo me derdiketin sahneyê. Şerê sedsale karek ji me re neanîbû; lê reva kurdan, ji bo vî milletî bûbû fereca xêrê.

Em hizir dikin ku Şivan Perwer "Assolîst e". Dê Şivan piştî hemûyan derkeve û bi wî dengê xwe ê zîz û ezîz bixwîne. Gelo wê "Helepçe" bixwîne an ê "Pêşmerge"? Em her munaqêşe dikin; lê şibha min di vê yekê de tune ku Şivan ê bi zimanê kurdmançî bixwîne. Dê sewtê kurdan, deng û awazê kurdan wê şevê bikeve xan û eywanên alema cîhanê.

Dawiya ku wê konsera navneteweyî biqede; Ş. Perwer bi qiyafetê xwe ê neteweyî û saza xwe ya xemrêj ve derkete sahneyê. Bi derketina Ş. Perwer re dengê çepikan salon tijî kir; dengbêjê bi nav û deng beşdarên Brîtanî selam kir û sipasiya xwe nîşan da; tam di vê demê de sipîkerê konserê bala guhdaran û temaşevanan bi tişteki ve kişand: berî hemû kesî fetilî vê bagê, me dît ku yek, zilamek, xortekî ciwan; bi kincên medenî û bi rêz û rûmet kete sehneyê, wî hemû kes silav kir. Ew beşdarên ku bi hezaran dihatin hejmartin giş bi carekê rabûne piyan û bi Ş. Perwer û amadekarê televizyonê ve hemûyan bi hev re bi dilgermî li çepikan xistin. Ev çepikên evçend dût dirêj lê ketin; gelo ji bo çi bû...?

Li gora ku me fam kir, ê vî xortî mesaja serokê PDK Mesût Berzanî bixwenda. Ev çepik û dilgermiya alemê bo serokê kurd û ihtiram û evîndariya netewê kurd ê bindest û birîndar bû.

Çepik hêdî hêdî qediyar, sehne bê deng bû; vî xortê kurd ê cindî mesaj vekir û dest pê kir xwend. Tam di vê niqteyê de tişteki bû ku çavên me hînî tişteki wiha nebûbû. Vî tiştî bala me gişan kişand û em malbat bê hemd rabûn û ketin rêza rûmetê. Ne ku "Ey reqîb!" dixwendin. Şivan Perwer îşaretek da kurdan û hemû din-yayê. Wek dengê xwe ê xweş, her wisa bi xîret û dilovanî û dilsojiya xwe ya germ; ji bo serokê qedir bilind û mesaja wî a manîdar ku ji alemê re gilî û gazinên kurdan dagirtî bûn; kete patê. Kete hezirolê. Amadebest bû. Saza xwe bi bejna xwe ve şî-dand, serê sazê li erdê, li ber piyan û bi serbilindî û bi rûmet xwe li ber dengê mesaja ku me nizaniya; lê me hizir dikir ka çi dibêje, dikir.

Ev mîsal, an ev mînak; mînakek pir manîdar e. Ş. Perwer hunermendekî kurd, yê welatparêz û milletperwer. Milletperwerekî ku cîyê xwe ne tenê di dilê gelê kurd de, cîyê xwe di dilê hemû xelk û millet û kesên Kurdistanê de û di dilê hemû kurd-perwerên alemê de veda ye. Ev Şivan serê saza xwe datîne erdê û bi rêz û hurmet kemerbestê serokê xwe dibe. Ew serok ne tenê serokê malbatek, eşîrek û herêmek e. Ev serok, serokek ji serokên kurdan yê bi nav û deng û bi nîşan e. Qedirgirtina wî, rûmetbilindkirina kurdaiyê ye; qedirgirtina Mela Mistefayê nemir e. Rûmet-

dariya heq û mafê kurd e. Qedirgirtin û ihtirama hemû şehîdan e.

Ez dibêjim ku ev mînak û mîsala Ş. Perwerê navdar, divê di serê me kurdan de ciyê xwe bigire: Ne tenê qedrê Mesût Berzanî, her wiha em hemû qedrên hevdu bigirin û rûmeta mezinên xwe divê ku em her bilind bikin. Mezin û lîderên me, birc û kele û çeperên me nin. Mezinên me serbilindiya gelê me yê bindest û bêçar in. Em kurd ji kîjan herêm û eşîr û partiyê dibin, bila be; divê bê kêmanî em qedrê xwendevan, pêşverû, zana, hunermend, lîder û rêberên xwe bigrin, guhên xwe bidin wan û piştewaniya wan bikin, heya ku ew pêşevan riyek zelal û sererast bidin pêşiya me.

Mezinên me dibin ku li hevdu nekin, dibe ku ew di derheqên hevdu de tiştên nebaş jî bêjin; em ne di vê qedemeyê de ne; qedemeya mezinan menzîlek bilind e. Dibe ku keramet di gotinên mezinan de heye; lê em, em ên ku xulamê axa Kurdistanê ne; divê em her û her peyayê dewleta kurdan û di emrê rêberên xwe ên rast û rasteqîndabin.

Mezin, rûsipî, giregir, pêşkêş, lîder, serok, sermiyan, pîr, aqilmend, rêzan, rêber, serdar û hemû termên dîsîplîn û qedirşînasîyê ji qedîmî ve ketiye nava kûraniya dil û mejiyê kurdan. Kurd bi eslê xwe qedirşînas û rûmetmedar in. □

# Dara di avê de

IBRAHİM SEYDO AYDOĞAN

**D**i nava okyanûsê de, ji wê pê ve çend giravên din jî hebûn, lê yek jî ji wan ne bi qasî wê mezin û xweşik bû. Her celeb dar di nav hev de rez dibûn. Bêhna okyanûsa bedawî û dengê qeqlîbazen baskfirah, wêneyê giravê temam dikir.

Ev demeke dirêj e ku li vê girava bedew, li taxa wê ya xizanan nexweşiyek peyda bûbû. Dermanê vê nexweşîya sedemnediyar, tune bû. Kesên ku bi vê nexweşiyê diketin, berê di xwe de dernedixist, lê bi dû re gava birînek di sînga wan de mîna gulekê dibişkivî ku heta bi sê rojan xwîn jê diherikî, hingê bi nexweşîya xwe dihisîyan.

Wê çaxê jî kesî hew dikarîbû re li ber mirina wan bigirta.

Textorê ku ji bo vê nexweşiyê hatibû giravê jî nema dikarîbû tiştek bikira. Dikir û nedikir, tiştek ji destê wî nedihat. Ji birêvebirina giravê alîkarî dixwest, da ku hin dermanan û textorên din jî bişînin, lê birêvebirinê newerîbû tu kesê din bişanda. Ji xwe, vî textorê han jî bi dilê xwe çûbû wê deverê. Ji ber ku heqê dermanan jî dê ji xezîneya birêvebirinê derketa, wê jî ji wan re derman nedişandin.

Gelê wê taxê ew li ser serê xwe digirt. Ji bo ku karê xwe baş bike, gelek kesên ku hê bi nexweşiyê neketibûn jî alîkarî bi wî re dikir. Wan jî wî re qesireke xweşik ava kiribû û çî tiştên ku dê pêwistîya wî pê hebin jî xistibûn embarên we. Ji bo xizmeta wî û parastina wî jî deh parazger dabûnê.

Textorê ewilî jî kesên ku hê bi vê nexweşiyê neketibûn, dest pê kiribû û ew ji kesên din veqerandibûn, li cihekî taybetî bi cih kiribûn. Bi dû re jî dest bi karê xwe kiribû.

Hêwana ku ji bo nexweşan hatibû avakirin, tim û daîm tije bû. Textorî ji gelê taxê xwestibû ku nexweş, an ne newxêş herkes were û xwe rê wî bide.

Nexweşî her belav dibû. Hejmara kesên ku rewşa wan giran bû, roj bi roj zêdetir dibû.

Berê diviyabû ku nexweşî bihata naskirin. Çend kes di nav destê wî de miribûn. Textorî êdî nexweşî baş nas dikir, lê belê, nizanîbû bê dê çi bikira.

Ev nexweşîyeke nedîtî bû.

Kesên ku bi vê nexweşîyê diketin, berê ji hal de diketin. Ji bêtaqetîyê, di xwe de derdixist ku tiştekî wan heye. Lê qet nedihat bîra wan. Piştî wê bi çend rojan jî birîneke kûr di sîngên wan de vedibû. Textorî çi dikir û nedikir, nikarîbû ew birîn derman bikira. Birîn her ku diçû kûrtir dibû. Piştî sê rojan xwîneke reş ji birîne dihat. Wê gavê herkesî tê derdixist ku wexta mirinê hatiye.

Ji xwe, nexweşê ku xwîn ji sînga wî dihat, nedima roja din. Xelasîya wî nedima...

Gelê taxê êdî hêviya xwe birîbû. Diçûn li ber perê avê rûdiniştin û çavên xwe be-  
ra dawîya okyanûsa ku nedixuya didan.

Te digot qey li benda tiştinan in.

Te digot qey ji wî aliyê ku ew lê dinerin, dê tiştek were.

Tiştêkî weha tune bû. Lê wan pir dixwest ku hebe.

Gişan dixwest ku ji nişka ve keştîyeke mezin were. Dermanan bi xwe re bîne...

Tim û daîm xeyala keştîyeke weha dikir. Xewna wê didît...

Sal derbas bûn...

Rojekê keştîyek ji dûranê xuya bû...

Bi qasî bajarekî mezin bû. Heft dîrekên wê hebûn. Hê gava ber bi çavan ve ket, te digot qey ji wan re hatibû gotin, giş rabûn ser xwe û bi hev re bê deng bala xwe daye...

Li ser avê hêdî hêdî dimeşîya û ber bi wan ve dihat.

Ewîlî kesî bawer nekir. Wan digot qey xewn e.

Pîrekek li pêşîya keştîyê, li ser lîngan sekinîbû û li wan dinerî. Kirasekî gewr ku jêra wî li ba dibû, lê bû.

Pîrekeke dirêj. Esmer. Lihevhatî. Bedew. Mehîneke seglawî... Porê wê li ba dibû.

Keştî hat û li nêzîkî giravê sekînî.

Xebera hatina wê tavilê li giravê belav bû. Xelk giş hatin wira.

Bi kelekana çûn ber keştîyê.

Keştî tije derman bû.

Kesî nizanîbû, bê ji ku dihat.

Hat pirsîn. Tu peyiv ji jina kirasgewr çênebû.  
Qet nedipeyivî. Bi tenê xwe ji ber wan da alî ku ew dermanan daxînin.  
Bi dû re, wan fahm kir ku pîrek lal e. Dilê wan bi wê şewitî.  
Qey ji ber wê ye ku bêtir jê hez kir û xatir dayê.  
Ne jinikê bi awayekî ji wan re got û ne jî wan pê derxist, bê ev pîreka lal û ev keştîya mezin a mişt derman ji ku dihatin.  
Derman daxistin û anîn cem textorî. Pîrek li qesira wî hat bicîhkirin.  
Textorî li pîrekê nihêrî. Pîrekê jî li wî nihêrî. Teqîn bi bedenên wan ket.

Gava lê nerf, dilê wî bi wî şewitî, lê hay ji xwe û dilê xwe nebû. Qey pîreke bi wê bedewîya xwe ji nû ve zilamîya wî anî bîrê. Xweşîyek di dil û mejîye xwe de his kir. Jixweber bişîrî. Lê di ber re jî êşîya. Ji wê û bedewîya we pê ve, nema li tişteki din fikirî. Kelecaneke ew da ber xwe.

Bêyî hişê xwe tev digerîya û hey li we temaşê dikir. Pîrekê jî eynî mîna wî, li wî temaşê kir.

Gava ji wan bihata pirsîn, wan ê bigota, Hop, bila dinya di vira de bisekine...  
Textorî got qey bi dayê ketiye.  
Got qey teyrek e. Barekî giran anî û xwe li ser dile wî danî.  
Janeke da dile wî. Gêjbûnek his kir.  
Got qey sînga wî dike ji ber dilê wî binepixe. Dilê wî mîna bombeyeke pîmkî-şandî... Dilê wî li ber teqînê... Hilma wî çikîyabû. Heke zû li xwe hay nebûya, dê bifetîşîyaya...

Ji bo ku xwe xelas bike, xwe dawîşand.  
Lerzînek bi nava wî ket. Xwe li piştê wî û milên wî rapêça.  
Gava hat ser hişê xwe, dilê wî ketibûyê...  
Ji kerban lêva xwe gez kir...  
Qesir ji nû ve tije bû. Nexweşên ku hêvîya xwe birîbû dihatin.  
Derman li wan belav kirin.  
Pîrekê jî alî textorî dikir.  
Kê derman di sînga xwe de da, rehet bû.  
Birîn hatin girtin.

Piştî ku dest bi kar kiribû, hevaltîyek jî di navbera textorî û pîrekê de peyda bû-bû. Karê wan her ku diçû ew bêtir nêzîkî hevdu dikirin.

Wê pîrekê, bi bedewîya xwe û başîya xwe ve tesîr li textorî kiribû. Lalbûna wê jî efsûneke din dida bedewîya wê.

Gava ku li çavên mirov dinihêrî, mirov digot qey çavên wê vokalîya senfonîyeke Xwedayî dikir. Hişê wî ji serî diçû. Wateyeke kêr hebû di rûyê wê de ku mirov hema dixwest bizanibe, bê çî difikire ê ew meraq dikir. Bişirandineke nixumandî mîna pireyeke di navbera çavên wê û lêvên wê disekinî.

Mirov hema dixwest ji xwe re li ber rûne û lê temaşe bike.

Wê çiqas vedişart jî bala wê jî li ser textorî bû. Ji lewre bêdengîya wê jî kûrtir dibû.

Carinan gava li wî dinihêrî, nihêrnên wê diçûrisîn. Tew vê yekê taybetîyeke din dida rûyê wê û ew ji her awayî bedewtir dikir.

Textor ewilî bi ber neket, lê bi dû re têgihîşt ku heke tavilê bi wê re nepeyive û hayê wê jê çêneke, dê her nihêrîneke vê pîrekê, ji bo wî û karê wî bibe asteng û rê li ber bigire.

Nema dikarîbû bêyî wê biçûya ser nexweşan. Te digot qey zimanekî taybetî peyda kiribûn ji xwe re, textorî hey digot hawar, ez şewitîm, bes e, ez dikim sînga xwe biçirînim!

Jinikê jî hey digot tu di çî rewşê de bî, ez bi kêrtekê ji te xerabtir im. Were lêvên min yên zûwabûyî û terikî şil bike.

Gava dinihêrî, lêvên wê dilerizîn. Textorî digot qey dixwaze lêvên xwe nîşanî wî bide.

Gava hacetek ji deste wê digirt, bi awayekî weha li hevdu dinihêrî ku devê dîwaran hebûya, wan ê jî bigota êdî bes e ji we re ha! We em kezzebîşî kirin wey!

Vê libendemayinê xweşiyek û pê re jî janneke kûr bera nava wan dida. Ji ber wê ye qey gava berê wan diket hev, mîna ku sûcekî xwe veşêrin, lê di ber re kêfê ji wî sûcî werbigirin, tevdişerîyan.

Textorî nema îdare kir.

Rojeke piştî ku ji ser nexweşan veşerîyan û bi hev re şîv xwar, rabû bi we re peyivî.

Pîrekê dengê xwe nekir. Tiştêkî ku bibe bersiv jî nekir. Ji ber ku êdî tiştêkî veşartî nemabû û hemû hestên wan eşkere bûbûn, rûyê wê sor bûbû. Nema dikarîbû serê xwe rakira û li wî binihêrîya.

Hema bi lez maçek da wî û veşerîya û çû.

Roja din pêjina wê nehat. Çû û venegerîya.

Textorî li her derê çavên xwe li wê digerandin. Xelk jî bi pey wê ketin û lê gerîyan.

Xeber şandin çar aliyê giravê.

Her ku xebereke neyînî di derheqê wê de dihat, bêtir dikeribî.

Heta êvarî jî kesî ew nedît. Nehat.

Sê rojan deng ji wê derneket.

Textor her êvar stûxwar û serî di ber de vedigerîya malê. Kêfa wî nemabû. Gelekî li ber xwe ketibû.

Rojekê, gava êvarî li ber perê avê, li ber dara ku koka we di nava avê de ye rûniştibû û çavên xwe bera deverin dût dabûn, keçik ji nişka ve xûya bû û bi xwe hat û li kêleka wî rûnişt.

Ne wî pirsî, bê li kî derê bû û ne jî wê bi awayekî behsa vê wendabûna xwe kir...

Nexweşt her ku diçû belav dibû. Hejmara nexweşan zêdetir dibû. Dermanan nema têra wan dikir.

Tiştê hebû ku textor her jê ditirsîya. Digot; Lê ku ev pîrek jî bi vê nexweşiyê bikeve.

Qey gava mirov ji hinan hez dike, mirov hema li tiştên xerab difikire. Tevî ku ew qasî li xwe miqate bûn jî vê fikirê dev jê bernedida. Çi gava ku li wê binihêrîya, an êvaran pîrekê serê xwe danîya ser sînga wî, ev tirs dihat birê.

Dikira ji ber vê fikirê dîn bibûya. Newêrîbû jî wê re bigota jî.

Rojekê pîrek bi zorê jî nav nivînan rabû. Halê wê tune bû ku rabûya ser xwe. Lê di ber xwe de da û nehişt ku kesek, nemaze jî textor bi wê bihise.

Sê rojan bi wî awayî ma. Haya kesî ji wî hale xwe çenekir.

Gotibû qey dîsa nexweşîya pîrekan e. Lê belê heta ku sibehekê çav li zirbirîna li ser sînga xwe ket jî di xwe de dernexist.

Birîna xwe derman kir. Debar nebû. Her ku çû birîn kûrtir bû. Dermanên ku bi kêrî herkesî dihatin, bi kêrî wê nedihat.

Wê gavê tirsîya.

Ne ji bo xwe bi tenê.

Ji bo textorî jî tirsîya. Dilê wê bi wî şewitî.

Li ber xwe nediket, lê li ber wî diket. Wî zilamê baş ku xwe ji bo kesên xizan feda dike û tevî van hemû tiştan jî bi evîneke ecêb ji we hez dike, bi ser we de dimire...

Ma dê çawa bikarîbûya ji wî re bigota...

Nema dihat nav nivînen wî. Gava diket cem wî jî nedihîşt ku textor çav li birîna wê bikeve. Li ber wî xwe tazî nedikir. Nedihişt ku bi hev şa bibin.

Gava textorî dipirsî jî digot ku nexweşîya pîrekan e û nedihîşt ew pê bihise.

Sê roj bi şûn de, êdî xwîn ji birîna wê hat.



Ne mimkun bû ku ev veşarta...

Gava textor pê hisîya, dîn bû. Li xwe xist. Perçe ji xwe kir. Girîya.

Girîyê mirîyan bi rewşa wan hat.

Herkesî digot, Felek e!

Herkesî digot, Qeder e!

Dilê felekê û qederê jî bi wan şewitî...

Dev ji her tiştî berda û bi hezkirîya xwe re aleqedar bû. Lê çi feyde ku tişteke jî destê wî nedihat.

Çi zanîna wî ya li ser bijîşkîye hebûya jî têra wî nedikir.

Xwîna ku ji birîna pîrekê diherîkî, reş bûbû. Yanê dihat wê wateyê ku ew ê di demeke kin de bimiraya.

Belê, ew ê bimiraya û wî jî bi vêya dizanîbû...

Hezkirîya wî nema roja din.

Sibehê gava bi xwe hisîya, pîreka ku serê xwe danîbû ser sînga wî, miribû...

Piştî we rojê, êdî nema li tu nexweşan nihêrî. Rahîşt çakêrê xwe û çû.

Kesî nema ew dît.

Dostên wî rabûn, hezkirîya wî li gora adetan şuşt û gor kir.

Textor hefteyekê xuya nebû. Hayê tu kesî jî ji wî tune bû. Bi dû re, gelê taxê jî tev li dostên wî bûn û got ka hela em lê bigerin, belkî tişteke hatibe serê wî, an jî tişteke nebaş bi xwe kiribe.

Rabûn û da dû wî. Tu dever nehiştin, lê kesî ew nedît. Heta, rojekê zarok marokan got wê rojê me zilamek dît ku li goristanê xwe bi ser gorekê ve xistibû û bi dengê hêl digirîya.

Giş ber bi goristanê ve revîyan. Heta ku hatin ber gora hezkirîya wî jî nesekinîn.

Wan wê gavê dît ku li ser gorê çakêrê û çend jûşeyên araşê hene.

Têgihîştin ku textor hatîye goristanê.

Gava perçeyekî qutikê wî yê bixwîn ku çaxa qutikê xwe çirandibû jê ketibû jî li ser rêya ku dadigere ber perê okyanûsê dît, êdî tu şika wan nema.

Xelkê da ser şopa wî.

Hevalekî wî rahîşt çakêrê wî yê li ser gorê û wê gavê dît ku çend dilop xwîn li çakêrê ketinin.

Ew tu carî li tişteke weha nefikirîbûn. Gava perçeyê qutikê yê bixwîn dîtibû jî nehatibû bîra wan.

Nedixwest ku li tişteke weha bifikirin...

Daketin perê okyanûsê.

Di nav darên ku li kêleka rê rêz bûbûn de, çav li çend dilopên din ketin.

Dilopên xwîna reş...

Wan fahm kir. Hêdî hêdî... Mîna ku janek xwe bera nava wan bide.

Kesên li wê rewşê hay bûbûn û fahm kiribû, bê ew ê li ser rêya xwe hê çav li çi bikevin, di ber xwe de digirîyan û dimeşîyan.

Heta jêra perê okyanûsê daketin.

Ew li jêrê, li hêvîya termê wî bûn. Diviyabû ku textor li devereke ketibe û miribe.

Lê weha nebûbû.

Textorê ku piştî mirina hezkirîya xwe, bûbû mîna şervanekî ku di şerekî de hemû peyayên xwe û tevî peyayan hemû heval û destbirakên xwe wenda kiribin, êdî nema li ber jana xwe debar kiribû. Ew jî bi nexweşiyê ketibû, lê li benda mirina xwe nemabû.

Çûbû xwe bi darekê ve daliqandibû.

Gava kesên ku dabûn pey dilopên xwînê, hatin ber dara ku koka wê di nava okyanûsê de bû ku pêlan xwe lê dixist û çav li textorê ku xwe xeniqandiye ketin, debar nekir ku li wî biniherin.

Textor mîna ku şaxekî darê be, gava pêl li lingen wî diketin, di wê valahîyê de dihejîya.

Çavên wî girtî û lêvên wî li ser hev jidiyayî bûn.

Destên wî li jêra bedena wî, jixweber kil dibûn.

Hê xwîn jê diherikî okyanûsê... □

# Welatperwerekî hêja, dostê feqîran: Dr. Yusuf Azîzoglu (1917-1970)

SALIHÊ KEVIRBIRI

Yusuf Azîzoglu, heta tu bibêjî bes mirovekî hêja û nefsbîçûk bû. Quretî li cem wî peyda nedibû. Tim û daîm dixwest ji bo miletê şerqê kar û xebatê bike. Ji malbateke mezin û dewlemend dihat. Lewma jî, her gav derî û dîwana mala wî, ji xelkê kurd re vekiribû. Dabara bi sedan kesan dikir...

Belê di derbarê parlamenterê kurd Dr. Yusuf Azîzoglu de, dostê wî dengbêj Mahmûd Qizil wisa dibêje. Yusuf Azîzoglu, di sala 1917an de, li Farqînê (Sîlvan) ku bi ser Diyarbekirê ve ye hatiye dinê. Ew bi eslê xwe ji heman navçeyê, ji



Yusuf Azizoglu

eşîr û malbata Ferhendiyân, birayê Hacî Huseyn Axa ye. Ji malbateke dewlemendê û xwedî 6-7 gundan e. Ji wan çend gundên wan ên ku me bi dest xistine navê

wan ev in: Tirbesipî, Tilmî û Soranê. Azîzoglu, dibistana seretayî li Farqînê, dibistana navîn û lîseyê jî li Amedê diqedîne û ji bo perwerdehiya tibê qeyda xwe li Zanîngeha Stenbolê Fakulteya Tipê dike. Yusuf Azîzoglu, di dema perwerdehiya xwe ya li Stenbolê de, wekî bi dehan xwendekarên welatparêz ên kurd, li Dicle Talebe Yurdu yê dimîne û hewl dide xwe ku ev der bibe navenda şiyarbûna şagirtên kurd û qada çandê.

### **Azîzoglu dibe Wezîrê Tendurustiyê**

Piştî xwendina xwe ya zanîngehê, Azîzoglu bû doktor. Pê re pê re jî, giraniya xwe da siyasetê. Wekî tê zanîn piştî cuntaya leşkerî ya 1960î, li Tirkiyeyê çend partiyên siyasî hatibûn avakirin. Yusuf Azîzoglu, ligel çend hevalên xwe yê bijare û welatperwer, di sala 1961ê de YTPê (Yenî Türkiye Partîsî) ava kir. Piştî çend mehan, di hîlbijartinên ku pêk hat de, vê partiye gelek parlamanter derxistin û wekî şîrikê hikûmetê kete kabîneyê. Azîzoglu, di hikûmetê de, wekî Wezîrê Tendurustiyê kar û bar meşandin.

Yusuf Azîzoglu, piştî ku dibe wezîr ji bo kar û barê tendurustiya welatê xwe di cih de bibîne û di vê riyê de projeyan saz bike, diçe Tetwanê ku navçeya Belîsê ye. Lêkolîner û zimanzan Feqî Huseyn Sagniç ku yek ji dostên Azîzoglu ye û bi hev re karê siyasetê jî gerandine, di xebata xwe ya bi navê Portreler de behsa serdana wî ya li Tetwanê wisa dike: Piştî ku bû wezîr, hate Tetwanê. Wê çaxê, tevî çend hevalan, me li Tetwanê ji bo ku xaniyên tendurustiyê (Saglik Ocagi) vekin û bi karê tendurustiya gel re mijûl bibin, me komeleyekê ava kiribû. Ez ne şaş bim navê wê Komeleya Parastina Tendurustiya Gel (Halkyn Saglygny Koruma Dernegi) bû. Li Tetwanê ji bo xebatên xwe me jê alîkarî xwest. Li gorî pereyên wê demê, ji me re got, Ezê 50 hezar lîre ji we re bişînim, bi vê pereyê ji bo saglik ocagi ji xwe re eraseyek bistînin, ezê peyderpey ji bo we alîkarîyê bikim... Piştî demeke kin, pereyê ku behs kiribû ji me re şand, me jî eraseyek kirî û me dest bi xebata xwe ya tendurustiyê kir...

Yusuf Azîzoglu, di karê xwe yê wezaretîyê de, mohra xwe li bin peywîrên giring dabûn. Ji bo ku li seranserê Tirkiyeyê pêk were, xebata Projeya Tendurustiyê dabû destpêkirin. Ji bo vê yekê jî çend bajarên Kurdistanê yê wekî Sêrt, Belîs û Mûşê wekî Herêma Pîlot hîlbijartibû.

### **H. Oguz Bekata: Azîzoglu cûdaxwaz el..**

Xebata wî ya ji bo gelê Kurdistanê, kir ku ew ji wezîrtiyê îstîfa bike. Ji ber ku Wezîrê Karê Hundirîn ê demê H. Oguz Bekata, di meclîsê de gotibû ku Azîzoglu, nijadperestî û kurdîtiyê dike. Bekata, ev yek bi kar û barê li xebata tendurustiyê ya Kurdistanê girê dabû û van xebatan wekî cûdaxwazî binav kiribû û wisa gotibû: Azîzoglu, doza kurdîtiyê dike. Projeyên tendurustiyê dide mutehîdên kurd û kar-kerên kurd dide xebitandin. Heger, Azîzoglu li meclîsê biaxive û bibêje, Ez ne kurd im, ez tirk im ezê jî gotinên xwe yên derbarê wî de, paş de vekîşnim...

Yusuf Azîzoglu, van gotinên Bekata bê bersiv hiştibû û ji karê xwe yê Wezaretiyê îstîfa kiribû, êdî wê xebatên xwe wekî parlamenter, di riya gelê xwe de bidomanda. Dîsa li gorî malûmatên Feqî Huseyn, pişt re ew dibe Serokê Giştî yê YTPê û di destpêka sala 1970î de, ji ber nexweşiya xwe ya xedar, ji serokatiya partiyê jî îstîfa dike.

Belê di heman salê de, ji ber nexweşiya xwe ya weremê, (tuberkuloz) ji nav gelê xwe yê şerqê koç kir û bû mêvanê axretê. Li gorî saloxdayînen ku min ji çend kesên farqînî bi dest xistin, wê roja ku cendekê Azîzoglu anîbûn Farqînê bi dehezaran kes, li Farqînê civiyabûn.

Hezkirina Azîzoglu di nav gelê wî de kir ku dengbêjên herêmê li ser wî kilaman çêbikin. Yek ji wan dengbêjan jî Mehmûd Qizil e ku bi navê *Lîdero* li ser wî kilam çêkiriye û di kaset û sêlikên xwe de gotiyê ku pişt re bi dehan dengbêj li çermedorê Kurdistanê ev kilam gotine. □

# Ber bi ronahiyê ve

## RONÎ WAR

**L**i Amedê rojek ji rojên payizê bû. Roja payizê, di binê sermak tenik û bayekt cemidî de, tiştên ji havînê mayî diqewirand û xwe di navenda demsala dinyê de bi cîh dikir. Hilm û bêhna havînê wînda. Asîman çikîvala. Gewrîn. Na, bi rengekî arîyê û nîvboz. Tevlihev. Reng ji hev nedihate neqandin. Bajar cemidî. Tav ne mîna do û pêr. Ne wek herroj. Tîn û germ, şewq û tîrêj wînda. Mîna ronîyek gewr, agirê nivtefiyayî, wîlo di sînga ezmên de çikyayî û hew.

Rewş ne tu rewş bû, ji darên hewşa dibistanê re. Ew jî mîna giyan jê kişiyayî di-xuyan. Dara hinarê ji pelên weşiyayî rût û tazî. Dara mişmiş û tûyê pelên zer û nîv hêşîn li hev bahnandibû. Qey dewr û dewranê, dem û heyamê wîlo dixwest.

Roj û tava îro, dişibîya kesên jîn tevlihev. Sebr û aramî wînda. Dil û hest di binê janê de. Awir û çav, nerîn û bal kesertijî. Miraz şikestî. Pêşeroj tarî, ronî li dûr. Welat, yar, heval û hogir windayî. Evîn û hez sitûxwar. Û tirs li heralî, mirin li dorralî, lêxistin û windakirin bê serûbinî.

Belê, roja îro ya bêyom, tahl û kambax dinalîya. Êvar bi ser de dihat. Tarî li bajêr belav dibû. Herf û çiravê birînê xwe dikewand. Geremola însana wînda dibû, belav dibû. Hemî kes ber bi malên xwe ve diçûn. Diçûn nav zaroyên xwe, dê, bav û yarên xwe. Bîskek dinê wê kuçe û kolanên bajêr vala biba. Derabeyên dikanan hêdî, hêdî bi berjêr de dadiketin. Êdî li bajêr û sûkê jîyanê bisekinîya. Bajarê biba

bajarekî çîrokayî herî nexweş û bi xeter. Wê biba bajarekî ji xeyaletan. Ji xeynî kû-çik, pisîk û wan pê ve, kesê tuneba. Nebêjin ew kî ne. Ew qesas û tîmsalê mirinê bûn. Berî ku ji bîr bikim bêjim, ewê tirs û mêranîyê jî heba li hemî derê. Teqîn û dengê panzera wê belav biba di tarîya şevê de. Û mêranî di sînga bajêr de veşartî. Wê di gerdanê de bi usûl tevbigerîya.

Êvar bi ser bajêr de dihat. Perda tarî xwe dikişand ber çavan. Perda ronî li dûr û winda. Mîna hemî kesî, ew jî ber bi malê ve dihat. Nebêjin ew kî ye, yan jî kî ye ew. Ger hûnê bipirsin û meraq bikin ez bêjim. Mamoste. Bavê du sebîyan. Bavê Hêlîn û Mîbaz. Mêrê jina ciwan Rûken. Evîndarê welat û zarokan. Mêrê qenc. Dibêm we ew nas kir. Yekî ji we. Yekî ji wanê canfida. Hûn baş nas dikin ez dizanim. EW bû ber bi malê ve dihat û wilo difikirî.

Tu, erê tu. Tu li ku mayî AZADÎ? Ma çima wilo carekê ber bi me de tu nayê. Biner bê hozan dibêje çî, çî diqêre. "Derîyê me vekirî ma. Çavê me li rêya te ma. Te gote çî me negot na. Bi hezara me şehîd dan." Belê te pir derî vekirî hişt. Te pir mal xerba kirin. Gelek jinebî hişt, sêwî hişt. Bê mal û war hişt. Keser, xem, kul, axîn, nalîn, qêrîn, hewar û gazî para me hişt. De ka were bira bikewin ev birînên ji sed sala mayî. Me hay ji te heye. Qelenê te xwîn e. Giranbuhaya tu. Lê ne ev çend jî malnexerab! Bes e, bes! Were te em helandin.

Ma ne bes e qey? Tu têr nebû ji me mirin? Çima wilo tu li pey me yî? De dûr be ji me, dûr here. Bila bes ev ewrên reş biqelişin û li me bibarîne nexweşîyê. Dinya xweş e, jiyana xweş e, hezkirin û evîn xweş e, hêvî xweş e lê tu tahl î, tahl... De ka êdî dûr be ji me. Wilo bi wî ruyê xwe yê cemidî û ne xweş li me nenere û bi ser me de neyê. Bila êdî tu hezkirin qurmiçî, tu hêvîsikestî û tu zarok sêwî nemînin. Warê tu kesî venemire, bûkên destbihine li malên bavên venegerin, çira mala kesî netefe û pelê kesî ji dara jînê neqete. □

# DÎSA JÊ [ji Melayê Cizîrî] RE ŞANÊ WÎ PÎROZ BE!

MELE EHMEDÊ ZIVINGÎ

*Dilber şikîna şekerek fe qultû: "ya rû'ê meta?"*

*Go: "Min heta xatir hebit". Min go: "Çi kim ez ba heta"*

"heta xatir hebit": heya ku bê bîra min û di dilê min de bisêwire, yanî gava ku ez bivêm û bixwazim. Dibe ku gotina "xatir" peyva kurdî ya bi maneya mehderî be jî yanî heya ku yek ji bo te li cem min mehderî bike û ez jî destûr bidim te bigihîjînim xwe.

"çi kim ez ba heta?": ez dê bi hetayê çi bikim? Yanî bi vê herênebayî û bi paşvedanê çibikim, di hinek çapan de "bi heta" ye

**Encama Maneyê:** Dildarê bi zarekî şêrîn sozê hevdîtîna da min û li ser vê yekê min jî jê pirsî: "Canê min ma kengê dê ev yek bê cih?". Wê jî ji min re got: "Çi gava ku têkeve dilê min û ez bixwazim, yan jî heya ku mehderek li cem min ji te re mehderî bike hingê dê bê cih". Min jî jê re got: "Ma ez dê çi bikim bi hetayê yanî bi vê paşvedan û herênebayîyê, ma çi karê min tê de heye? Çiku bûna wî bi karekî zor ve girêdayîye.

*Zulfan tu bes çîn çîn bike, biskên muqabil dîn bike!*

*Pêşkêşî yek zulfek te bin milkê Xeten textê Xeta*

**Pêşkêş:** ev gotineke Kurdî ya hevdudanî ye ku ji bêjeya "pêş" û ya "kêş" pêk hatiye û ji bo wî hespê esîl yê ku ji mezinan re tê diyarî kirin hatiye bikaranîn yanî bi pêşiya wan ve tê kişandin, lê pişt re bûye nav ji bo her diyariyê herwekî li vê derê.



**milke Xeten textê Xeta:** milk û aqarê welatê Xeten û textê sultanê Xeta. Xeten bajerek ji welatê tirkan e û Xeta jî diyarek ji welatê wan e.

**Encama Maneyê:** Ey dildarê bes rindiyên xwe nîşan bide û kezî û gulangên xwe xelexelex bike û berde. Wan biskên pêşberî wan jî bes bibe û bîne, bihejîne û wan dîn û har bike, heyra bira milke welatê Xetenê hemî û Textê şahê Xetayê jî pêşkêş û diyarî be ji bo yek guliyekî te.

*Dil bendê dava zulfekê, keftî kemenda ulfekê  
Hel fi yed al-meftûnî şey' ew keyfe esne' ya feta?*

**Kemend:** weris yan jî kindira nêçirê ye û di şer û cengê de jî palewan davêjin hev ku hev pê bigirin.

**Encama maneyê:** Belê dil bi daf û werisê ku ji bîskeki yarê çêkirî ye hatiye girêdan û ketiye kemenda evîneke mezin î talûke. Ma gelo yekî ku ev bela bi ser ve hatibe û bi agirê vê evîne şewitî be dikare ray û tevdîreke rizgarkar jê re bibîne. Ha xorto ma ez dê çi tedarikî ji bo vê rewşê bikim? Ez bi xwe şaş û metal mame û di deriyake pêldar û bêqerax ku nixrobûyî xwe pê karibin xelas bikin, de niqo bûme.

*Zulfên But\* û şêrinleban jehrê ne şubhet 'eqreban  
Lê min ji biska pur girê îro tinê girtin du ta*

**Encama maneyê:** Ew guliyên lêvşêrinan ku mîna Butan serî ji wan re tê tewandin weke dupîşkê xwar î fetlok jahriyeke têt î ar bi wan re heye û ji ber vê yekê jî ez newêrim nêzî wan bibim. Lê belê îro min destê xwe avêtê û du ta bi tenê ji wan guliyên wê yên bi girêk î xingalokî girt û ji xwe ew jî ji bo saxkirina êş, evîn û hesreta dilê min bes in.

*Nisbet perî zîba ye ew, wek nêrgiza yekta ye ew  
Ya men re'a xillî fe hel yuşbî bî şey'in qameta*

**wek nêrgiza yekta ye ew:** bejna wê mîna ya nêrgiza yekta rast û bilind e, eslê maneya "yekta"yê tayê bi tenê ye lê ji bo bejna çik rast jî tê bikaranîn.

**Encama Maneyê:** Bêguman gava tu dildara min bidî ber periyê dê ew ji wê periya ciwan î sipehî delaltir û naziktir be, çiku narînî û lihevhatina bejna wê mîna tayekî nêrgizê ye. Ey ew kesên ku dildara min dîtine ma gelo tişteki ku weke bejna wê delal û lihevhatî be heye? Na qet nîne.

*Me ji baxçeya yar zeyînî bêpursî yek sêvek çinî  
We bî ma ceneytu ceneytî elqet 'eleyye cînayeta*

**zeyinnî:** gotineke kurdî ye yanî fêkî û çiçekên wî baxçeyê yarê gihîştin

**we bî ma ceneytu ceneytî:** bes bi wê çinîna ku min bi tenê sêvek çinî, di hinek çapan de "cennetî" ye lê bi ya min ew ji xirakiriyê ji "ceneytî" ye, çendî ku bi zehmetî be jî mirov dikare wê maneyê jê derîne.

**Encama maneyê:** Min ji bostanê yarê yê ku mêweyê wî gihîştibûn yek sêvek bi tenê çinî û bes ji bona vê yekê wê kuştineke mezin avête ser min û xwest ku min pê ceza bike. Dibe ku mebest ji çinîna sêvê ji baxçeyê yarê yê gihîştî ramûsanek ji gurçikên sor î delal yên ruyê wê be.

Wergera ji erebî: **EMİN NAROZİ**

---

\* Di çapa Hejar de "bitî" ye, yanî çekirî, sazkirî ji aliyê Xwedê ve (Binêre Ebdû 'l- Rehman Şeref-kendî Hejar, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, Sirûş, Tehran, 1361, çapa yekê, r. 35)

# Helbesteke Melayê Cizîrî

**ZEYNELABIDÎN ZINAR**

**H**er çiqas ku jiyana mirovatiyê berepêş hildibeze, tevger û libatine nûjentir jî derdikevin holê û xwe ji bo suxreya mirovan û mirovatiyê amade dikin. Eynî wisan berhem û bermayên dîroka kurdî jî yeko-yeko derdikevin holê û berepêşê bînahiya rewşenbîrên kurd û biyanî dibin.

Êdî bila kes nebêje ku ev ziman û ev wêje wezî mane, yan qels û jar bûn. Fermo ha naveroka vê helbesta Melayê Cizîrî ya nûderketiye holê, dewlemendiyeke wisa xurt pêşkêşî ruhnîmendan dike ku em kurd pê serê xwe jî bişon, xilas nabe. Ev jî nîşan dide ku eger em lêkolîn û lêgerînan bikin, em ê pêrgî gencînene wêjeyî yên wisa berfireh û serfireh bibin ku hem têra me û hem jî wê têra dijminên kurd û Kurdistanê bikin.

Ev helbesta Melayê Cizîrî ya bi navê SELWA, hêj nû tîrêjen xwe derxistine rûyê qada kevnare û rojbaşiya xwe dide deşt û zozanên Kurdistanê û dadikeve qada jiyane, bi tîpên latînî di çapemeniya kurdî de tê pêşkêşî mirovatiyê dike û dibe berê weşana rewşenbîrtiyê.

Ev berhema pîroz, ji aliyê Şêx Xiyasedîn Emreyî ve di payîza 1999an de bo min hatibû hinartin. Ji heyamê Melayê Cizîrî heta îro, tenê mele û feqeyên Kurd ew bi tîpên erebî ji ber hevûdu zêde dikirin û di nava rûpelên pirtûkên olî de vedişartin. Lê piştî ku Roja Çanda Kurdî derket û tîrêjine germ bera ser axa bav û bapîran ve dan, ha ji ber germerontiya wê û têravdanê, zîçik dan û hêşîn bû, xwe ji binaxtiyê derxiste seraxtiyê.

Di Dîwana Melayê Cizîrî de helbesteke din jî bi navê SELWA heye ku destpêka wê ev e: Selwa sehê qed xemilî... Lê ew helbest babetekî din e û bi naverok, bi kêş û nikla xwe, ji ya di Dîwanê de cudatir e.

Ev helbest, ji ber ku nûderketî ye, me nivîsa wê ya bi tîpên erebî jî pê re daye

çapkirin da ji bo kurdolog û lêkolînanan hêsantir çêbibe û ew karibin ku li serê bişixulin.

Dîwana Melayê Cizîrî ya ku bi navê Çapa Cizîrê hatiye naskirin, ji 115 beşan pêk hatiye. Piştî hin helbestên Mekê yê belawela jî ku ketine destan, di paşîya hin çapên Dîwanê de hatine çapkirin. Ew çapa min û E. Narozî ya bi tîpên latînî jî ku ji aliyê Roja Nû ve di 1987an de çap bûye, ji 123 beşan awaye. Yanî heta niha 123 beş helbestên Melayê Cizîrî yê çapkiri hebûn û ev helbest jî, dikin 124 helbest.

Çend helbestên Melayê Cizîrî yê destnivîs li ba mamoste Ferhad Şakelî jî hene. Ew, ne wan çap dike û ne jî dide kesî. Lê ez nizanim gelo di nava wan de yê nedîtî hene yanena?

Ev helbesta li jêrê, ji yazdeh çarmalîkan avabûye, kêşana hemû rêzan bi sêzdeh kiteyan çêbûye û Qafiyeya asasî jî di rêza dawîn a hemû malîkan de tîpa "î" ye.

## SELWA

Manendê te nînin der cîhan, şahaperî  
Selwîqed û balaelîf û lebşeker î  
Rûgulşen û bûenber û ehnîgever î  
Carek me te dî, lew li me dil bûye kerî

Durdaneya serhelqeya hor û perîya  
Yûsuf ku nedîtî wekî Selwa li ciya  
Sed sondê dixwûnim bi du çehv û biruya  
Bê şubhe dizanim ku tu yekta beşer î

Dil aşîqê dîna te ye ez subhî ezel da  
Lew bilbilî mestane ye der şî'r û xezel da  
Ger dengê selama te herî ew di mezel da  
Dê zînde bimînit di ebed nabe herî

Dil qulzemê îşq e di hemî mezheb û dînan  
Ayatê cemala te dixwûnit wekî dînan  
Lew cezbe û lertzê digirit her şevê înan  
Heta bi ebed tu ji bo wî ra keder î

Nimûneya Selwa bi tipên erebî

۱۱  
(سَلْوَى)

۱	سَلْوَى قَدْوَالَا الْفَوْلِبْ شَكْرَى جَارِكْ مَه تَه رَى لَوْلَى دَل بَوْنَه كَرَى	ماندێ ته نین د جهار شاهاری روگشتو بو عنبر و اهی گفتری
۲	بوسق کونَه دینی وکے سَلْوَى بِلَا بے شهبه دزانم کو تو بیک تابشری	در دانیامر جلقیا جور و پریا صد صوند د خونم بدو جهشو برویا
۳	لویلی مستانیه در شمر و عزالد دی زنده بیت دابد ناب حری	دل عاشق دیاتیه از صبح ز لدا گردنگی سلاماته هری اور مرلدا
۴	آیات جلالته د خونت وکے دیان حق بابد تو ز بو ویل کدر ز کسری	دل قانمی عشقه دهری مذهبو دینا لوجزه اولرزی دگرت هر شقی ایمان
۵	دلی باکیله داغے تووی لوی بویه خاری فرمان بنفسیه لوی ژیکه لیری	دکفتیه داقا کو لعلم ته خدایه در دوزخی عشقی گفتری خان خوه دایه
۶	وگ پروانه مه لونه بیک و زریا فریاد و فغانه زوی نار سقری	او گری عشقانه کو بیک سر حش یا وی جانو جگر صهتی لیل دل پش یا
۷	لورا کو فراقاته ز بو من سگراته خه رنگی د خوزن ژمه سرا قدری	جان د دلد فرح و روحویا ته دگرتی زلفاتیه بے خبر و تباته
۸	اوشعله او خور خوه ددن قلی نسا حق بقیامه تو ز بو من کسری	زندیه ته ز بو مو فدی دبر و کبیا هر صوند د خونم بیری مریوعیا
۹	ارزین ز عقیقه نینه د شعله او خوره من رور د قالد تووی نور لصری	زلفاته شفا طاریه گردن ژیلور صوبانامه بتور تو باغیلوز جور
۱۰	لوجا جی لور بته دین چر خوریدا بے شهبه لباته نه یکن مالو لیری	سرقبله گها صوفیوشینی نو مریدا وان مال خوه دایه لریا ته مه سوری
۱۱	روگش دکه مهر نهی یله ظا بروی ته گوری ته بقی بوکه او شیخ جزری	رو ز لظاک و شرفه زوی دیمو روی ته کوثر کولدی لوه ژ شرا با پدوی ته

Dil kevtiye dava ku li alem te vedaî  
Dêrakiya davê tu wî lew bûye fedaî  
Der dûzexê îşqê gevizî canê xwe daî  
Fermanê binivîse li wî jê ke serî

Ew agirê îşqa te ku yekser hejiya  
Wek perwane me, lew li me pêtek rijiya  
Wê can û ceger suhtî li min dil pijiya  
Feryad û fixan e ji wî narê seqerî

Huba te di dil da ferh û ruh û heyat e  
Lewra ku firaqa te ji bo min sekerat e  
Dil girtiyê zulfa te ye, bê sebr û tebar e  
Vî rengî dixwazit ji me sira qederî

Zendê te ji mûm û fenerê dîroknîsa  
Ew şûle û nûra xwe didin qelbê me dîsa  
Her sond dixwûnim bi serê Meryem û Îsa  
Heta bi qîyamet tu ji bo min keser î

Zilfa te şeva tarî ye, gerden ji bilûr e  
Erzen ji 'eqîq e, sine da şûle û kûr e  
Sonda me bi Tewrat û bi Incîl û Zebûr e  
Min ruh di qalib tu yî nûra beser î

Ser, qiblegeha sofî yû şeyxan û mirîda  
Lew hacî li dora te didin çerx û cirîda  
Wan malê xwe daye li riya te, me serî da  
Bê şubhe li ba te, ne yek in mal û serî!

Roja li felek şerm e ji wî dêm û ruwê te  
Rûreş dike mihra mehê yek ta biruwê te  
Kewser ku lezîz e ji şeraba piduwê te  
Gorî te bibin pûke û Şêxê Cezerî.

# Hêviyeke ji mirinê vegeryayî

RUKIYE ÖZMEN



Ewrên spî giran bûn, mija gewr navbera erd û esman zevt kiribû. Mişêna bayê ku dişêlîya bêhna kizur û seqemê jê dihat. Xwezayê kirasê gewrê cemidî bi ser singa xwe de berdabû. Geliştî mişt bûbûn ji kuriyên berfê, hîna berfa spî bê navber dibarîya. Li gund ne bijîşk ne jî dermanxane hebû, rê hatibûne girtin. Ew sê roj bûn li ber halê xwe dida, di nava sanciyana de digevizî, jana xwe di nava wê de hildikir, her indamakê laşê wê êşek cuda dida û qurpênî bi movikên piştê diket, mîna ku bişkin. Lêvên wê yên sorê ji pelên xexecokê qeliştî û pûç bûbûn ji mêhtin û cûtinê, tipkê xwînê ji wan dihatin. Rûdemê wê yên hinarî ketibû rengê zehferanê. Mijangên wê yên dirêj î qeytanî ji şilbûna rondikana xwûsî girtibûn, çavên wê yên fereh li berfê nedihilatin dineqehan û miç dibûn. Pêlên bayê ji berfa li erdê her carekê nofek radikir û li nava serê wê didêra. Ling û destên wê tevîzibûn, hew tevger dikirin. Giyanê di nava laşê wê de hêza xwe winda kiribû, êdî bi xwe ne dihisa. Dema terektor bilind û nimz dibû axîn ji kuriya nava wê dikişan, pîrika por sîsa pişt xwûzbûwî bi wê taqeta xwe ya lewaz hêz didayê û radigirt. Şofêr

bi lez diajot da bigihêjêne bajêr, lê pira li ser avê bi dinamêtan hatîbû ruxandin. Hewl dida ji bo derbasî aliyê din yê avê bibe, dema pêl gazê dikir birênek bilind di-da ku gelî dişarand, duyê reş bi hewa diket û ronahî di nava xwe de difetisand û ji ciyê xwe ne dilivî. Di valehiyê de tekel dizivîrîn, çiqas kevir tavêtin bin tekelan jî, lê qet feyde ne dikir. Heya gihiştû wir rêya ku du seat bû, danakê rojê li wan derbas bûbû. Serê xwe danî ser dîreksonê, fikirî ji bo ku çarekî bibîne. Her carekê dengê nalîna wê dikir, mîna bi kêra ko ser dilê wî were qelaştin. Mecal nedidî ji bo derbasbûna avê û di nava bêhêvîtiyê de dima. Pîrê dest da çengan, ku nezmê wê qels dijenîn, bi dengêkî xemgîn got:

"Ka em nagihên vî kavilê han da em û girekî bikin, an na wê biqefile".

Bi kujikê betaniyê girtin û birin kavil.

Hin aliyê kavil hê reşgirtî bû ji şewatê û hin jê herifî bû. Ew axa adan bûbû rijî, ra di tê de tir nedibû ku bizrik xwe biafrînin û biteqin. Kêzik û kurmik qelîyabûn, dengê kund û qijakan jî ne dihat. Bêçaretiyê serê xwe ser wan re nuxun kiribû, pêj-na mirinê dixiste guhê wan, jiyana sar û bê wate bûbû. Pîrê bi ser lêvên xwe yên qermiçî minminand: mirov bi qîmeta xwe nizane.

Dilê xwe xistine nîrê zilmê û li ser singa xwe diajon. Bi dijberiya rûmeta xwe tenê namînin û her waha dijminiya lawir û giyê jî dikin. Dehl û rezên vira bûbûn ilhamê evîndaran û tev wêran kirine. Ev hov in, dixwazin jiyane li vî warê pîroz kor bikin; şofêr bi dengêkî xemgîn û bi mehdekê tirşşor serê xwe da ber xwe û got: "Ne tayek qirşik, ne jî şivikek heye ku mirov agir bike. Ez ê biçim ka hinek mazot naînim".

Çû xirtûm ji sindoqê derêxist û serîkek xist depoyê. Serê din xist devê xwe û bi wê nefesa xwe ya westiyayî heya jê hat mazot kişand.

Bi kişandinê re zimanê wî şil bû, bi lez serê xirtûmê ji devê xwe derêxist û danî ser devê metre heya nêvî bû. Bi destên xwe yên tevîzî, rahişt metre û mazot li ser hin kincên ku ji bo paqijiyê bi kar dianîn de reşand. Bi dehan cara çeqmeq çeqand heya ku pêket. Piştî agir berdayê, rimya agir xwe li nav barîna berfê ber bi ewran ve bilind kir û esman belek kir.

Pîrê di ber re bi berfê ling û destê wê yê rihjêçûyî mis da, ji bo ku xwîn li nava laşê wê baş bigere.

Têhna germê dayê û berada wê şikest. Ji nişkê ve qîr û hewar pêket. Bîrh dihatinê, çeqên ji parsuyên wê dihatin û dinanê wê disiqahan. Tiliyên destên xwe digu-vaşt, dixist devê xwe û gez dikir.

Perda reş di çavên wê de dihejt. Dengê xof û hîsê mirinê dihatinê. Pîra ku bi sa-



lan re bezî bû, bi herdu zendên xwe yên hestîqewîn digirt, zikê wê mist dida û digor: "Nefesa xwe hêdî bide û bistîne".

Tuzavek e xwîdanê anîya wê girtibû, ji kefte leftê bêhêz ket. Di nav gavên mirinê de canek ji canekî dihate xilaskirin û hişê wê diçû. Ji nişkêve dengê qîr û wîqênê tevlihev dibû. Û hêdî hêdî bêhna tirsê revîya û pêjna mirinê winda bû. Pîrê bi lez ji şiliya avesorkî zuha kir û roviya navikê bi kêrê birî û xist nava pêçeka şiadeya ku mîna şîr spî û bi gulên rengîn neqîş kirîde û zarok da ber singê.

Bi kerba şewata kezaba ku du zarokên mirî di dil de bû, destên xwe pelandiyê da maç bike, lê ji taqet ketibû û zendê wê alî nedikirin, sist bûbûn. Nava wê kelî û pêl da, ew hilma pêlan fûriya ber bi jor ve, rondikên şabûnê berdan çavê wê, nefesek ji bêhna wî kişand.

Wê bêhnê êş û jana rojan pê da windakirin, xem û kulên mehan pê dan jibîrkirin. Hêvî û hezkirina xeyalê salan li nava wê dema reş de pê da hîskirin. Çira wê pêket, ronahiya wî giyan da wir û hêvî ji mirinê vegerand. Pîrê serê singa wê xist devê zarokê û şîr guvaştîyê, ji bo firşik bibe.

Lêvên xwe yên nerm û sor li dora devê xwe malişt û tama ewil ditamand. Hêdî hêdî dinyayê veda, perda ewran qetîya û ewr belav bûn. Roj hê qamekê xwe nişan dida û amedekariya hilkişandina xwe ya pişt çîyan dikir.

Bi tîrêjên xwe cara dawî ji wê rojê ew himbêz dikirin. Mîna keskesor rijiyabê, lêlan û xalê rengîn diçirîsîn li ser rûyê berfê. Li teketorê siwar bûn û bi diltijî berê xwe dane malê. □

# Hîwa Qadir xaça xwe digerîne



XELIL DUHOKÎ

Hîwa Qadir, yek ji nivîskarên xort û navdar e, ku di van salên dawiyê de, hatiye qada edebiyata kurdî ya modern. Ew bi zimanê xwe yê resen, bi hevokên xwe yên ji wênên şîrî dagirtî û muzîka rewan, helbestên xwe dixemlîne.

Ew di nav agir, karesat û bobelatên Kurdistanê de mezin bûye. Ji xwe ev e serê çil sala ye ku li başûrê Kurdistanê, şerekî qirkirin û vebirandinê li dij gelê kurd tête kirin. Lewre wî mîna her kurdekî dilsoz û xemxwarê doza xwe, behra xwe ji wan derdeserî û sitema wergirtiye. Ji lewre ew neçare, ku rola xwe di şerê rizgariyê de bibîne. Êdî ew bi erkê xwe yê pîroz dizane, ku peyv û helbestan bike gule û fişek û bi navçavên dijminan ve biteqîne.

Ew bi zaraveyê kurmanciya jêrî (sorani) dinivîse. Em dê çend helbestên wî, bikin kurmanciya jorî û hinek aliyên wan jî, şirove bikin. Hêviya me ew e ku bi dilên xwendevanên hêja bin.

Belê; Hîwa Qadirî jî, mîna Mesîhî, xaça xwe daniye ser milan û digerîne. Ew dizane ku birînên gelê wî, ji yên Mesîhî jî, bêtir in. Xemên gelê wî, ji çiya girantir in. Ay Xwedêyo, dijminan bi milyonan bizmar û mîx di laşê gelê me de kutane. Ji

lewre jî, welat şewitî û wêran e. Lê me bawerî heye, ku wê bizmar bişkên û birîn jî sax bibin.

Heval dibêjin:  
Hind bizmar di laşê te kutan e.  
Ku pê ve bihilawîstn,  
Têra cilên me heman e.<sup>(1)</sup>

Êş û azarên wî pir in. Birîn kûr in. Lê ew dixwaze, ku neşêne jibîr kirin. Divê li ser keviran yan di rûpelên dîrokê de, bêne nivîstn. Ew li cihekê asê û mukim digere, ku birîn û azarên xwe li ser binivîse, ku nêne windakirin. Digere. Digere û ji hestîkên xwe baştir nabîne.

Her çi bîranînên min hene,  
Dê li ser hestîkên xwe vekolim.  
Da ku bi mirina min re, bimirin.  
Neku li ser bejna darekê,  
ku berî mirina min,  
ew bêne sotin û bimirin.<sup>(2)</sup>

Hîwa bi doza gelê xwe ve girêdayîye. Wî welatê xwe, di nav xwîna xwe de veşartîye. Lê dike û nake, nikare wî ji dest û pencên dijmin û xwînrejan rizgar bike. Ew dixwaze li ser rewşa welatê xwe yê dagîrkirî bipeyive û ji bo xelkê cîhana bêdeng bi-de xuyakirin, ku welat şewitiye û di hewara me werin.

Pêkê min zer,  
wek çavên te.  
Wek çavên destgirtîya min.  
Bînahîya çavên min re,  
Wek porê te.  
Wek rengê welatê şewitî yê min.<sup>(3)</sup>

Ew ne her di derdê welatê xwe de şewitî ye. Ew di derya çavên şoxekê de jî xeniqî ye. Ew evîndarekî eyda û dilperitiye. Evîna wî giran e û ew xwe di nav sîbera wê de dibîne. Wê di nav sîbera xwe de dibîne. Ew herdu yek in û ji hev cuda nabin. Evîn

germ e û agirê wê, ne sar dibe û ne jî vedimire.

Ku bi tenê me û tu digel min î.  
Bi tenê min yek sîber heye.  
Ku bi tenê yî û ez digel te me.  
Bi tenê te yek sîber heye.  
Ku em herdu bi hev re ne,  
Bi tenê, me yek sîber heye. (4)

Ew bêyî kontirola neheza, hevdu dibînin. Xwe winda dikin û bi tenê, di nav baxçê evînê de digerin. Ay ji wê evînê! Dema ew destên wê digire, tiliyên xwe ji bîra dike. Lê tilî jî, di nav porê wê de, heneka dikin û dilîzin.

Dema min destên xwe xistin nav yên wê,  
tilî bi cê man.  
Şevêkê,  
min diviya ji te re helbestekê,  
bivehînim,  
tilî nebûn pê binivîsim.  
Dema roja paştir, me hevdu dîtî, te got:  
Ew helbesta te ya duhî di nav destên min de mayî,  
Bi şev heta siharê di nav porê min de,  
Li bêhna te digeriya. (5)

Xuya ye ew ji bo evînê û hevdu dijîn. Keçik ji bo her tiştî amade ye. Dikare heta dawîya dinê digel evîndarê xwe here. Xwe gorî wî bike û qurbaniya bide. Ew jî amade ye. Belê; herdu bi soz û peyman in.

Min ji bo te, basî wexerê kir,  
te got: Dê êm.  
Min ji bo te, basî mirinê kir,  
te got: Dê bime qurbana te.  
Min got: Pênûsê min tune ye,  
da ku ji bo te helbestekê binivîsim.



"Hiwa Qadir, yek ji nivîskarên xort û navdar e, ku di van salên dawiyê de, hatiye qada edebiyata kurdî ya modern. Ew bi zimanê xwe yê resen, bi hevokên xwe yê ji wênen şîrî dagirtî û muzîka rewan, helbestên xwe dixemline."

Te got: Ha va ye pêûsê sorava min,  
demek e lêvên xwe sor nakim.  
Min got. Pa kanê kaxez?  
Te centikê xwe vekir, te got: Tuneye.  
Ez li berikên xwe geriyam, min got: Tuneye!  
Te çî negot  
Bi bêdengî, te devê xwe ber bi min ve anî.  
Min jî li ser lêvên te,  
du parçe helbest, ji bo te nivîsîn. <sup>(6)</sup>

Bi rastî jî, Hîwa Qadir helbestvanekî hestnazik û jîr e. Helbestên wî zû diçine di nav dilê mirovî de. Pir bi mana ne û xemên mirovê bindest himbêz dikin. Bêas-teng û girê xwe digehînin xwendevanî. Wî dibine cîhana du evînen mezin, welatî û dilberê. Ew di herdu evînen xwe de, bi soz e û amade ye ku tevaya dîwaran biheri-fîne û kospan bişkêne, da ku xwe bigehîne armanç û hêviyan.

Hîwa Qadir, di sala 1964an de, li bajarê Silêmaniyê, li başûrê Kurdistanê ji dayik bûye.

Ew di sala 1992an de hatiye Swêdê.

Berhemên wî yên çapkirî, ev in:

1. Dîwana Çawezerdekan, 1992an li Silêmaniyê.
2. Belavoka helbestan Kilawekem pir e le baran û gul, 1996 an li Stokholmê.
3. Kîwerêk le xewn, 1998 an li Swêdê.
4. Romana Awêne Serabiyekan, 1996 an li Stokholmê.
5. Dîwana Henar. Hin helbestên wî û yên Hendirênî, bi zimanê Swêdî. 1998 an li Stokholmê.
6. Dû Kiluwe befir, çîrok ji bo zarokan. 2001 li Stokholmê.

#### Çavkanî:

1. Dîwana kîwerêk ji xewna. Swêd 1998, rûp 20.
2. Her ew çavkanî, rûp 28.
3. Her ew çavkanî, rûp 30.
4. Her ew çavkanî, rûp 25.
5. Her ew çavkanî, rûp 22.
6. Her ew çavkanî, rûp 21.

# Rewşa Hewayê



SELAHATTİN BULUT

Apê Reşo ji sermê re pir qels bû. Roja ku havînê Axatir ji payîzê dixwest pê re ricif diket navê. Bişkoka berstûka kurtikê xwe digirt û digot "Zivistan hat!" Wek kîsoyê pêjn bi serkeve çawa hustuyê xwe dikişne nava qalikê xwe, wî jî hustuyê xwe dikişand nava milên xwe, beskurka çaketê xwe heta bi ser cênîkên xwe radikir û guhên xwe di nav de vedişart. Li gor rewşa hewayê rûyê wî tahl û şîn dibû. Du peşkbaran ji aezmên bihata xwarê, dikete tayê. Dibû hûbe hûba wî, diricîfî, dev û diranên wî li hevdu diket.

Ji Apê Reşo re zivistan wekî dafikekê bû. Nedixwest bê tevdir bête qefaltin. Di serîsnagê de; dema havîn diqediya, germayî û ronahî kêmbû, ewran dawên xwe dawdişandin û dibû şilî, wî jî dest bi kar û barê zivistanê dikir. Axa ser xênî nuh dikir, ka bi ser wer dikir, av lê direşand, darloq li gundor dixist û xanî digerand. Qûmaxên xênî hust bi hust di berhev de, bi kefa destê xwe ditepand û bi şûnik dikuta. Qir û qalên ku devê meztîbê xerimandibû derdixist, diavêt û paqij dikir. Şibaka ku li bakur dinêrî bi keviran lêdikir û bi heriyê diseyand. Qelên navbêna textên derfî jî, bi hevîrê ardê cehînî diseyand û merek mûyinî jî jor de bi ser ve dadikir. Bi rewtek serpaçkirî hundurê pixêriyê paqij dikir, tahtikê ku havînî danîbû ser, dida alî. Fitî-

lek herî li dora tifikê digerland û gwîstan ji nav qir û qafan derdixist, dianî li ber kucik datanî. Dû re diçû, ji aliyê derve de dîwarê xênî bi heriyê ikber dikir.

Gava Apê Reşo bi şev, ji bo ku destmêja xwe bişkîne, derdiket paş xênî û vedigeriya, digot: "Îsal wê zivistan pir no derbas be!" Li dora xênî diçû û dihat. Her ku fitlek dida xwe kêmaniyek didît. Wekî ku dilê wî li karên ku kiribû rûneniştibe qûna wî erd ne digirt. Radibû, ji nû ve ji kendalên nêzî gund çend cem ax dikişand, li ser xênî rûdikir, ka û xwê tevlê dikir, çend satil av bera ser dida, bi lîngan diket nav, pêlêdikirê, distira, dianî tîrbûna ku dixwest, li ser banî belav dikir û diseyand.

Ava baranê ya li ser banî, li ser pişt mezrîbê ye. Mezrîb biçûk û kin be, ne li texma bergiya avê be û ba bi cîh nebûbe, av ê bi dîwêr de bê, wê li aliyê hundur bide der, wê dîwar nedawî bibe û dibe ku hilşe. Ji ber vê yekê Apê Reşo mezrîba xaniyê xwe dirêj çêdikir. Wexta ku ava barana bi elpîn rastî ser mezrîbê dibû, av bi du - sê metreyan ji dîwêr dûr dirijiya.

Ne Radyo û ne telewîzyon hebû. Tu haletên ku pîvana rewa hewayê bikira jî tunebû. Lê texmînen Apê Reşo rast derdiketin. Belê wî li ser pêderxistina rewşa hewayê ji kesekî re tiştek nedigot.

Rojekê qeflak çiyagerên îngilîz tên gund. Li got peyva wergerê wan, ji bo rapelîkandin û derketina ser zinara pişt gund hatine. Bi wan re saet, cihnî, dûrbîn, radyoyên biçûk û haletên ku rewşa hewayê dipîvin hene. Xuyaye ku bi karekî girîng hatine. Li saet û cihnişên xwe dinêrin, guhdarî ser radyoyê dibin, bi dûrbîne li çarhawîdorê xwe difekin, haletan vedikin, li dar dixin, li ezmên dinerin û li ser kaxeza tiştinên wek mîşîka dinîvîsin û dineqîşîn.

Çiyagerên îngilîz wê şevê li mala Apê Reşo dibin mêvan. Piştî ku li haletan dinêrin û qinyeta wan pê tê ku wê sibê rewşa hewayê xweş û sayî be, biryara çûyina bi serê sibê re didin û dinivin.

Apê Reşo dinêre ku mêvanên wî raketin, radihêle misîn û ji bo avekê birjîne derdikeve derve. Ji bo ku ciyekî xewle bibîne, hebekî ji malê fireh dikeve. Xwe davî paş talda devîkê û li ser tutikan rûdine. Lê hema bi lez radibe, şelwer dikîşîne ser zikê xwe û berî dide malê. Bi nuqurçkan mêvanên xwe şiyar dike û difitile ser werger: "Sibê wê pûkek mezin çê bibe, ger hûn bi ya min dikin neçin, hûnê di rê de biqefilin."

Îngilîz guh nadin vê pêşniyarê. Bawer nakin ku gundiyek ji haletên wan rasttir bi rewşa hewayê zanibe. Li hev dinerin, dimizicin, bê xem serê xwe datînin û radizên. Serê sibê, bi banga dengê dîkan re bi xwe dihesin. Radibin, xwe tev dişidînin, ji malê derdikevin û diçin.



Apê Reşo destê wî di dilê wî de ye. Neketiye heyra mirina wan, dibêje vana îngilîz in, canê wan bi qîmet in, li derdorên me biqefilin wê di hustê me keve. Dewletê dîsa bibêje kurd eşqiya ne, derketinin ser riya, kê dibînin tazî dikin û dikujin. Dewêlên ba hevkin, wê li ser serê me gire girên tanq û top û balafirên be. Wê li ser me bi ferman be.

Apê Reşo hê wilo difikirî, hew dibîne ku gavanê gund bi lez dikeve hundur. Ji rewşa wî xuyaye ku bizdiyaye. Wer ku bazdaye, hilma wî çikyaye. Ji ber helke helka ku jê tê, nikare bipeyive. Hew dibêje: "În...În...Îngî...Îngîlîz..." û tiştekî din nabêje.

Pûk e, ba û bahoz e. Apê Reşo û deh panzdeh zilamên tevşidandî berê xwe dane bê û bi dû îngilîzan ketine. Bi çongekê berf li erdê ye. Dadibin, derdikevin, dikevin, radibin û her dimeşin. Bi bê re berfehûra ku dibûrize jipêre wek şivterkan li wecên wan dikeve. Simbêl li ber pozên wan bûne mîna lûlikên cemedê. Gavên wan hêdî hêdî giran dibin, gîzokên wan li hevdû dikevin û bi halekî xerab lingên xwe hiltînin û datînin. Piştî meşa qedere saetekê li binê zinara piştî gund rastî reşên wan tên.

Dibînin ku diranên wan li hev dikevin, lêvên wan diricifin, xwe li hevdû gerandinin, bi hevdû girtinin û hişk bûnin. Wextê gundiyan dibînin hinarikên rûyên wan diperpirtin, bijankên wan direqisin û çavên wan diçûrisin. Gundî bi kêfa ku mêvanên xwe sax dîtine bêronî xwe davêjin ser wan. Dest û lingên wan, piştên wan difirkînin, lingên wan vedikin, radikîşnin û di çongan de difîşnin, hû dikin serê tiliyên wan, hulme gulma xwe bera ser dev û rûyê wan didin û germahiya canê xwe li ser dil û canên wan dihelînin. Du sê gundî ji bo êgir dadin, sê-çarek jî ji bo darên darbestan li nav çiyê belav dibin. Li nêzî îngilîzan agirekî mezin dadidin. Guliyên ku ji daran birîne, bi qedere gavekê fircyî hev, dudu dudu didin ber hev, kindir dikin û çilo davêjin ser. Di zemanekî kin de, bi sivikayî çend heb darbestên ba çêdikin, îngilîzan li ser dirêj dikin, haletên wan ên ku digotin rewşa hewayê xuya dikin, ji nav berfê didin hev, li kêlekên wan datînin, dikevin bin darbestan û berê xwe didin gund û dimeşin.

Hera xwe digihînin gund ji hal û asas de dikevin. Pîrekên gund giş li mala Apê Reşo kom bûne, bi lez û bez kar dikin. Agirê kuçikê xwe dikin, nivînan datînin, çiyagêrên qefilî radizînin, her yekî du lihêfan davîn ser wan û dinixumînin, dims û rûn germ dikin, devê wan vedikin û bera qirika wan didin, xwê diqelînin, ji kirasên kevn kîsikan çê dikin û tije xwêya qelandî dikin, devê kîsikan girêdidin û dixin nav nivînan, ber paxilên îngilîzan û wan dixin xwêdanê.

Piştî sê roj û sê şevan bi ser heşê xwe ve tîn. Nenûk û canê wan tev re bûne. Wextê çavên xwe vedikin û dinêrin Apê Reşo li ber serê wan e, barînt bi wan dikeve, xwe çengdikin hembêzê, dibe îske îska wan û digirîn. Apê Reşo ji kelogirt dikeve, destên xwe li serê wan datîne û dibêje: "Xwedê li hêstîriya me nêrî û hûn sitirandin. Qurbanek li me dikeve. Tiştekek bi we hatibûya, ewê ji me re ne xêr bûya..."

Deh roj şûnde, gundî giş ji malên xwe derketine, ji bo ku îngilîzan bi rê bikin li ber mala Apê Reşo kom bûne. Zilamên gund heya perê gund bi mêvanên xwe re dimeşin. Di rê de, nivêkî, çiyagerên îngilîz disekinin û bi wergerên xwe re tiştinan diaxivin. Werger li Apê Reşo dinêre û dibêje: "Meraq dikin; dibêjin vî çawa zanîbû wê sibê pûk be?"

"Min heta niha ji kesî re negotiye, lê êdî ez kal bûme û vê sirra xwe bibêm ewê baş be. Bi şev, ji bo ku destmêja xwe bişkînim wextê derdikevim derve, ger mûyên gunê min bibin wek şûjînan û di paqên min re herin, ez wê çaxê zanim ku wê sibê û wê di rojên pêş de pûk û seqem be."

Çiyagerên îngilîz ecêbmayî dimînin. Haletên xwe li taht û keviran dixin, dişkînin û di ber re wilo dibêjin: "Haletên ku bi qasî gunê kurdekî kêrî me neyê, emê çi bikin jê?" □



**H**ejmara nivîskarên kurd hîna gelekî kêmtir e. Îcar di nava nivîskarên kurd de ji hejmara jinên nivîskar hîn kêmtir e. Mirov dikare jinên nivîskar bi tiliyên destan bihejmêre. Dema rewş ev be, divê jinên bi kurdî dinivîsin bence pesindan. Di nivîskariya edebiyata kurdî de hebûna jinan wê hestên mirovî û humanistî zêdetir bibe.

Hîvî Berwarî jî yek ji van kêmtir jinan e ku dixwaze bi karê berdeçkirina edebiyata kurdî rabe. Ji ber egerên cûda jinên kurd xwedî şopên kûr yê hestên in. Dema ew rahijîn pêntûsê û bixwazîn wê kaniyê der bikin, ew

ê pir bi serketî bin. Hindik bin jî, beretayên bi wî rengî îro li bexçeyê edebiyata kurdî ketine.

Ev yekemîn pirtûka Hîvî Berwarî ye ku bi navê "Vegera Hêviyek Windabûyî" ji aliyê weşanxaneyê Rewşenê ve hatiye çap kirin. Pirtûkê jî bîst û şeş helbestan pêk tê û helbest li ser evîn û hezkirina welêt, li ser bêrîkirin û dûtiriyê ne.

**Hîvî Berwarî**  
Vegera hêviyek windabûyî  
*Weşanên Rewşen*

**G**ava navê Xelîl Cibran tê bihistin, fîlozofî, alimî û pêxemberî tê bîra mirov. Ji ber ku ew bi xwe li ser van mijaran rawestiyaye û loma wî bi zîrekîtiya xwe navê xwe gerdûnî kirîye. Lê ew di cynî demê de şair û nivîskar e jî. Wî şûr, çîrok û roman jî nivîsandine. Ew rohilatîyekî bi kincên roavayîyan bû. Ew pira di navbera şerqê û xerbê de

Xelîl Cibran  
**Baskên Şkestî**

Roman  
Wergêr: Husein Muhammed



Husein  
Muhammed

bû. Husein Muhammed bi zîrekîtiya xwe ya herdu zimanan (kurdî-îngilîzî) ev berhema Cibran "The Broken Wings" wergerandiye kurdî. Wî ne bi tenê wergerandiye, wî jî nû ve bi kurdî nivîsandîye. Hêjayî pesnê û xwendinê ye.

**Xelîl Cibran**  
Baskên Şkestî  
Wergêr:  
**Husein Muhammed**  
*Weşanên Helwest*

Agahdarî

ÎSAL

# Xelata APECê

(december-2001)

JI BO WERGERAN E

Wek ku me sala çûyî jî got û kir, em ê îsal jî du berheman xelat bikin.

• *Şertê beşdariya berheman:*

Divê berhem ji du salan ne kevntir be. Ji bo ku juriya xelata APEC'ê bi silameti karê xwe bi rê ve bibe, berhemên pêşniyarkirî divê heta 1`ê meha 9an, bigêhîjine destê juriyê.

• *Namzediya berheman:*

Ji bilî juriya APECê, kî bivê dikane namzediya berheman pêşniyar bike. Lê ji bo silametiya karê juriyê, baştir e ku xwedyê pêşniyarê bi xwe jî agahdariyeke pêşîn ji bo juriyê bi rê bike. Nemaze ji bo namzediya berhemên nava welêt pêwîstiya juriya xelata APECê ji alîkariyeke welê heye.

• Xelata APECê 2000\$ in û li du berheman dabeş dibe.

• Xelata APECê hersal di meha 12an de, li Stockholmê, di *pêşangeha kitêbên kurdî* de beyan dibe.

Ku mecalên xwedyê berheman tunebin ku beşdarî girtina xelatê bibin, piştî beyanê, xelat ji xelatgirên xwedyê berheman re tê şandinê.




Apec-Förlag AB

Box: 3318


SE-163 03 Spånga/ Sweden

# JI WEŞANÊN NÛDEMÊ DU KITÊBÊN NÛ!



NÛDEM guh dide zarokên kurdan, hûn jî li xwe û zarokên xwe xwedî derkevin, weşanên NÛDEMê bixwînin!



**Astrid Lindgren**  
**RONYA**  
Ji swêdi: **N. Zaxurani**



**Astrid Lindgren**  
**BIRAYÊN DILŞÊR**  
Ji swêdi: **N. Zaxurani**



WWW.GENIUM.COM